

T.C.
MUŞ ALPARSLAN ÜNİVERSİTESİ
SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

İbrahim GÖZETEN

MELE XELÎLÊ SÊRTÎ VE NEHCU'L-ENÂM ADLI ESERİ
(METİN VE İNCELEME)

YÜKSEK LİSANS TEZİ

MUŞ – 2015

T.C.
MUŞ ALPARSLAN ÜNİVERSİTESİ
SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

İbrahim GÖZETEN

MELE XELÎLÊ SÊRTÎ VE NEHCU'L-ENÂM ADLI ESERİ
(METİN VE İNCELEME)

YÜKSEK LİSANS TEZİ

TEZ YÖNETİCİSİ
Yrd. Doç. Dr Reşat AÇIKGÖZ

MUŞ – 2015

K. T.
ZANÎNGEHA MUŞ ALPARSLAN
ENSTÎTÛYA ZANISTÊN CIVAKÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Ê ÇANDA KURDÎ

İbrahim GÖZETEN

MELE XELÎLÊ SÊRTÎ Ê BERHEMA WÎ YA NEHCU'L-ENAM
(METN Ê LÊKOLÎN)

TEZA MASTIRÊ

RÊVEBIRÊ TEZÊ
Yrd. Doç. Dr Reşat AÇIKGÖZ

MÛŞ – 2015

SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜ'NE

Muş Alparslan Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “Mele Xelilê Sêrtî û Berhema Wî ya Nehcu’l-Enam (Metn û Lêkolîn)” adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi taahhüt eder, tezimin kâğıt ve elektronik kopyalarının Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım.

Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

☒ Tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.

☐ Tezim sadece Muş Alparslan Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.

☐ Teziminyıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/raporumun tamamı her yerden erişime açılabilir.


22/12/2015
İbrahim GÖZETEN

TEZ KABUL TUTANAĞI
SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜ'NE

Yrd. Doç. Dr. Reşat AÇIKGÖZ danışmanlığında, İbrahim GÖZETEN tarafından hazırlanan bu çalışma 22/12/2015 tarihinde aşağıdaki jüri tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı'nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

Başkan : Prof. Dr. Hasan ÇİFTÇİ

İmza :



Jüri Üyesi : Yrd. Doç. Dr. Reşat AÇIKGÖZ

İmza :



Jüri Üyesi : Yrd. Doç. Dr. Canser KARDAŞ

İmza :



NAVEROK

NAVEROK	I
KURTE.....	VIII
ÖZET.....	XI
ABSTRACT	XII
PÊŞGOTIN	XIV
KURTEBÊJE	XV
ELÎFBÊYA TRANSKRÎPSİYONÊ.....	XVI
HERFÊN ŞEMSÎ Û QEMERÎ.....	XVII
DESTPÊK	1

BEŞA YEKEM

JIYAN Û BERHEMÊN MELE XELÎL Û KESAYETÎYA WÎ YA EDEBÎ

1. 1. JIYANA MELE XELÎL.....	15
1.1.1. Navê Wî.....	15
1.1.2. Nisbet û Mexlasa Wî.....	15
1.1.3. Salbûn û Cihê Jidayîkbûna Wî.....	16
1.1.4. Malbata Wî.....	17
1.1.5. Eşîreta Wî.....	19
1.1.6. Cih û Tarîxa Wefata Wî.....	19
1. 2. BERHEMÊN MELE XELÎL.....	20
1. 2. 1. Berhemên Wî yên Kurdî.....	20
1. 2. 1. 1. Nehcu'l-Enâm.....	20
1. 2. 1. 2. Rîsâle fî îlmît-Tecvîd.....	20
1. 2. 2. Berhemên Wî yên Erebî.....	21
1. 2. 2. 1. Besîretu'l-qulûb fî kelâmi 'allâmî'l-guyûb.....	21

1. 2. 2. 2. el-Kâfiyetu'l-kubrâ fi'n-nahv.....	21
1. 2. 2. 3. el-Qamûsu's-sânî fi's-sarfî we n-nahwî' we'l-me'ânî.....	22
1. 2. 2. 4. el-Manzumetu'z-zumrudiyye nazmu Telhîsi'l-Miftâh.....	22
1. 2. 2. 5. Rîsâle fi'l-mecâz ve'l-istî'âre.....	22
1. 2. 2. 6. Besîretu'l-qulûb fi kelâmî 'allâmî'l-guyûb.....	22
1. 2. 2. 7. Kitabun fi usulî'l-hedîs.....	23
1. 2. 2. 8. Zubdetu mâ fi Fetâva'l-hedîs.....	23
1. 2. 2. 9. Tabaqatu'r-rîcâl.....	23
1. 2. 2. 10. Mînhâcu'l-wusûl ilâ ilmî'l-usûl.....	23
1. 2. 2. 11. Rîsâle saxîre fi'l-ma'fuvvât.....	24
1. 2. 2. 12. Te'sîsu qewâidî'l-eqâid 'âlâ mâ senehe mîn ehlî'z-zâhir we'l-bâtin mîne'l-qevâid.....	24
1. 2. 2. 13. Nehcu'l-enâm fi'l-eqâid.....	25
1. 2. 2. 14. Muhtasaru şerhî's-sudûr fi şerhî'l-mewtî ve ehwâlî'l-qubûr.....	25
1. 2. 2. 15. Mulahhasu'l-qevâtî' we'z-zevâcîr fi mâ tekellemû 'ala's-sexâir we'l- kebâir.....	25
1. 2. 2. 16. Mînhâcu's-sunnetî's-seniyye fi âdâbi sulûkî's-sûfiyye.....	25
1. 2. 2. 17. Nebzetu mewâhibî'l-ledunniyye fi ş-şatahâtî we'l wahdetî'zzâtiyye.....	26
1. 2. 2. 18. Rîsâle fi menâkibî Şêx Ahmed.....	26
1. 2. 2. 19. Diyâu'l- qelbî'l-arûfî fi't-tecwîd we'r-resmî ve ferşî'l-xurûf.....	26
1. 2. 2. 20. Şerhu manzûmetî'ş-Şâtîbî fi't-tecwîd.....	26
1. 2. 2. 21. Şerhu Qasîdetî'l-hemziyye.....	26
1. 2. 2. 22. Kîtabu ezhârî'l-xusûn mîn maqûlât-î erbâbî'l-funûn we mâ lî'ttâlibîne fihî qerru'l-'uyûn.....	27

1. 3. 2. 23. Maḥsûlu'l-mewâhîbi'l-ehadiyye fî'l-hesâsî we'ş-şemâîlî'l-Ahmediyye.....	27
1. 2. 2. 24. Manzûme fî mewlîdî'n-nebi.....	27
1. 2. 2. 25. Rîsâle fî îlmî'l-mantik.....	27
1. 2. 2. 26. Rîsâle fî'l-wad'.....	28
1. 2. 2. 27. el-Habiyye fî îlmî âdâbî'l-behsî we'l-munâzara.....	28
1. 3. KESAYETÎYA WÎ YA EDEBÎ.....	31
1. 3. 1. Perwerdehiya Wî.....	31
1. 3. 2. Dersdayîna Wî.....	32
1.3. 3. Bandora Wî ya Îlmî.....	33
1. 3. 4. Seyda û Feqeyên Wî.....	34
1. 3. 5. Terîqet û Tesewûfa Wî.....	34
1. 3. 1. Edîbên Ku Li Ser Mele Xelîl Tesîr Kirine.....	36
1. 3. 1. 1. Melayê Cizîrî.....	36
1. 3. 1. 2. Feqiyê Teyran.....	37
1. 3. 1. 3. Ehmedê Xanî.....	40

BEŞA DUYEM

VEKOLÎNA NEHCU'L-ENÂMÊ JI ALİYÊ ŞIKLÎ VE Ê ZÎMANÊ MELE XELÎL

2. 1. VEKOLÎNA NEHCU'L-ENÂMÊ JI ALİYÊ ŞIKLÎ VE	42
2. 1. 1. Şikl û Cureyên Nezmê.....	42
2. 1. 1. 1. Mesnewî.....	42
2. 1. 1. 2. Di Edebiyata Kurdî De Mesnewî.....	42
2. 1. 2. Kêşa Nehcu'l-Enamê.....	43
2. 1. 3. Şemaya Qafiyeyên Nehcu'l-Enamê	43

2. 1. 4. Redîfên Nehcu'l-Enamê	43
2. 1. 5. Qafiyeyên Nehcu'l-Enamê	48
2. 1. 5. 1. Qafiyeya Tam.....	48
2. 1. 5. 2. Qafiyeya Dewlemend.....	49
2. 1. 5. 3. Qafiyeya Nîv.....	50
2. 1. 6. Hunerên Edebî.....	50
2. 1. 6. 1. Teşbîh.....	50
2. 1. 6. 2. Teşbîhî Belîx.....	51
2. 1. 6. 3. Teşxîs.....	51
2. 1. 6. 4. Îstîfare.....	52
2. 1. 6. 5. Tenasûb.....	52
2. 1. 6. 6. Telmîh.....	53
2. 1. 6. 7. Tekrîr.....	53
2. 1. 6. 8. Întaq.....	54
2. 1. 6. 9. Nîda.....	54
2. 1. 6. 10. Tezat.....	54
2. 1. 6. 11. Îstîfham.....	55
2. 1. 6. 12. Alîterasyon.....	55
2. 1. 6. 13. Asonans.....	55
2. 2. ZIMANÊ WÎ.....	56
2. 2. 1. Taybetiyên Devoka Botî û Hekkarî.....	58
2. 2. 2. Peyvên Kurdî Yên Resen.....	63
2. 2. 3. Biwêjên Ku Di Berhema Nehcu'l-Enamê De Hatine Bikaranîn.....	66
2. 2. 4. Unsûrên Erebî, Farisî û Tirkî.....	68
2. 2. 5. Unsûrên Erebî.....	68

2. 2. 6. Peyvên Erebî.....	68
2. 2. 7. Terkîbên Kurdî Bi Peyvên Erebî.....	73
2. 2. 8. Hevok û Terkîbên Kurdî Bi Peyvên Erebî.....	74
2. 2. 9. Hevok û Terkîbên Erebî.....	75
2. 2. 10. Telmîh û Îşaretên Ji Ayetan.....	75
2. 2. 11. Telmîh û Îşaretên Ji Hedîsan.....	76
2. 2. 12. Unsûrên Ku Di Farisî û Kurdî De Hevpar in.....	80
2. 2. 13. Unsûrên Farisî.....	81
2. 2. 14. Unsûrên Tirkî.....	82

BEŞA SÊYEM

VEKOLÎN Ê TEHLÎLA BERHEMA NEHCU'L-ENÂMÊ JÎ ALİYÊ NAVEROKÊ VE Ê METNA WÊ YA BI KRÎTÎK

3. 1. VEKOLÎN Ê TEHLÎLA BERHEMA NEHC-ULENAMÊ JÎ ALİYÊ NAVEROKÊ VE	84
3. 1. 1. Armanca Nivîsandina Nehcu'l-Enamê.....	84
3. 1. 2. Zimanê Nehcu'l-Enamê.....	86
3. 1. 3. Xebatên Li Ser Berhema Nehcu'l-Enamê Hatînin Kirin.....	87
3. 2. TEHLÎLA NAVEROKA BERHEMA NEHCU'L-ENAMÊ.....	88
3. 2. 1. Beşa Yekemîn.....	89
3. 2. 1. 1. Ferzên 'Eynî.....	89
3. 2. 1. 2. Behsa Sîfetên Selbî.....	89
3. 2. 1. 3. Behsa Heft Sîfatên Xuda yê Qedîm.....	90
3. 2. 1. 4. Behsa Ferîşteyan/Melaîketan.....	91
3. 2. 1. 5. Behsa Rîsaletê.....	92
3. 2. 1. 6. Behsa Şemâilê Muhemmed.....	93
3. 2. 1. 7. Behsa Mi'racê.....	93

3. 2. 1. 8. Dîtina Xudê.....	94
3. 2. 1. 9. Behsa Qenctiriyê/Efziliyetê.....	94
3. 2. 1. 10. Jimara Peyxemberan.....	95
3. 2. 1. 11. Tesîra Du'a.....	96
3. 2. 1. 12. Mebhesû Nesbil Îmam.....	96
3. 2. 1. 13. Behsa Îxtiyara Cuzî.....	97
3. 2. 1. 14. Behsa 'Elametên Qiyametê.....	97
3. 2. 1. 15. Behsa Suala Qebrê û Qiyametê.....	98
3. 2. 1. 16. Behsa Îmaman.....	99
3. 2. 2. Beşa Duyemîn.....	100
3. 2. 2. 1. Nexweşiyên Dil.....	100
3. 2. 2. 2. Dermanên Wan Nexweşiyên Dil.....	102
3. 2. 2. 3. Perweriya Di Rêya Xuda De.....	103
3. 3. 2. 4. Wezîfeya Her Heft 'Ezayan.....	104
3. 2. 2. 4. Adabê Xwarinê.....	105
3. 2. 2. 5. Pûşîna Cil û Kincan.....	107
3. 2. 2. 6. Adabên Nimêjê.....	107
3. 3. METNA NEHCU'L-ENAMÊ YA BI KRÎTÎK.....	110
ENCAM... ..	130
ÇAVKANÎ	132
PÊVEK 1	137
JÎNENÎGARÎ	
ÖZGEÇMİŞ	

KURTE
TEZA MASTIRÊ
MELE XELÎLÊ SÊRTÎ Û BERHEMA WÎ YA NEHCU'L-ENAM
(METN Û LÊKOLÎN)
Îbrahim GÖZETEN
Şêwirmend: Yrd. Doç. Dr. Reşat AÇIKGÖZ

2015, 167 rûpel

Edebiyata Kurdî ya klasîk bingeha ziman û edebiyata Kurdî ya nivîskî ye. Ziman û edebiyata Kurdî li ser koka klasîkên Kurdî zîl daye û hêşîn bûye. Ziman û edebiyata Kurdî bi xêra van klasîkên bêhempa gihîştîye asta îroyîn. Ev klasîkên Kurdî exleb bi tîpên Erebî hatine hûnandin. Jiber ku nîfşên nû nikarin bi herfên Erebî bixwînin, ji klasîkên Kurdî jî nikarin îstîfade bikin. Lewma îro tîpguhêziya klasîkên Kurdî pêdivîyek ferz e.

Nehcu'l-Enâma Mele Xelîlê Sêrtî jî berhemek me ya klasîk e ku ji roja te'lîfê hetanî nûha li Kurdistanê medrese bi medrese geriya ye, ji bo elimandina ehlê medreseyê rolekî girîng listîye û di temamê medreseyên Kurdistanê de wek kitêba rêzê hatiye pejirandin û bi derskî hatiye xwendin. Muelîfê vê berehemê Mele Xelîlê Sêrtî alimekî zana, şareza û welûd e. Di gelek warên ilmî de berhem nivîsî ye. *Nehcu'l-Enâma* wî ji bo kemilandina zimanê Kurdî çavkaniyek berbiçav e. Ev berhem hem ji hêla naverokê ve dewlemend e, hem jî ji hêla zimên ve gencîneyek bêhempa ye. Ji ber vê yekê me jî kesayeta Mele Xelîl û metn û lêkolîna berhema *Nehcu'l-Enâma* wî ji xwe re wek mijara tezê hîlbijart.

Ev xebata me ji sê beşan pêk tê. Beşa yekemîn ji kurtejiya Mele Xelîl û danasîna berhemên wî û ji kesayetiya wî ya edebî pêk tê. Beşa duyemîn jî li ser vekolîna *Nehcu'l-Enâmê* û zimanê Mele Xelîl e. Em di vê beşê de bi berfirehî ji aliyê şiklî ve li ser vekolîna *Nehcu'l-Enâmê* sekinin û me devoka Mele Xelîl ya di berhema *Nehcu'l-Enâmê* de bikaraniye, derxiste holê. Beşa sêyemîn jî ji vekolîn û tehlîla naveroka berhema *Nehcu'l-Enâmê* û ji metna wê ya bi kritikî pêk tê. Di vê beşê de jî me di serî de vekolînek berfireh li ser naveroka *Nehcu'l-Enâmê* kir. Di dawiyê de jî me

transkripsiyona Nehcu'l-Enâmê pêkanî. Me di vê xebata xwe de Nehcu'l-Enâma Mele Xelîl ya ku ji aliyê Huseyîn Şemrexî ve hatiye amadekirin û ji wêşanxaneyê Nûbiharê derketiye, me ji xwe re wek çavkanî hilbijart û transkripsiyona wê kir. Em hêvîdarin ku ev xebata me ji bo îstîfadeya nîfşên nû bibe çavkanîyek sudmend.

Peyvên Sereke: Edebiyata Kurdî ya Klasîk, Nehcu'l-Enâm, Mele Xelîl, Medreseyên Kurdistanê, Zimanê Kurdî, Edebîyata Kurdî ya Nivîskî

ÖZET
YÜKSEK LİSANS TEZİ
MELE XELÎLÊ SÊRTÎ VE NEHCU'L-ENÂM ADLI ESERİ
(METİN VE İNCELEME)

İbrahim GÖZETEN

Şêwirmend: Yrd. Doç. Dr. Reşat AÇIKGÖZ

2015, 167 rûpel

Klasik Kürt edebiyatı Kürt dili ve edebiyatının yazılı kaynağıdır. Kürt dili ve edebiyatı Kürt klasiklerinin kökleri üzerinde yeşermiş ve gelişim göstermiştir. Kürt dili ve edebiyatı bu eşsiz klasikleri sayesinde bugünkü seviyesine ulaşmış bulunmaktadır. Bu klasiklerin büyük bir çoğunluğu Arap harfleri ile yazılmıştır. Yeni nesil, Arap alfabesini okuyamadıklarından dolayı bu klasik eserlerden de istifade edememektedirler. Bu nedenle bu klasik eserlerin Latinize edilmeleri hayati bir önem arz etmektedir

Mele Xelîlê Sêrtî'nın *Nehcu'l-Enâm*'ı da böyle bir klasiktir ki telif edildiği günden bugüne Kürdistan medreselerinde kendine yer edinmiş, bu medreselerin tamamında ders kitabı olarak kabul edilmiş ve okutulmuştur. Medrese ehlinin öğreniminde büyük bir rol oynamıştır. Bu eserin müellifi Mele Xelîlê Sêrtî bilgin, alim ve üretken bir şahsiyettir. Birçok ilmi alanda eser yazmıştır. Onun *Nehcu'l-Enâm* adlı eseri Kürt dilinin ulaştığı seviye açısından göz kamaştırıcı bir kaynaktır. Bu eser hem içeriği hem de dil yönünden oldukça zengin bir hazinedir. Bu nedenle biz de Mele Xelîl ve *Nehcu'l-Enâm* adlı eserinin metin incelenmesini kendimize tez konusu olark seçtik.

Bu çalışmamız üç bölümden oluşmaktadır. Birinci Bölümde Mele Xelîl'in kısa hayat hikâyesi anlatılmakta, eserleri ve edebi kişiliği tanıtılmaktadır. İkinci Bölümde ise *Nehcu'l-Enâm* ve Mele Xelîl'in *Nehcu'l-Enâm* da kullandığı dilin ağız özellikleri üzerinde durulmaktadır. Bu bölümde *Nehcu'l-Enâm*'ı şekil açısından genişçe araştırdık ve Mele Xelîl'in *Nehcu'l-Enâm*'ında kullandığı dilin ağız özelliklerini ortaya çıkarıp inceledik. Üçüncü bölüm ise *Nehcu'l-Enâm*'ın içerik açısından araştırılmasından, tahlilinden ve asıl metnin transkripsiyonundan meydana gelmektedir. Bu bölümde başta

muhteva olmak üzere Nehcu'l-Enâm eseri üzerinde kapsamlı deęerlendirmelerde bulunduk. Bölümün sonunda da Nehcu'l-Enâm'ın transkripsiyonunu yaptık. Bu çalışmamızda Huseyin Şemrexî tarafından hazırlanan ve Nûbihar yayınlarında çıkan Mele Xelîl'in Nehcu'l-Enâm adlı eserini kendimize kaynak olarak seçtik ve bu eserin transkripsiyonunu yaptık. Bu çalışmamızın yeni nesillere faydalı bir kaynak olmasını ümit ediyoruz.

Anahtar Kelimeler: Klasik Kürt Edebiyatı, Nehcu'l-Enâm, Molla Halil, Kürdistan Medreseleri, Kürt Dili, Yazılı Kürt Edebiyatı

ABSTRACT
MASTER'S THESIS
İbrahim GÖZETEN
MOLLA HALİL WHO IS FROM SİİRT AND HIS WORK NAMED NEHCU'L-ENAM
(TEXT AND REVIEW)

Advisor: Assistant Professor Dr.Reşat AÇIKGÖZ

2015, Page: 167

Kurdish classical literature is written sources of the Kurdish language and literature. Kurdish language and Kurdish literature was flourishing and developed on the roots of Kurdish classics. Kurdish language and literature has reached its present level through these unique classic. The majority of the classics are written in Arabic letters. Unfortunately, as the new generation is unable to benefit of Arabic alphabet, they are also unable to read these classics and benefit from them. Therefore the classic works' translated into Latin letters is of vital importance.

Nehcu'l-Enâm witten by Mele Xelîl who is from Siirt is such a classic, since it was wrtien Nehcu'l-Enâm takes place in Kurdistan in madrasas, it has been adopted as a textbook in all of Kurdistan Madrasah and has taught as textbook. It has played a major role in the People's madrasa education. Mele Xelîl who is from Siirt, the author of this classic, is a prolific scholar and person. He wrote in almost every scientific field. His work named Nehcu'l-Enâm is a dazzling source in terms of the maturity of the Kurdish language. This work is a rich treasure in terms of both content and language. Therefore, we examined Mele Xelîl and the text of his book the *Nehcu'l-Enâm* and we choose them as our thesis topic.

In this study our thesis is composed of three parts. The first part composed of short life story of Mele Xelîl, his works and the introduction of his literary personality. The second part composed of investigation of *Nehcu'l-Enâm* and the dialect of the language used by Mele Xelîl in *Nehcu'l-Enâm*. In this section we investigated the *Nehcu'l-Enâm* widely in shape and we revealed the dialect of the language used

Nehcu'l-Enâm. The third part composed of *Nehcu'l-Enâm's* investigation in terms of content, its analysis and *Nehcu'l-Enâm's* actual text's transcriptions. In this section mainly in terms of content we did contextual analysis on *Nehcu'l-Enâm*. Then we did a wide research on *contextual analysis of Nehcu'l-Enâm*. At the end we did the transcription *Nehcu'l-Enâm*. For this study we chose the *Nehcu'l-Enâm* Mele Xelîl's book which was prepared by Huseyin Şemrexî and published in Nûbihar Publication as source and did its transcription. We believe this work is going to be a source for new generation.

Key Words: Kurdish Classical Literature, Nehcu'l-Enam, Molla Halil, Kurdistan Madrasas, Kurdish Language, Written Kurdish Literature.

PÊŞGOTIN

Mele Xelîlê Sêrtî, di nîvê duyem ê sedsala XVIIIan û nîvê yekem ê sedsala XIXan de jiyaye. Mele Xelîl di edebiyata Kurdî ya klasîk de cîhekî girîng û têkuz digre. Mele Xelîl xwediyê ilmekî kûr û tije ye. Ew, yek ji wan seydayên Kurd yê ku herî bi ber û berhem e. Lewra hema bêje di her warê ilmê de berhemên wî yên hêja hene. Hinek berhemên wî nesr/pexşan ne, hinek jî menzûm/helbestkî nin. Hem ew kesê yekemîn e ku evqas kitêbên menzûm nivîsandi ye, ji bilî qesîde û tecwîd û *Nehcu'l-Enâmê* yên bi Kurdî, gelek kitêbên wî yên menzûm ên bi 'Erebî jî henin. Berhema wî ya bi navê *Nehcu'l-Enâm* hem bi Kurdî ye û hem jî menzûm e. Mirov dikare bibêje ku Mele Xelîl ligel ilm û zanetîya xwe, şairekî gelek hêja ye jî. Berhema wî ya *Nehcu'l-Enâm* di warê ilmê de çavkaniyeke gelek dewlemend û hêja ye. Gava ku mirov li ser tema naveroka *Nehcu'l-Enâmê* radiweste, mirov bi rehetî dikare xizn û dewlemendiya edebiyatya Kurdî ya di warê helbestiyê de bibîne.

Ji ber ku di amadekirina vê tez a min de alîkariya min kiriye û rê nîşanî min daye, ez ji şêwirmendê teza xwe, mamosteyê hêja Yrd. Doç. Dr. Reşat AÇIKGÖZ re spas dikim. Ji ber ku pêşengiya vekirina Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî ya Zanîngeha Muş Alparslanê kiriye, wexta xwe ya hêja ji min re veqetandîye, bersîvên pîrsên min ên ku di derbarê tez a min de daye û rêberîya min kiriye, ji mamosteyê hêja Prof. Dr. Hasan ÇİFTÇİ re spas dikim. Ji ber xwendina teza min û rêberîya wî ez spasiya mamosteyê hêja Yrd. Doç. Dr. Canser KARDAŞ dikim. Herwiha ji bo ku teza min xwendin û di serrastkirinê de alîkariya min kirin, ez ji mamoste Nevzat EMİNOĞLU û mamoste İlyas SAYIM re spas dikim. Ji bo ked û xebata wî ya li ser Mele Xelîl û berhema wî ya *Nehcu'l-Enâmê* ji birêz Huseyin ŞEMREXÎ re gelek spas dikim.

Di dawîya dawiyê de jî ez ji bo sebr û alîkariya dayîka zarokên xwe, jê re spasdar im.

MUŞ - 2015

İbrahim GÖZETEN

KURTEBÊJE

amd.	: Amadekar
b.n.	: Berhema Navborî
bnr.	: Binêrin
c.	: Cild
Ç.	: Çap
Çev.	: Çeviren
T.C.	: Türkiye Cumhuriyeti
g.	: Gotar
g.n.	: Gotara Navborî
h.	: Hejmar
hwd.	: Herweha didome
j.	: Jimare
K.T.	: Komara Tirkiyeyê
m.n	: Maqaleya Navborî
r.	: Rûpel
s.	: Sayı
wer.	: Werger
s.x.l.	: Silavê Xwedê li ser be
k.d.	: Koça Dawî
c.n	: Cîh Nediya e.
t.n	: Tarîx Nediya e.
Vr	: Varaq

Elîfbêya Transkrîpsiyonê

Tîpên ku di elîfbêya Kurdî de tên bikaranîn û tîpên transkrîpsiyona wê				Tîpên ku îro di elîfbêya Kurdî de nînin	
ا	Ââ Ee	ل	Ll	ء	'
ب	Bb	م	Mm	ث	Ṣṣ
پ	Pp	ن	Nn	ذ	Ẓẓ
ت	Tt	و	Ww, Êê, Oo	ص	Ṣṣ
ج	Cc	ف	Vv	ض	Ẓẓ Ḍḍ
چ	Çç	خ	Xx	ط	Ṭṭ
د	Dd	ه	Hh	ظ	Ẓẓ
ر	Rr	ی	Yy	ع	'
ز	Zz	ی	Îî	غ	G̣g̣
ژ	Jj	ئ	Êê	ح	Ḥḥ
س	Ss				
ش	Şş				
گ	Gg				
ف	Ff				
ق	Qq				
ک	Kk				

Herfên Şemsî û Qemerî

Di zimanê Erebi de tîpên **Şemsî** û **Qemerî** hen in.

Tîpên Şemsî: Bêjeyên Erebi yên ku bi qertafa elîf û lamê (ا) tên nivîsîn, di xwendinê de ji bilî xwendina elîf û lamê û tîpên ku bi dubare (bi şedde) tên xwendin re tê gotin. Tîpên Şemsî çardeh hebin.

Tîpên Qemerî: Bêjeyên Erebi yên ku bi qertafa elîf û lamê (ل) tên nivîsîn, di xwendinê de tîpên ku di piştî xwendina elîf û lamê de tên xwendin re tê gotin. Tîpên Qemerî jî çardeh hebin.

Minak ji Tîpên Şemsî û Qemerî

Bêjeya Tîpên Şemsî	Nivîsin û Xwendina Tîpên Şemsî	Bêjeya Tîpên Qemerî	Nivîsin û Xwendina Tîpên Qemerî
الشَّمْسُ	Eş-şemsû	الأب	El-ebû
الرِّزْقُ	Er-rezqû	البِنْتُ	El-bîntû
النَّاسُ	En-nasû	الْجَمَلُ	El-cemelû
الرَّحِيمُ	Er-rehîmû	الْخُبْزُ	El-xubz

Me di vê xebata teza xwe de bêjeyên Şemsî û Qemerî bi vî şiklî nivîsî.

Mînak: Nehcu'l-Enâm, el-Habiyye fî îlmî âdâbî'l-bahsî ve'l-munâzara, Sîdretu'l-Munteha.

DESTPÊK

Peyva “klasik”, ji tiştên kevn yên ku dema xwe bihûrandine re tê gotin. Ew tiştên ku wek klasîk bi nav dibin, kok û bingehên wê qedîm in û di nav gel de demên pişt re jî kevneşopiya xwe didomîne.

Pênaseya “klasîk”ê ya ji bo edebiyatê jî ev e ku ji nivîs û berhemên di her demê de qimêtdar re tê gotin. Berhemên klasîk di pişt de jî, ji bîr nabin. Her tim di nav gel de bi coş û kêfxweşî tên xwendin.

Ferhenga Zana Farqînî de klasîk wiha tê terîfkirin:

“Tiştê ku bi ziman û hunera serdema kevn a Roma û Yewnan re têkildar e, tiştê ku bi ziman, huner û nivîskarên Fransîz ên serdema XVII. re têkildar e, berhem an jî hunermendê ku demeke dûvdirêj di ser re derbas dibe, tişteke ji qîmeta xwe winda nake. Herwiha kevneşopî, kevnare, vetûrî yanê tiştê ku tê de nûnî çênebûye, kevnare.”¹

Abdurrahman Adak, pênaseya edebiyata Kurdî ya klasik weha dike:

“Eger em bixwazin pênaseyek edebiyata Kurdî ya klasik ku unsur û taybetiyên wê di xwe de bicivîne (camî’ê efradê xwe be) û wê ji tiştên di veqetîne (manî’ê exyarê xwe be) bikin em dikarin weha bibêjin: “Ji edebiyata Kurdî ya nivîskî ya ku di serdema Îslamê de di bin bandora dînê Îslamê, unsurên Erebi û Farisî û çanda Îranê de li gorî hinek rêzikan hatiye meydana re “Edebîyata Kurdî ya Klasîk” tê gotin.”²

Zeynel Abidîn Zinar jî peyva klasîk wiha te’rîf dike: "

“Peyva klasîk, wek bêje bi wateya xwe ya ferhengî, ji wê nivîsê re tê gotin ku di çarçoveyê kifş de hatiye amadekirin. Lê di nava xelkê de bi gelek hawayên cuda tê fêmkirin. Îcar ji ber ku piraniya berhemên kurdî bi kêş û nîk û qafiyê hatine nivîsandin, ji ber hindê ye ku ji wan re klasîk hatiye gotin. Ev gotina klasîk, li piraniya welatên dinyayê jî her klasîk/kilasik tê gotin.”³

Ramazan Pertev di vê mijarê de weha dibêje: “Di edebiyata klasik de li gor mijaran wek mesnevî, siyer, mewlûd, meqtel gelek cureyên nezmê hene. Ferhengên menzûm jî

¹ Zana Farqînî, **Ferhenga Kurdî-Tirkî**, Stenbol: Wêşana Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, 2002, r.731.

² Abdurrahman Adak, **Despêka Edebîyat Kurdî ya Klasîk**, Stenbol: Wêşanê Nûbiharê, 2014, r. 31.

³ Zeynel Abidîn Zinar, **Di Çanda Kurdî de 37 Şaxên Zanistiyê**, Stockholm: Wêşanxaneya Çanda Kurdî, 2009, r.168.

cureyek ji edebiyata klasîk in. Lewra ji aliyê kêş û teşeyê ve girêdayî rêbaza edebiyata klasîk in.”⁴

Edebiyata Kurdî ya Klasîk

Edebiyata Kurdî ya klasîk bingeha ziman û edebîta Kurdî ye. Ziman û edebiyatya Kurdî li ser kok û rehên edebiyata klasîk zîl daye û hêşîn bûye. Cih û warê vê edebiyata klasîk ya Kurdî medresên Kurdîstanê ye. Nivîskar û hunermendên vê edebiyatê, zana û alimên Kurda nin. Ber û fêkiyên vê edebiyatê jî klasîkên Kurdî nin. Edebiyata Kurdî ya klasîk her çiqas li gorî edebiyata Ereb, Fars û Tirkî derfeta nifisandinê nedîtibe jî di rojhilata navîn de di warê edebiyatê de cihekî girîng digre.

Edebiyata Kurdî bi saya du heb çavkaniyan hetanî roja îroyîn gihîştîye destên me. Ji van çavkaniyan, yek çavkaniya nivîskî ya din jî devkî ye. Edebiyata devkî/zarekî edebiyata herî kevn a gelekî/miletekî ye. Edebiyata devkî di beriya edebiyata nivîskî de heye. Piştî destpêkirina edebiyata nivîskî jî xelas nabe. Li kêleka edebiyata nivîskî heyata xwe berdewam dike. Edebiyata devkî ya Kurdan bi saya serê dengbêj û çîrokbêjên Kurdan gihîştîye destê me. Ji ber ku zimanê Kurdî demek dur û dirêj hatiye qedexekirin, di warê nivîsînê de derfet û fîrset nehatiye dayîn, edebiyata Kurdî ya devkî derketîye pêş. Lewra Kurda şer û pevçûnên xwe, şîn û şahiyên xwe, derd û kederên xwe, evînên dilên xwe, kuştin û komkujîyên xwe bi dengbêjkî û çîrokbêjkî anînin zimên.

Edebiyata Kurdî ya klasîk jî herwekî edebiyata devkî edebiyateke temendirêj e. Ji bo edebiyata nivîskî derkeve holê pêwîst e ku tu zor û zordarî û qedexa li ser zimên tunebe. Yanê divê ku rewşeke hur û azad hebe. Dîrok şahid e ku di dema îstîbdat û zordestiyê de tu car fîkr û ramanên azad û edebiyatek xurt derneketîye ber çavan. Gava ku em li edebiyata Kurdî ya klasîk dinihêrin ev rewş gelek bi hêsanî tê dîtîn. Dema ku mirov li dîroka nivîsîna berhemên Kurdî yê klasîk mêze dike, mirov dibîne ku di wê demê de bi hindikayî be jî zor û te’de û qedexeyên li ser zimanê Kurdî kêmbûye. Ji ber

⁴ Ramazan Pertev, “Di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de Tradisyona Ferhengnivîsiya Menzûm”, **Kimlik, Kültür ve Değişim Sürecinde Osmanlıdan Günümüze Kürtler Uluslararası Bingöl Sempozyumu**, 2013, r. 683; Ji bo agahiyên berfireh bnr. Ramazan Perteva, “*Mîrsadu’l-efal (Şahrahê Kûdekan) Ferhenga Menzûm a Kurdî-Farîsî*”, (Teza Mastirê ya Neçapkirî, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtûya Zimanên Zindî yê li Tirkiyeyê Şaxa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî, 2012).

ku di serdema mîrektiyên Kurdan de ev derfet ji edebiyatê re hatiye dayîn, klasîkên Kurdî exleb di serdema mîrektiyan de hatine nivîsîn. Herwekî Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Ehmedê Xanî û Mele Xelîlê Sêrtî û hwd. di van serdemên mîrektiyan de derketine pêş.

Abdurahman Adak di vê mijarê weha dibêje:

“Di serdema klasik de edebiyata Kurdî ya klasik ji aliye teşeyên nezm û cureyên edebî ve di nav edebiyata klasik a roşilatê de cihê xwe yê taybet girtiye. Lê digel vê jî di hinek waran de hinek valahî mane û di wan waran de ji ber hinek sedeman di edebiyata kurdî de nimûne nehatine dayîn, yan jî nimûneyên zêf peyda bûne. Berhemên biyografîk ên derheqê jînenîgariya edîb û helbestvanan de û yên bibliyografîk ên derheqê kunyeyên berhemên de di nav wan waran de derdikevin pêş. Bi qasî ku tê zanîn di serdema klasik de di edebiyata Kurdî de çî bi navê “tezkiye” yan û çî bi navekî di berhemên serbixwe û biyografîk ên edîb û helbestvanan nehatine nivîsandin. Bo nimûne berhemeke biyografîk ku di sedsala XVIan, yan jî XVIIan de hatibe nivîsandin nayê zanîn. Bêguman ev tişt bi rewşa Kurdan ya dîrokî ve giridayî ye.”⁵

Nûnerên Edebiyatya Kurdî ya Klasîk

Di dîroka pêvajoya serencama edebiyata Kurdî ya klasik de gelek helbestvan û nivîskarên qedirşînas û navnas cîh girtine. Li pey xwe gelek berhemên giranbiha hiştine. Kesên ku di vî warê de cîh girtine hêjayî rêzê ne. Hüseyn Koyuncu di teza xweya mastirê de weha dibêje:

“M. Emin Demir, di meqaleya xwe ya bi navê, “*Li Ser Klasîkên Kurdî*” de ramanên Alexander Jaba, Enver Mayî û Celadet Elî Bedîrxan û nûnerên edebiyatya klasîk yên kurdî dihejmire. Nivîskarê edebiyatya klasîk ya kurdî yê yekemîn, Elî Herîrî ye. Hin Tahirê Hemedanî re dibêjin ku ew mitesewifê kurdan ê pêşî ye. Lêkolînerên kurd jî dibêjin ku nivîskarê edebiyatya klasîk a kurdî Îbn Xelîkan e. Di zemanê me de qet berhemê Îbn Xelîkan tune ne. Feqet berhemên Elî Herîrî ghiştine roja me. Alexander Jaba di pirtûka xwe de heşt nivîskarê klasîkên kurd dihejmire. Elî Herîrî (1010-1078), Melayê Cizîrî (1407–1481), Feqiyê Teyran (1560-1650), Melayê Batê (1417-1491), Ehmedê Xanî (1650-1706), Îsmailê Bazîdî (1654-1709), Şerefxanê Hekarî (1682-1748), Murad Xanê Bazîdî (1736-1778). Celadet Elî Bedîrxan jî di nav

⁵ Adak, **Destpêka Edebiyatya Kurdî ya Klasîk**, Stenbol: Wêşanê Nûbiharê, 2014, r. 52.

nivîskarên klasîk yên kurd de, Axayê Bidarî, Siyahpûş, Axayok, Mewlana Xalid, Mela Yehyayê Mizûrî, **Mela Xelîlê Sêrtî (1750-1843)**, Hecî Fetahê Hezroyî, Şêx Mihemedê Hedî, Şêx Evdîrehmanê Taxê, Şêx Nureddînê Birîfkî, Şêx Evdîrehmanê Axtepî, Melayê 'Erwasî dihejmirê. Ev helbestvanan bi kurmancî nivîsandin e.⁶

Ji wan nûnerên edebiyatya Kurdî yên berbiçav û naskirî ji wan yek jî Ehmedê Xanî ye. Ger îmkân û derfetên nivîsandinê yê Şêx Ehmedê Xanî herwekî Fîrdewsê Farisan hebûya, bêguman li dinyayê di alema nivîskarî û edebiyatê de wê bêhtir bihata naskirin. Lewra hêjayê naskirinê ye. Şêx Ehmedê Xanî hesreta xwe ya di vê mijarê de weha tîne zimên.

Ger dê hebûwa me jî xudanek
Alî keremek letîfedanek

Îlm û huner û kemal û îz'an
Şi'r û xezel û kitab û dîwan

Ev cinse bibe li ba wî me'mûl
Ev neqde biba li nik wî meqbûl

Min dê 'elema kelamê mewzûn
Alî bikra li banê gerdûn

Bi navê rûhê Melê Cizîrî
Pê hey bikira Elî Herîrî

Keyfek we bida Feqiyê Teyran
Heta bi ebed bimayî heyran⁷

⁶ Hüseyin Koyuncu, “*Di Hin Dîwanên Kurdî de Bandora Tesewûfê*”, (Teza Mastirê ya Neçapkirî, Zanîngeha Bîngolê Enstîtuya Zimanê Kurdî, 2014), r. 29.

⁷ Ehmedê Xanî, **Mem û Zîn**, (Amd. Huseyîn Şemrexî), Stenbol: Wêşanê Nûbiharê, 2009, r. 37.

Gava ku mirov li tema *Nehcu'l-Enâma* Mele Xelîlê Sertî dimeyîzîne, bi rehetî tê dîtî ku haja Mele Xelîl ji berhema Ehmedê Xanî ya bi navê *Eqîdeya Îmanê* hebûye, jê îstîfade kiriye û di bandora wî de maye. Mele Xelîl şexsiyetekî gelek zana, alim û welûd e. Ew tîrêjên ku wî li ser feqî û melayan belav kiribû her domiya bû, ta ku ew nûr û roniya han bi saya feqiyê wî ghiştibû zanayê mîna Bedî'uzeman Se'îdê Nûrsî, lewra Se'îdê Nûrsî li ber destê neviyê Mela Xelîl Mela Fethulah pijiya bû, hem ewê ku navê Bedî'uzeman li Se'îdê Nûrsî kiriye jî Mela Fethulah bi xwe ye. Mela Xelîl alimekî wisan e ku Bedî'uzeman Se'îdê Nûrsî di berhemên xwe yên bi navê Risaleyên Nûr de şî'rên wî ji xwe re wekî delîl nişan daye. Nûrsî weha dibêje: "Li bal me, zatekî gelek meşhûr û muheqîq û gotinên wî hucet e, bi Kurdî gotiye: 'Ji şerê sehaban meke qal û qîl. Lewra cenetîne qatîl û hem qetîl'." ⁸ Mele Xelîl ji bo feqî, mela û seydayên Kurdistanê mîna qurmekî ye, her şax û guliyên wan li ser wî qurmî bişkivîne. Çunkî pirî seydayên Kurdistanê yên ku icaze girtine, zincîra wan ya ilmê digihêje wî. Ew yek ji wan seydayên Kurd yê ku herî bi ber û behrem e. Lewra hema bêje di her warê ilmê de berhemên wî yên hêja hene. Her wisa kesê yekemîn e ku evqas kitêbên mevzûn nivîsiye. Ji bilî berhemên wî yên bi Kurdî yên wek qesîde, tecwîd û *Nehcu'l-Enâmê*, gelek kitêbên wî yên mewzûn ên bi Erebî jî hene. Berhema wî ya bi navê *Nehcu'l-Enâm* hem bi Kurdî ye û hem jî mewzûn e. ⁹

Armnaca me di vê xebatê de ev e ku her wekî ku tê zanîn li Tirkîyê di piştê "Înqîlaba Herfan" de nîfşên nû ji xwendina bi herfên Erebî bê par man. Ji bo nîfşên nû ji berhema *Nehcu'l-Enâmê* ya bi tîpên Erebî hatine nivîsîn sûd bigrin, tîpguhezî yan Latînzeya vê berhemê gelek pêwîst e. Herwekî zarokên Tirkan, zarokên Kurdan jî nikarin bi rehetî bi herfên Erebî bixwînin û jê îstîfade bikin. Jixwe berhemên Kurdî bi taybet jî yên klasîk hema hema bi tevahî bi herfên Erebî hatine hûnandin. Ji ber vê yekê xwendinwanên Kurd ji mîrîsa bav û kalên xwe bêpar dimînin û nikarin ji wan berhemên klasîk îstîfade bikin. Ev berhemên giranbiha jî diçin ber bi tunebûnê. Ji bo ku fersend û mecalên xwendevanan çêbin da ku bikaribin vê pirtûkê bixwînin, jê îstîfade bikin û kesayetiya Mele Xelîl binasin, me berhema *Nehcu'l-Enâmê* ji tîpên Erebî guharte tîpên Latînî. Her wisa jî ev berhema giranbiha ji mirina timî bifilite.

⁸ Bedîuzeman Saîd Nursî, **Mektubat**, İstanbul: Zehra Yayınları, 2013, r. 75.

⁹ Mele Xelîlê Sertî, **Nehcu'l-Enam**, (Amd. Huseyîn Şemrexî), Stanbol: Wêşanê Nûbiharê, 2012, r. 6.

REWŞA SERDEMA MELE XELÎL JÎ ALİYÊ SIYASÎ, CIVAKÎ Û ÎLMÎ VE

Serdema Siyasî

Di lêkolîn û lêgerinên ku li ser Kurdan hatine kirin de eşîrên wan mijareke balkêş e. Lewra eşîr hêleke wan a civakî di xwe de dihebîne. Mîrektiyên Kurdan jî konaxeke di ser eşîran re ye. Mîrektiyên Kurdan herwekî dewletek piçûk in û hêla wan ya siyasî digrin¹⁰. Serdema ku Mela Xelîl tê de jiyaye li Sêrtê û derdorên wê, hukumdariya mîrên Kurdan hebû. Wek mîrên Hekarî, Şerefxanên Bedlîsî, mîrên Cizîra Botan, mîrên Hîzanê û hwd. hebû. Her wisa jî li wê herêmê eşîrên Kurdan ên wek Milan, Nemiran û hwd. dijiyan.¹¹

Beg û mîrên Kurdan, ji destpêka peymanê ku di navbera Îdrîsê Bedlîsî û Yavûz Siltan Selîm de pêk hatiye hetanî serdema Tanzîmatê hebûna xwe mihafeze kirine. Bi destpika Tanzîmatê re hêz û quweta hukûmeta merkezî zêde bûye. Ev rewş di nav beg û mîrên Kurdan de bê huzûrî derxistiye. Bi sedemên cuda û li cihên cuda serhildan çêbûne.¹² Her wekî ku Chrîs Kûtschera neql dike, mîrekî Kurdan gotiye ku “ hakimê vî memleketî ez im. Padîşahê Osmanî nîne. Dibe ku ew jî min bi hêztir be. Lê ez jî ji wî bi esalettir im.”¹³ Di wê serdemê û herema ku Mele Xelîl tê de jiyaye de hêzên wekî, Bîzansan, Osmanîyan û Îranîyan jî demek dûr û dirêj hukim kirine.¹⁴ Di serencama dîrokê de Sêrt û herema wê bêşîktiya medeniyetê kiriye. Sêrt û herema wê di piştî şerê Çaldiranê (1514) de têkiliya navbera hukumdarên Kurd û Dewleta Osmanîyan de nêzîktahî çêbûye. Bi vasita van mîrên Kurd ên heremê, Îdrîsê Bedlîsî (k.d.926/1520) û Mihemed Axa Kelhokî (k.d.?)¹⁵ piştî şerê Çaldiranê (1514) bi Yavuz Siltan Selîm re peyman çêkiriye. Ji vê tarîxê şûn ve desthilardarên heremê, bi Dewleta Osmanîyan re têkiliyên dostane pêk aniye.¹⁶ Yê ku ev peyman çêkiriye yek ji wan mîrê Hisn-i Keyfê û Mîrê Sêrtê Mîr Xelîlê Eyyûbî ye.¹⁷ Ev rewş hetanî sala 1524an berdewam kiriye. Ev dirok jî bo tarîxa Sêrtê ya siyasî gelek muhîm e. Lê ew salên ku Mele Xelîl tê hatiye

¹⁰ Martin Van Bruinessen, **Ağa, Şeyh, Devlet**, İstanbul: İletişim Yayınları, 2003, r. 200.

¹¹ Mustafa Öncü, “*Basiretu’l-Kulûb fî Kelâmi ‘Allâmi’l-Guyûb Adli Eserinin Arap Dili Açısından İncelenmesi*”, (Teza Doktora ya Neçapkirî, Dicle Üniversitesi SBE, 2013), r. 3.

¹² Celile Celil, **XIX. Yüzyıl Osmanlı İmparatorluğu’nda Kürtler**, Ankara 1992, r. 51.

¹³ Öncü, **b.n.**, r. 3.

¹⁴ Öncü, **b.n.**, r. 4.

¹⁵ Öncü, **b.n.**, r. 4.

¹⁶ Öncü, **b.n.**, r. 4.

¹⁷ Veysel Gürhan, “İdris-i Bitlis’i ve Bölgenin Osmanlı Tarafından Fethi”, **I. Uluslararası Düünden Bugüne Tatvan Ve Çevresi Sempozyum Bildirileri**, Ankara: Beyan yayınları, 2008, r. 291

dinyayê bi gelemperi rewşa siyasî ya herêmê bi taybetî jî ya Sêrtê pir baş nebûye. Di wan salan de di navbera Dewleta Osmanî û Îranê de şer destpê kiribû. Xelqên heremê jî şerê ku di navbera Damat Îbrahîm Paşa û Îranê de derketibû gelek aciz bibûn. Heta ji meydana şer firar dikirin. Sêrt di navbera salên 1631-1632an de girêdayê eyaleta Wanê bûye. Piştî van salan hetanî sala 1864an jî girêdayê eyaleta Diyarbekir bûye. Hin şûn ve di salên dawî yên Serdema Tanzîmatê de di tarîxa 1864an de bi “Vîlayet Nîzamnamesî” bûye qeza Bedlîsê. Hetanî Serdema Cûmhûriyetê di vê rewşê de maye. Di dawiya dawiyê de jî digel avakirina Cûmhûriyetê ve gihîştîye statuya xwe ya wîlayetê.¹⁸

Serdema Civakî

Dema ku mirov li serdema Mele Xelîl tê de jiyaye dimeyzîne di vê serdemê de di derheqê jiyana Sêrtê ya civakî de, di çavkaniyan de mirov li tu agahîyan rast nayê. Herwiha di çavkaniyên sedsalên XVII û XVIIIan de di derheqê Sêrtê de agahi tune. Tê gotin hinek agahiyên ku di derheqê bajêr de ancax di sedsala XIXan de bi saya serê hinek seyyahan hatiye bi destxistin. Bekîr Samî Seçkîn, li gori tarîxa belgeya arşîva 1849an de dibêje ku di pêşiya vê tarîxê de li herema Sêrtê tu hejmartina nifûsê çênebûye û jimartina dû wê re jî bi tenê mîr hatine jimartin. Sêrtî li hemberê jimartina jinan derketine û jin nehatine jimartin. Ev rewş jî bo gelên Sêrtê yên di wê demê de dijiyan û jî bo nîşandayîna nêrînen xelqê yên di warê civakî de gelek muhîm e. Gava ku mirov li Sêrtê û herama wê li rewşa dînî meze dike, mirov dibîne ku dînê hakim dînê Îslamê û mezheba hakim jî mezheba Şafi'î ye. Herwisa di salnamên Diyarbekirê de nifûsa bajarê Sêrtê jî 52 hezar misliman û 17 hezar xeyrîmuslîm pêk dihat, bi tevahî jî nêzikî 70 hezarî bû. Lê nifûsa jina di nav vê hejmarê de nîne. Herkes li gorî baweriya xwe bê pirsgirêk dijiyan. Li gorî nûmra 1312-1317/1894-1900, 420 a “Sîrt Şer’îyye sîcîl defterî” di nav 350 heb dewan de tunebûna deweyên di navbera muslim û xeyrîmuslîman de, vê îddiyê îspat dike. Herwiha xeyrîmuslîm xwedî dadgeh bûn lê di hinek dewayên xwe de dadgehên/mahkemeyên şer’î tercîh kirine. Dema ku mirov li herêma ku Mele Xelîl tê de jiyaye mêze dike, mirov dikare bibêje ku netewên cuda cuda lê hebûn. Di heremê de, Kurd, Ereb, Errmenî, Keldanî û Suryanî dijiyan.¹⁹

Tespîta nifûsa di wê serdemê de li gorî komên dînî dihate kirin. Ji bo vê yekê mirov dikare rêjeya/oran nifûsa muslim û xeyrî musliman bizanibe. Lê di hêla hejmara

¹⁸ Öncü, **b.n.**, r. 4.

¹⁹ Öncü, **b.n.**, r. 5,6.

irkan/netewan de mirov nikare hejmareke qetî bibêje. Digel vê nifûsa mislimanan qismekî mezin ji Kurd û Ereban; ya xeyrîmuslîman jî, ji Ermenî, Suryanî, Keldanî, Cihû û Êzîdiyan pêk dihat. Li gorî belgeyeke sala 1526an di van salan de li Sêrtê 406 heb xane misliman, 217 heb xane xeyrîmuslîm û di nav cemeata xeyrîmuslîmanan de jî 14 heb xane ji Cihûyan pêk dihat. Di encamê de gava ku mirov bi gelemperi li civatê mêze dike di Sêrtê de dibîne ku kesên wekî Tirk, Kurd, Erebo, Ermenî, Keldanî, Suryanî û Êzîdî gelek netew û baweriyên cuda cuda bê pirsgirêk ligel hev dijiyan. Her grûbên dînî xwedîyê cihên taybet ê îbadetê û saziyên perwerdehiyê bûn. Ev tiştên han nîşan dide ku di wê serdemê de di nav wan grûbên cuda de têkilîyên aştîyane û dostane hebûne. Herwisa di nivê sedsala XIXan de li Sêrtê hebûna dêreke Ermenîyan, yek ya Suryaniyan û yek jî ya Keldaniyan di çavkaniyan de derbas dibe.²⁰

Serdema Îlmî

Serdema Mele Xelîl serdema nivê duyem ê sedsala XVIIan û nivê yekem ê sedsala XIXan e. Her çiqas di vê serdemê de di warê îlmê de paşveçûyîn hebe jî, alimên ku di vê serdemê de gihîştine jî hene. Di vê serdemê de li rojavaya Anatoliyayê kesên herwekî, Gelenbewî Îsmâil Efendî, Kalfazade Îsmâil Çinarî, Huseyîn Rifki Tamanî, Ömer Şîfaî û Gevrekzade Hafîz Hasan Efendi gihîştine. Li rojhilata Anatoliyayê (li herema Kurdîstanê) kesên herwekî Îsmâil Feqîrullah, Îbrahîm Heqîyê Erziromî, Nurettin Bîrîfkânî, Mevlana Xalid eş-Şehrezûrî û Mela Xelîl es-Sîurdî gihîştine. Pirên van aliman di ilmên wekî, matematîk, astronomî, erdnîgarî, tip, mantiq, munazara, belâxet, kelam, tefsîr, fîqih, hedîs û hwd. berhem nivîsîne. Xwebatên îlmî yên di vê serdemê de li gorî rojava paşde maye û tiştên ku di vî warî de di hate hêvîkirin pêk nehatiye. Ji ber ku navenda rêveberiyê Stenbol bû, fealiyetên îlmî yên dînî li rojavayê Anatoliyayê kêmtir be jî lê ilmên pozîtîf pêşketî bû. Li rojhilat jî ilmên dînî derketibû pêş.²¹

²⁰ Öncü, **b.n.**, r. 6,7.

²¹ Öncü, **b.n.**, r. 7,8,9.

Rewşa Medreseyan Di Serdema Wî De

Me'neya bêjeya "Medresê", xwendin, fêmkirin, ji berkirin û dubarekirin e. Mirov bi kurtasî dikare bibêje ku medrese cih û warê perwerdehiya medeniyeta dînê Îslamê ye

Medrese di pêşiyê de li cih û demên cuda hebin jî lê di serî de medresa Nîzamîye çebûye. Medresa Nîzamîye, ji hila wezîrê Selçûkîyan Nîzâmûlmulk ve li Nîşâbûrê, Bexda, Mervê, Heratê, Belxê, Besrayê, Îsfahanê, Âmulê, Mûsulê, Cîzrê, Reyê û hwd. vebûn. Lê li hêla din di eynî serdemê de Fatîmîyên Şîî li Qahîreyê saziya perwerdehiyê ya Ezher û Dârulhîkme saz kirine. Lê di warê xîzmeta medreseyan de bê guman xîzmeteke mezin û girîng jî ya Eyubîyan e. Tê gotin ku Eyubîyan bi tenê li Dimeşkê ji nod hebî zêdetir medrese însa kiribûn.²² Medrese li herema Mela Xelîl, li Sêrtê, Dîyarbekirê, Mêrdînê, Ruhayê û Entabê cara yekemin di serdema Eyubîyan û Artûqîyan de hatiye avakirin.²³

Gava ku em werin ser serdema Osmanîyan, di vê serdemê de mektebên sibyan hebûn. Pişt re li gorî termînolojiya niha saziyên perwerdehiyê yên wekî dibîstana seretayî, navîn, lîse û zanîngehan hebûn. Di serdema Osmanîyan de cara yekemin di serdema Orhan Gazî de di tarîxa 1331an de li bajarê Îznîkê, Medreseya Îznîkê ava bû.²⁴

Dû fetha Stenbolê re li medresan serdemeke nû dest pê kir. Di vê serdemê de di navbera salên 1463-1470an de di nav Kuliya Fâtîh de medreseyên "Sahnê Semân" saz bûne. Piştî medreseyên "Sahnê Semân" di navbera salên 1551-1557an de kuliya Suleymaniyeyê hatiye ava kirin. Bi avakirina vê kuliyeyê ve di serdema Osmanîyan de perwerdehiya medreseyan gihîştîye qada herî bilind. Ev pêvajoya hetanî serdema Tanzîmatê berdewam kiriye. Lê li hemberî rojava (Ewrûpa) li piya nesekinîne û paş de mane.²⁵

Sedemeke paşketina medreseyan a li gorî saziyên Ewrûpa yên perwerdehiyê ev e ku medreseyan perwerdehiya xwe li gorî keşf û îcada nû ya teknolojiyê nekirine. Ronansa ku li rojava (Ewrûpa) çêbû, medrese jê bê par man. Medreseyan di warê îlm

²² Öncü, **b.n.**, r. 8,9.

²³ Öncü, **b.n.**, r. 9.

²⁴ Öncü, **b.n.**, r. 9.

²⁵ Öncü, **b.n.**, r. 9,10.

û perwerdehiyê de ronesansa xwe pêk neanîn. Li medreseyan perwerdehî zêde giraniya xwe dan ser îlmên aletê û dînî, îlmên eqlî û fenî tê de kêmbûn. Ji ber vê yekê jî li hember saziyên perwerdehiyê yên modern zêde li piyan neman. Ustad Bedîûzeman Seîdê Kurdî jî di vî warî de rexneyekê tîne ser medresan û dixwaze ku ilmê fenî û dînî hevûdu himêz bike û li medreseyan bi hev re were xwendin da ku himeta xwendekaran herwekî çivîkan perwaz bike. Lewra kesê ku bi tenê ilmê dînî bixwîne û yê fenî nexwîne di wî de “teasûb” çêdibe. Kesê ku bi tenê ilmê fenî bixwîne û yê dînî nexwîne di wî de jî “hîle, şubhe û înkâr” çêdibe. Herdu jî ne baş in. Ji bo vê yekê Ustad Bedîûzeman Seîdê Kurdî dibêje, ku “ronahiya wîjdanê îlmên dînî ye, nûra aqil îlmên fennê ye. Bi hev hêmez kirina herduyan heqîqet derdikeve holê. Bi herdû cenahan/hêlan himeta teleban perwaz dike. Wexta ku ji hew biqetin di yê yekemîn de teasub, di yê duyemîn de jî hîle û şuphe derdikeve.”²⁶

Rewşa Medreseyan Sêrtê û Derûdora Wê

Wexta ku Dewleta Osmanî paş ket di heman demê de medrese jî paşve çûn. Lê li Kurdistanê bi taybet li Sêrtê li medrese aktif bûn. Lewra di navbera sedsalên XVIII û XIXan de ji medresên Sêrtê alimên mezin ên wekî Îsmâîl Feqîrûlâh, Îbrahîm Heqiyê Erziromî û Mele Xelîlê Sêrtî gihîştin. Li gorî ku di salnameyan Diyarbekirê û Bedlîsê de derbas dibe li Sêrtê û li herema wê behsa gelek medreseyan tên kirin. Ev medrese di serî de Medreseyan Diyarbekirê û yên din jî Medreseyan Mêrdînê û Bedlîsê bûne.

Di vê serdemê de li navênda Sêrtê li medreseya Mahmûdiyeyê (Siirt Merkez Mahmudiye Medresesi) bîst û pênc heb xwendekar perwerdehî didîtin. Di wê serdemê de medreseyan ku perwerdehî lê dibû jê yek jî medreseya Fexriyeyê bû. Mela Xelîl jî di vê medresê de sîh salî muderîstî kiriye. Tê gotin ku li vê medresê jî bîst û pênc heb xwendekar ders dixwendin. Herwisa tê gotin ku li Medreseya Rahmiyeyê jî bîst û pênc heb xwendekar ders dixwendin. Ji bilî van medresyan tê ziman ku li Medreseya Bîkent û Bîtarîq çar heb xwendekar ders dixwendin.²⁷

²⁶ Bedîûzeman Saîd Nursî, **Îçtîmâî Dersler**, İstanbul: Wêşanên Zehra, 2012, r. 142.

²⁷ M. Ali Yaşar, “19. Yüzyılda Siirt’te Eğitim”, **İbrahim Hakkı ve Siirt Ulemâsı Sempozyumu**, İstanbul: Beyan Yayınları, 2008. r. 39,54.

Rewşa Medreseyên Bedlîsê

Herema ku Mela Xelîl lê jiyaye ya muhîm Bedlîs e. Di pêvajoya dîrokê de Bedlîs ji gelek xanedanan re bûye navend. Her wisa bi medreseyên xwe navdar e. Medreseyeke girîng ya li Bedlîsê Medreseya Hacı Bexiye ye. Li Bedlîsê li tenîştî Camiya Hacı Bexiyyê hatiye însa kirin. Ji hêla Emir Mûhamed ve di sala 1444an de hatiye çêkirin. Ya din Medreseya Şerefiyyê ye. Ev medrese digel Camiya Şerefiyyê ji hêla Şeref Xanê IVan ve hatiye çêkirin. Ya din Medreseya Îxlasiyyê ye. Ev medrese ji hila Şeref Xanê V.an ve di sala 1589an de hatiye çêkirin. Ya din Medreseya Nûhiyyê ye. Li rojhilatê bajêr e. Di sala 1700an de hatiye avakirin. Ya din Medreseya Hatibiyê ye. Li mehela Zeydanê ye. Ev medrese çî wext ava bûye ne diyar e. Ya din Medreseya Yûsufiyê ye. Avakirina vê medreseyê ne kifş e. Lê ji mîmariya wê kifş dibe ku di navbera sedsalên XVII û XIXan de çêbûye.²⁸

Rewşa Medreseyên Hîzanê

Medreseyên li Hîzanê ava bûne, herwekî medreseya Îsîvê Welî, Medreseya Mîr Dawûd, Medreseya Atîk, medreseya Meydanê, medreseya Şêxzade, medreseya Sîgal û medreseya Taxê ye. Li Medreseya Taxê kesên wek Evdirehmanê Taxî (1831-1886), Muderîs Mihemed, Mihamed Diyaûddîn (Zîyaûddîn) (1855-1923) (kurê Evdirehmanê Taxî) xwendine. Şeref Xan, di berhema xwe ya Şerefnamê de di derheqê vê medresê û damezrînerê vê medreseyê de bi pesndarî behsa Mîrê Hîzanê Emîr Dawûd bîn Melîk dike.²⁹ Li medreseya Atîk; kesên wekî Feqiyê Teyran (H. 970-1050) (M. 1563-1641) xwendiyê.³⁰ Medreseya Meydanê; tê gotin ku di vê medresê de gelek alimên mezin gihîştine. Ji yek ji wan jî Mela Xelîlê Sêrtî ye. Mele Xelîl, di nîvê duyemê sed sala XVIIIan de ji gelek aliman ders hilgirtiye û perwerdehiya xwe xelas kiriye. Di destpêka nîvê duyemê sedsala XIXan de li vê medresê dest bi muderîstiyê kiriye. Yanê Mele

²⁸ M. Halil Çiçek, “Tatvan ve Çevresinde İlmi Çalışmalar ve Ohin Medresesi Örneği”, **I. Uluslararası Dünden Bugüne Tatvan ve Çevresi Sempozyumu**, Ankara: Beyan Yayınları, 2008., r. 565,587.

²⁹ Şeref Xan, **Şerefname**, (Amd. M.Emin Borzaslan), çapa sêyem, Diyarbakir 2006, r. 163.

³⁰ Ji bo medreseyên Bedlîs û derûdora wê bnr. M. Halil Çiçek, “Tatvan ve Çevresinde İlmi Çalışmalar ve Ohin Medresesi Örneği”, **I. Uluslararası Dünden Bugüne Tatvan ve Çevresi Sempozyumu**, Ankara: Beyan Yayınları, 2008, r.565,587; Mehmet Yalar, “Tatvan ve Çevresinde Tarihi Medrese Geleneği”, **I.Uluslararası Dünden Bugüne Tatvan ve Çevresi Sempozyumu**, Ankara: Beyan Yayınları, r. 643,659; Hasan Çiçek, “Hizan’ın Kültürel Zenginliğinin Tarihsel Arka planı”, **I. Uluslararası Dünden Bugüne Tatvan ve Çevresi Sempozyumu**, Ankara: Beyan Yayınları, r. 659,691.

Xelîl li vê medresê hem feqetî û hem jî muderistî kiriye. Li vê medresê muderîstiya wî nêzîkî 10 salî berdewam kiriye.³¹

Rewşa Edebiyatya Kurdî Di Serdema Mele Xelîl De

Mele Xelîl di sala 1750î de ji dayîka xwe bûye û di sala 1843yan de çûye rehma Xwedê. Ji bo ku em cihê Mele Xelîl a di edebiyata Kurdî de fêr bikin, pêwîst e ku em behsa rewşa edebiyatya Kurdî ya wê serdemê bikin.

“Piştî ku di sala 1514an de dewleta Osmaniyan bi alîkariya mîrên Kurdan di şerê Çaldiranê de Sefewî têk birin, ji bo Kurdan serdemeke nû destpê kir û mîrektiyên Kurdan desthilatdariya xwe bihêztir kirin. Herwiha saziyên wan ên siyasî, dînî û perwerdeyî ava bûn û geştir bûn. Di vê atmosfera rewşenbîrî de helbestvan gihîştin û di encamê de helbestên Kurdî derketin holê. Di vê serdemê de helbestvan li dora qesrên mîran kom dibûn. Helbestvanên vê serdemê Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Wedaî, Selîmê Silêmanî (Hîzanî) û Harîsê Bedlîsê li dora mîran rabûne û bûne helbestvanên wan.”³² Di dawiya sedsala şazdeh û destpêka sedsala hîvdehan de ji aliyê Melayê Cizîrî û Feqîyê Teyran ve di warê xezel û menzûmeyên tesewîfî de bingeş hatibûn avêtin. Îcar di sedsala hîvdehan de jî di hinek warên dî de bingeş hatiye avêtin. Ehmedê Xanî di warê mesnewiyên evînî û mesnewiyên dîdaktîk ên di derheqê ferhengnasî û zanistên dînî de bingeşeke baş avêtiye û digel Mela û Feqî edebiyata Kurdî ya klasîk saz kirine. Di vê sedsalê de Şêx Şemsedînê Exlatî, wekî şêxekî terîqeta Xelwetî di warê helbesta tekyayê û remzî de pêşengî kiriye. Bi vî awayî Xanî û Exlatî wekî du nûnerên herî girîng ên vê sedsalê derdikevên pêş. Lê ji bilî Xanî û Xelwetî hinek nûnerên dî yên edebiyata Kurdî ya Kurmancî yên wekî Remezanê Cizîrî, Axaokê Bêdarî, Laxer û Mela Remezanê Ebbasî jî derketine meydana ku mirov dikare peyewiya Melayê Cizîrî hê di wê demê de bi van kesan bide destpêkirin. Sedsala hîvdehan di warê pexşana Kurdî de jî sedsala destpêkê ye ku nûnerê pexşana Kurdî yê yekem Eliyê Teremoxî di vê sedsalê de jiyay ye. Mirov dikare bêje ku di sedsala hîvdehan de edebiyata Kurdî ya Kurmancî ya klasîk bi her awayî damezarîna xwe temam kiriye.³³

Selîmê Silêmanî (Hîzanî) şairê sedsala 18ê ye û Yûsuf û Zuleyxaya xwe di sala 1759ê Mîladî de nivîsiye. Herwisa di vê mesnewiya wî de jî diyar e ku ew di dema mîrê

³¹ Çiçek, **b.n.**, r. 670-671.

³² Bamed Serdar, **Dîwana Şêx Şemsedînê Exlatî**, Stenbol: Wêşanê Nûbihar, 2015, r.22.

³³ Adak, **b.n.**, r. 244.

Hîzanê de jiyaye û ji wî re medhiye nivîsiye.³⁴ Di vir de ji bo vê serdema Mele Xelîl hîn bêhtir were fêmkirin li gorî min kesayeta Selîmê Silêmanî (Hîzanî) muhîm e. Lewra Selîmê Silêmanî (Hîzanî) hem hemşehriyê wî ye û hem jî hem salê wî ye. Lewra em dizanin ku Selîmê Silêmanî (Hîzanî) di dema mîrektiya Hîzanê de jiya ye û berhema xwe ya bi navê Yûsuf û Zuleyxa ji mîrê Hîzanê re nivîsiye û em dizanin ku mîrektiya Hîzanê di warê siyasî, dînî û edebiyatê de gelek bihêz e. Abdurahman Adak di vê mijarê de weha dibêje: “Di serdema mîrektiyan de ji aliyê Mele Xelîl ve berhema Nehcu’l-Enamê hatiye nivîsandiye.”³⁵

NIRXANDINA LÊKOLÎNA TEZA ME Ê ÇAVKANIYÊN WÊ

Di vê xebata teza me de çavkaniya me ya yekemîn, berhema mijara me Nehcu’l-Enam bi xwe ye. Me xebata xwe bi pirranî li gorî naveroka Nehcu’l-Enamê meşand. Ya duyemîn ew xebat in ku li ser Mele Xelîl û berhemên wî hatinê kirin. Ya sêyemîn berhemên Mele Xelîl yê din in. Li ser Mele Xelîl û berhemên wî xasma li ser berhema mijara me Nehcu’l-Enamê xebatên zanistî pir hindik in. Berhemên Mele Xelîl yê din jî hinek ji wan destnivîs in, hinek ji wan nehatine çapkirin û hinek ji wan jî bi tenê di pirtûkxaneyên şexsî de ne. Hinek berhemên wî hene lê haya me ji wan nine, ango wenda ne. Piraniya berhemên Mele Xelîl bi zimanê Erebî ne. Sê-çar heb xebatên mastirê û yek jî ya doktorayê li ser Mele Xelîl û berhemên wî yê din hatine kirin, du-sê heb maqale hatine nivîsîn û di hinek sempozyûman de jî di derheqê Mele Xelîl û berhemên wî de agahî hatine dayîn. Li ser berhema Nehcu’l-Enamê jî şerh hatine kirin. Di mijara behsa tehlîla berhema Nehcu’l-Enamê de bi awayekî berfireh me behsa van şerhan kiriye. Şerha ku di destê me de, şerha Ahmed Hîlmî El Qoxî El Diyarbekîrî ya bi navê “Rehberê Ewam Şerha Nehcu’l-Enam”ê ye. Me di vê xebata xwe de ji vê şerhe gelek îstîfade kir.

Me di vê xebata xwe de *Nehcu’l-Enâma* Mele Xelîl ya ku ji hêla Huseyîn Şemrexî ve hatiye berhevkirin û di sala 2012an de ji wêşanên Nûbiharê derketiye, da ber xwe û ji xwe re wek nusxeya eslî hilpejirand. Me kar û xebatên xwe yê di vî warî de li gorî vê çapa berhemê meşand. Sedema ku me ev nusxe da ber xwe ev e ku Huseyîn Şemrexî li ser nusxe û destxetên *Nehcu’l-Enâma* Mele Xelîlê Sêrtî gelek xebat kiriye û

³⁴ Selîmê Hîzanî, **Yûsuf û Zuleyxa**, (Amd. Ayhan Geverî), Stenbol: Wêşanê Nûbihar, 203, r. 1.

³⁵ Abdurahman Adak, “Di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de Cureyeke Edebî: Zanistên Edebî”, **Kovara Nûbiharê**, Cild 19, Jimar 132, 2015, r. 7.

kedek mezin daye. Li ser wê lêgerîn û lêkolîn kiriye. Li arşîv û pirtûkxaneyên netewî yê fermî geriya ye. Heyşt heb nusxe û destxet berbihev kiriye û dane berhev û rûbirû kiriye. Şemrexî di vê xebata xwe de ferqa nusxeyan û îzahatên wan wekî jêrenotê di di binî de wek nîşe îşaret kiriye. Me di vê xebata xwe de jêrenota ferqa nusxeyan hilnegirt, bi tenê kismên îzahatan hilgirt.

Helbete çavkaniyên ku me jê sûd wergirtine, ev bi tenê nîn in. Me ji bo agahiyên taybet û gelemperî ji gelek çavkaniyên sereke îstifade kiriye.

BEŞA YEKEM

JIYAN Ê BERHEMÊN MELE XELÎL Ê KESAYETÎYA WÎ YA EDEBÎ

1.1. JIYANA MELE XELÎL

1.1.1. Navê Wî

Navê nivîskar di berhemên wî de û di xebatên ku li ser wî û berhemên wî hatine kirin de herwekî Xelîl b. Mollâ Huseyin b. Mollâ Xelîl es-Si'irdî³⁶ derbas dibe. Lê di hinek çavkaniyan de jî navê wî herwekî Xelîl bîn Mela Huseyn El Îs'irdî "Siirdî" El Kurdî³⁷ derbas dibe. Di çavkaniyan de di derheqê tarixa jidayikbûn û wefata wî de îxtilaf heye. Lê li ser navê wî yê Mollâ Xelîl es-Si'irdî îxtilaf nîne.³⁸

1.1.2. Nîsbet û Mexlasa Wî

Di çavkaniyan de ji bo Mele Xelîl gelek nîsbet hatine bikaranîn. Ew nîsbet jî ev in: Di hinek çavkaniyan de tê gotin ku nesla Mele Xelîl bi wasita Siltan Şêxmûs digihêje Hz. Omer û ji bo vê yekê jî yek nîsbeta wî Omerî ye.³⁹ Ji ber cihê jî dayikbûna wî nîsbeta el-Hîzanî, el-Gulpikî,⁴⁰ û el-Kulatî⁴¹, ji ber cihê lê jiyaye nîsbeta es-Si'irdî⁴², ji ber neseba wî nîsbeta el-Kurdî⁴³, ji ber mezheba wî nîsbeta eş-Şafîî⁴⁴ hatiye gotin. Nivîskar di hinek helbestên xwe de "*Lî kâtibîhî Xelîl Şewqî*" gotiye û mexlesa Şewqî bikaraniye.⁴⁵

Mele Xelîlê Sêrtî di hinek helbestên xwe de navê xwe yê rastîn ne, mexlesa "Şewqî" û "Xelîl" jî bikaraniye. Abdurahman Adak di derheqê mexlesa "Şewqî" û "Xelîl" de weha dibêje:

"Mela Xelîlê Sêrtî di menzûmeya xwe ya bi navê *Nehcu'l-Enâmê* ya ku gelekî naskirî û belavbûyî de di beyta mexlesê de navê xwe yê rastîn emilandiye. Ew beyta ku navê wî tê de derbas dibe eve.

³⁶ Öncü, **b.n.**, r. 19; Ömer Pakiş, "*Mollâ Halîl es-Siirdî ve Tefsirciliği*", (Teza Mastirê ya Neçapkiri, Marmara Üniversitesi SBE, 1996), s. 6; Faruk Kazan, "*Mollâ Halîl'in Bilgi ve Varlık Anlayışı (Tesisu'l kavâid Çerçevesinde)*", (Teza Mastirê ya Neçapkiri, Dicle Üniversitesi SBE, 2013), r. 1.

³⁷ Mehmet Çağlayan, **Şark Uleması**, İstanbul: Çağlayan Yayınları, 19996, r. 139.

³⁸ Öncü, **b.n.**, r. 19; Kazan, **b.n.**, r. 2.

³⁹ Kazan, **b.n.**, r. 1; Öncü, **b.n.**, r. 19.

⁴⁰ Kazan, **b.n.**, r. 2; Öncü, **b.n.**, r. 19.

⁴¹ Öncü, **b.n.**, r. 20.

⁴² Kazan, **b.n.**, r. 2; Öncü, **b.n.**, r. 19; Çağlayan, **b.n.**, r. 139.

⁴³ Kazan, **b.n.**, r. 3; Öncü, **b.n.**, r. 19.

⁴⁴ Kazan, **b.n.**, r. 3; Öncü, **b.n.**, r. 19;

⁴⁵ Öncü, **b.n.**, r. 23.

Xelîlî qe ev çerz bi zâ'et nebû
Welê ew bi fermânâ exxê xwe bû

(b/261)

Lê wî di helbestên xwe de di beyta mexlesê de ne navê xwe yê rastîn, lê mexlesek cuda ji xwe re hilbijartîye. Ev mexles jî “Şewqî” ye. Lewra ew wekî “Xelîl Şewqî” hatiye naskirin û wî bi xwe jî di serê helbestên xwe de ji bo xwe gotîye “Xelîl Şewqî”. Her weha di sîlsileyên icazetnameyên ku li medreseyan dihatin sitandin de jî, Mela Xelîlê Sêrtî wekî “Xelîl Şewqî” derbas dibe (Seyda, wr. 6b). Lê mixabin ev helbestên ku mexlesa wî di wan de ye, zehf belav nebûne û Mela Xelîlê Sêrtî bi vê mexlesê meşhûr nebûye. Ew bêhtir bi navê xwe hatiye naskirin. Sebebê vê ew e ku helbestên Mela Xelîlê Sêrtî bes di mecmû'eyên destnivîsar de mane û nehatine çapkirin.

Digel ku mexlesa Mela Xelîlê Sêrtî “Şewqî” ye jî, wî di hemû helbestên xwe yên Erebi de jî û di yên Kurdî de jî ev mexles bi kar ne aniye. Di nav van helbestên wî yên Kurmancî de Mela Xelîlê Sêrtî bes di helbestekê de ev mexles bi kar aniye. Ew beyta mexlesê jî eve (Sêrtî, Mecmû'e, 1192/1778, wr. 45):

Fidayê wî bibin sed mislê Şewqî
Ji dor wî kêr nebin halî û zewqî

Lê di piraniya helbestên xwe yên Erebi de wî mexlesa “Şewqî” bi kar aniye. Wekî dawî em dikarin bêjin ku du mexlesên Mela Xelîlê Sêrtî hene. Yek ji wan navê wî “Xelîl” e, ya di jî “Şewqî” ye.”⁴⁶

1.1.3. Salbûn û Cihê Jidayîkbûna Wî

Mele Xelîl di sala 1750⁴⁷an de yan jî 1751⁴⁸an de hatiye dinê. Herçiqas di derbarê dîroka Xwedêdayîna Mele Xelîl de îxtîlaf heye jî, lê di piraniya çavkaniyan de dîrok ji dayîkbûna wî wek 1750î derbas dibe.⁴⁹ Jixwe li ser kêla mezelê wî jî dîroka jidayîkbûna wî 1750î hatiye nivîsîn.⁵⁰ Li ser cihê jidayîkbûna Mela Xelîl îxtîlaf nîne. Çavkaniyên di vî warî de tev cihê jidayîkbûna wî gundê Gulpîkê yê li ser navçeya

⁴⁶ Abdurrahman Adak, “Mela Xelîlê Sêrtî: Helbestvanê Bi Mexlesa “Şewqî” û Helbestên Wî Yên Kurdî (Kurmancî)”, *Kovara Muqedîmeyê ya Zanîngeha Artûklû ya Mêrdînê*, j. 1, 2010, r. 156.

⁴⁷ Öncü, *b.n.*, r.; Şemrexî, *b.n.*, r. 5; Kazan, *b. n.*, r. 2; Pakiş, *b.n.*, r. 6; Ömer Pakiş, “Mollâ Halîl es-Siirdî”, *Türkiye Diyanet Vakfı İslâm Ansiklopedisi (DİA)*, İstanbul: C.XXX, s. 250.

⁴⁸ Öncü, *b.n.*, r. 20; Kazan, *b.n.*, r. 2.

⁴⁹ Şemrexî, *b. n.*, r. 5; Kazan, *b. n.*, r. 2; Pakiş, *b.n.*, r. 6; Öncü, *b.n.*, r.20; Adak, *b. n.*, r. 31.

⁵⁰ Kazan, *b. n.*, r. 2.

Hîzana Bedlîsê nişan didin.⁵¹ Navê bavê wî Mele Huseyn, navê kalikê wî jî Mele Xalid e.⁵² Lêbelê navê bavê wî di hinek çavkaniyan de wekî Mele Hesên jî derbas dibe.⁵³

1.1.4. Malbata Wî

Ji bo agahiyên di der barê malbata Mele Xelîl de ev agahî û şecereya jêrîn ya ku neviyê Mele Xelîl M. Macîr Sevgili daye me, em pê kîfayet dikin.⁵⁴

Siltan Şexmûs Ez-Zûlî El-Ömerî

Wekî Siltan Şexmûs tê naskirin. Navê wî yê rastîn Şêx Mûsa ez-Zûlî el-Mêrdînî ye. Neseba wî digîhêje Hz. Omer. Navê bavê wî Mahin el-Mêrdînî ye. Siltan Şexmûs damezînerê terîqeta Zûlî ye. Digel vê hevalê Şêx Evdîlqadirê Geylanî ye. Şêx Evdîlqadirê Geylanî gelek pesna Siltan Şexmûs daye. Ji wî gelek kerametên mezin sadir bûne. Ji bo kerametên wî li pirtûka Îmamê Şa'ranî ya bi navê "Tebaqatu'l-Kubra" mêzeke.

⁵¹ Şemrexî, **b.n.**, r. 5; Kazan, **b.n.**, r. 2; Pakiş, **b.n.**, r. 6; Öncü, **b.n.**, r.20. Adak, **b.n.**, r. 31.

⁵² Şemrexî, **b.n.**, r. 5.

⁵³ Öncü, **b.n.**, r. 20.

⁵⁴ M. Macîr Sevgîlî,-Yrd. Doç. Dr, Mijara Pirsê "Neseb û Şecera Malbata Mele Xelîl", (Têkilî bi Telefonê û Maîlê Pêkhat), 20 Tîrmeh 2015.



* **Hecî Huseyin Axa**, Heşetê Bêriyê Spî, li gundê Belenoluka Perwari îqamet kiriye. Mîrê herema Botan bû.

** **Neseba Şêxên Zokaydê**, Ji Şêx Îzzeddin berdewam dike.

*** **Neseba Şêxên Çokraşê**, Ji Mele Suleyman berdewam dike.

**** **Seyda Mele Xelîl**, Nêzî 40 berhemên wî hene. Silsîleya îcazeta li Kurdîsnê bi tevahî digihêje wî. Bi leqaba “ellame” meşhûre. Di hemû îlman de otorîter tê qebûlîkirin. Li Sêrtê medfû ne.

***** **Mele Evdilah**, Pêşiyê li Gulpîka Hîzanê dîre li gundê Semerşêxê bi cîh bûye. Xelîfeyê Mewlana Xalidê Bexdadi ye.

***** **Şêx Evdirehmanê Melekendi**, Ji apê xwe Seyda Mele Xelîl îcazet girtiye.

***** **Neseba Şêxên Oxî**, Ji Şêx Muhamed berdewam dike. Li gund Werkanîsê medfûn e.

1.1.5. Eşîreta Wî

Di hinek çavkaniyan de neseba wî nîsbetî Şêx Mûsa ez-Zûlî tê kirin. Şêx Mûsa ez-Zûlî di nav xelqê de wekî Siltan Şêxmûs tê naskirin û tirba Siltan Şêxmûs di navbera Diyarbekirê û Mêrdînê de li ser devê rê ye.⁵⁶ Tê gotin ku nesla Mele Xelîl bi wasita Siltan Şêxmûs digihêje Hz. Omer. Ji bo vê yekê jî yek nîsbeta wî Omerî ye.⁵⁷ Lêbelê lêkolînên van demên dawî yên li ser berhemên wî hatine kirin tê gotin ku neseba wî nagihêje Hz. Omer û ev nîsbeta wî di encama fêmkirinek xeletî de derbasî çavkaniyan bûye.⁵⁸ Lê dîsa jî di hinek çavkaniyan de navê kalikê wî wek Omer derbas dibe.⁵⁹ Li gorî neviyê wî Macit Sevgili sedema vê nakokiya di nav lêkolîneran de jî ev e ku hinek ji wan lêkolîneran bi taybet jî yên nû dibêjin ku ne mumkûne Mele Xelîl ji hêla neseba xwe ve hem Omerî û hem jî Kurd be. Lewra gava ku Omerî be Ereb e, ne Kurd e. Lê gava ku Kurd be, ne mumkûne ku Ereb be. Lêbelê li gorî neviyê wî Macîd Sevgîli ev ji bo neseba Mele Xelîl ne pirsgirêk e. Lewra ji bo neseba wî di heman demê de dibe ku hem Omerî û hem jî Kurd be û ev ji hevûdu re manî nîne û dibêje ku em hem Kurd in û hem jî Omerî ne.⁶⁰

1.1.6. Cîh û Tarîxa Wefata Wî

Li ser wefata tarîxa Mela Xelîl îxtîlaf heye. Lê di piraniya çavkaniyan de tarîxa wefata wî wekî sala 1259/1843an derbas dibe.⁶¹ Ji bo tarîxa wefata Mele Xelîl me jî ev tarîx ji bo vê xebata xwe hilpejirand û edî hewce nîne ku em li ser îxtîlafê tarîxa wefata wî bisekinin. Li ser cîhê wefata Mele Xelîl tu îxtîlaf tune. Di hemû xebatên ku li ser Mele Xelîl û berhemên wî de cîhê wefata wî Sêrt e.⁶² Mele Xelîl di 96 saliya emrê xwe de çûye rehma Xwedê.⁶³ Li rojhilata bajêrê Sêrtê li gorîstana Bileyliyeyê hatiye definkirin.⁶⁴ Mela Xelîl li pey xwe 4 zarok hiştine. Mela Mustafa kurê wî yê mezin e. Li

⁵⁶ Kazan, **b.n.**, r. 3; Öncü, **b.n.**, r. 23.

⁵⁷ Kazan, **b.n.**, r. 5; Öncü, **b.n.**, r. 24.

⁵⁸ Öncü, **b.n.**, r. 24.

⁵⁹ Öncü, **b.n.**, r. 23.

⁶⁰ M. Macît Sevgîli, -Yrd. Doç. Dr, Mijara Pirsê “*Neseb û Eşîreta Malbata Mele Xelîl*”, (Têkilî bi Telefonê û Mailê Pêkhat), 20 Tîrmeh 2015.

⁶¹ Pakiş, **b.n.**, r. 9; Pakiş, **b.n.**, r. 250; Kazan, **b.n.**, r. 9; Öncü, **b.n.**, r. 24; Adak, **b.n.**, r. 31; Şemrexî, **b.n.**, r. 6.

⁶² Şemrexî, **b.n.**, r. 6; Öncü, **b.n.**, r. 24; Kazan, **b.n.**, r.9; Pakiş, **b.n.**, r. 19; Adak, **b.n.**, r. 31.

⁶³ Adak, **b.n.**, r. 31.

⁶⁴ Adak, **b.n.**, r. 31; Şemrexî, **b.n.**, r. 6.

Ciddeyê medfûn e û li ser kêla bavê xwe bi Erebi mersiyeyek nivîsiye.⁶⁵ Kismek ji wê mersiyeyê;

Efelet Şemsu'l-Bedî fî'l-Ulûmî (Rojeke bêmisl a ilmê çû ava)

Înna lillahî we îinna lî ilahî racî'un (Em ji Wî hatine û em ê dîsa vegezin bal Wî)

Qemerun hele bî Hîzan e, bî Îs'irde xereb e (Hîv derket ji Hîzanê û li Sêrdê çû ava)

Neşere'l-Îlme feehlu'l-Îlmî minhu axîzun⁶⁶ (Ehlê ilmê ji wî ilim girtin û belav kirin)

1. 2. BERHEMÊN MELE XELÎL

Mele Xelîl, di gelek ilman de pispor e û di gelek warê ilmê de berhem nivîsiye. Derbarê ilmên wekî serf, nehew, belaxet, mentiq, munazere, cedel, wezi', 'eqîde/kelam, hedîs, fiqih, tefsîr, tecwîd, tesewuf, mewlîd, şemail û hwd. de berhemên wî hene. Pirraniya berhemên wî bi Erebi ne, lê çend berhemên wî jî bi Kurdî ne. Her weha berhemên wî hinek jê mewzûn in û hinek jî pexşan in. Heta di hinek berhemên xwe de her du jî yanî hem cureyê nivîsa pexşan û hem jî ya mewzûn bi hev re bikaraniye.⁶⁷

Berhemên wî yên ku me di çavkaniyan de tespît kirine ev in:

1. 2. 1. Berhemên Wî Yê Kurdî

1. 2. 1. 1. Nehcu'l-Enâm

Ev berhem behsa mijara me ye. Em dê di beşa tehlîl û vekolîna naveroka berhema Nehcu'l-Enâmê de bi awayekî berfireh li ser bisekinin.

1. 2. 1. 2. Rîsâle fî 'ilmî't-Tecwîd

M. Edîp Çağmar li ser vê behemê maqaleyek nivîsiye û di derheqê vê berhemê de weha dibêje. "Lêbelê hetanî niha xebera tu kesî ji vê berhemê tunebû. Lewra di xebatên ku li ser Mele Xelîl hatine kirin de tu agahiyek di der heqê wê berhemê de tunebû. Ev berhem di derheqê ilmê tecwîdê de ye. Berhem menzûme û bi Kurdî ye. Bi zimanekî fesîh hema hema behsa temamê mijarên tecwîdê dike. Ji aliyê tecwîdê ve ji bo xwendekaran çiqasa agahiyên muhîm hene behsa giştikan tê de hene. Ji bo xwendekaran

⁶⁵ Adak, **b.n.**, r. 31

⁶⁶ Ahmet Kırgan, "Mela Xelîlê Sêrtî", **Kovara Nûpelda**, j. 19, 2015, r. 46.

⁶⁷ Öncü, **b.n.**, r. 25.

berhemek bi kêrhatî ye.”⁶⁸ Ev berhem ji panzdeh sahîfe û ji çil û çar beytî pêk tê. Di derheqê agahiyên îlmên tecwîdê, herwekî mexreç û sîfatên herfa, îzhâr, îxfâ û medê de hema hema di her mijarê de agahî daye. Muelîf di serê berhema xwe de dibêje ku hîmbûna tecwîdê ferz e.⁶⁹

1. 2. 2. Berhemên Wî Yên Erebi

1. 2. 2. 1. *Besîretu'l-qulûb fî kelâmî 'allâmî'l-guyûb*

Ev berhema hêja di derhqê tefsîrê de ye. Mustafa Öncü li ser vê berhema Mele Xelîl teza doktorayê amade kiriye.^{*****} Ev berhem telîfek muhîm ya muelîf e. Navê vê berhemê li gorî ifadeya nivîskar, “*Besîretu'l-qulûb fî kelâmi 'allâmi 'l-guyûb*” e. Ev tefsîr bi sûra Beqereyê destpê dike bi sûra el-Fatihayê bi dawî dibe.⁷⁰

Li gorî Mele Xelîl, Qadi Beyzawî tefsîrek gelek muhîm nivîsandiye. Lêbelê Mele Xelîl, însanên serdema xwe ji fêmkirina tefsîra Beyzawî gelek dûr dibîne. Ji ber vê yekê hinek dost û hevalên wî yên hêja ji wî rica kirine da ku ew tefsîreke ku herkes bi hêsanî bikaribe jê fêm bike binivîsîne, ew jî dibêje ku min jî bi tenê ji bo rîza Xwedê ev tefsîr nivîsî. Ev tefsîr ji tefsîra Celaleyn dirêjtir, ji ya Beyzawî kurttir e. Bi zîmanekî hêsan û zelal hatiye nivîsandin. Ev tefsîr di metoda dîrayetê de hatiye nivîsandin⁷¹

1. 2. 2. 2. *el-Qâfiyetu'l-kubrâ fî'n-nehv*

Ev berhem yek ji wan pirtûkên meşhûr ên Mele Xelîl e. Nivîskar, ev berhem ji bo xwendekarên medreseyan wekî kitêba dersê nivîsiye. Nivîskar, berhema xwe wekî nav, lêker û herfê, kiriye sê beşê serek e. Mijara vê berhemê esas û qaîdeyên rêzimana Erebi ye. Ev berhem esas û qaîdeyên rêzimana Erebi hem bi helbestkî hem jî bi pexşankî şîrove dike.⁷² Ahmed Hîlmî el-Koxî ev berhem bi nivîsa bedew ya “rîqa” 102

⁶⁸ M. Edip Çağmar, “Molla Halîl el-Si'irdî'nin “Rîsaletun fî ‘İmi't-Tecvîd”, *eş-Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi*, Kasım 2009, Cild Yok, Sayı 2, <http://www.e-sarkiyat.com> (Tarîxa Têgihîştinê: 30 Tîrmeh 2015), r. 154-161.

^{*****} Mustafa Öncü li ser vê berhema Mele Xelîl teza doktorayê amade kiriye. Ji bo agahiyên berfireh yê di derheqê vê berhema Mela Xelîl de bnr., Mustafa Öncü, “*Basîretu'l-Kulûb fî Kelâmi 'Allâmi 'l-Guyûb Adlı Eserinin Arap Dili Açısından İncelenmesi*”, (Teza bxdoktora ya Neçapkirî, Enstîtûya Zanîstê Civakî ya Zanîngeha Dicleyê, 2013); Ev berhem jî aliyê neviyê Mele Xelîl Mela Sebketullah El Zoqeydî ve bi tîpên Erebi di wêşanên Nûbiharê de derketiye. Bnr. Mela Sebketullah El Zoqeydî Ehfadê Muelîf (Amd.), “*Basîretu'l-Kulûb fî Kelâmi 'Allâmi 'l-Guyûb Adlı Eserinin Arap Dili Açısından İncelenmesi*”, Stenbol: Wêşanê Nûbiharê, 2011.

⁶⁹ Öncü, **b.n.**, r. 33.

⁷⁰ Öncü, **b.n.**, r. 27.

⁷¹ Pakiş, **b.n.**, r. 19.

⁷² Öncü, **b.n.**, r. 25.

rûpel nivîsiye û çap kiriye.⁷³ Li ser qafiyeya vê berhemê Abdulkêrim Bingöl jî teza mastirê amedekiriye.⁷⁴

1. 2. 2. 3. el-Qamûsu's-sânî fî' s-sarfî ve n-nahvî ve'l-me'ânî

Mele Xelîl, di vê berhema xwe de ji bo xwendekarek hînî zimanê Erebî be çî mijar hewceye bi tevahî tê de nivîsiye. Nivîskar, di vê pirtûka xwe de îlmên wekî serf, nehîv û meânî digel hev kom kirine. Di vê berhemê de qismên ku di derheqê serf û nehewê de hatiye nivîsîn herwekî şerha berhema “*el-Qâfiye*” ye.⁷⁵ Naveroka vê berhemê di derheqê ziman û belaxeta Erebî de ye.

1. 2. 2. 4. el-Manzumetu'z-zumrudiyye nazmu Telxîsî'l-Miftâh

Navê vê berhemê di wan xebatên ku li ser Mele Xelîl hatine kirin de derbas dibe. Bi qasî ku ji navê vê berhemê tê fêhm kirin, ev berhem ji bo ku berhema Xatîp el-Qazvînî ya bi navê “*Telxîsu'l-Miftâh fî'l-ma'ânî we'l-beyân*” a belexatê bi rehetî were jiberkirin hatiye nivîsîn. Naveroka vê berhemê di derheqê ziman û belaxeta Erebî de ye.

1. 2. 2. 5. Rîsâle fî'l-mecâz we'l-îstî'âre

Ev berhem di der heqê îlmê îstî'ârêyê de agahiyên kurtasî dide. Berhem panzdeh rûpel e. Ji sê beşên ku wekî îstî'âre-i mûsarraha, îstî'âre-i mekniyye û îstî'âre-i taxyiliyye yê pêk tê. Mirov dikare bibêje ku ev berhema Mele Xelîl di terza berhema Muhammed b. Ebûbekîr es-Semerqandî el-Leysî (K.d.888/1483) ya bi navê “*el-Feride fî'l-îst'î'âreti we'l-mecâz*” de hatiye, nivîsîn. Lewra el-Leysî berhema xeya “*el-Feride*” di sê serbeşan de amade kiriye û ji binbeşan re jî “*feride*” gotiye. Heta mirov dikare bibêje ku ev berhema Mele Xelîl, îlaweya berhema Semerqandî ya navborî ye.

1. 2. 2. 6. Besîretu'l-qulûb fî kelâmî 'allâmî'l-guyûb

Mele Xelîl, vê berhema xwe ya tefsîrê jî herwekî berhema xwe ya tefsîrê ya din wek “*Basîretu'l-qulûb fî kelâmi 'allâmi'l-guyûb*” bi nav dike. Lêbelê ev tefsîr li gorî tefsîra yekemîn berfirehtir e. Mele Xelîl, li gorî mentîqa xwe ya tefsîrê tefsîra xwe ya yekemîn bi kurtasî nivîsiye. Tiştên ku di tefsîra xwe ya yekemîn de behs nekiriye yan kêmbesîr kiriye, di vê tefsîrê de bi awayekî berfireh aniye ziman. Mele Xelîl, ev tefsîra

⁷³ Pakîş, **b.n.**, r. 22.

⁷⁴ Abdulkêrim Bingöl, “*Molla Halil es-Siirdî ve el-Kâfiyetu'l-kubrâ Adh Eseri*” (Teza Mastirê ya Neçapkirî, Enstîtûya Zanistên Civakî ya Zanîngeha Dîcleyê, 2012).

⁷⁵ Öncü, **b.n.**, r. 25; Pakîş, **b.n.**, r. 22.

xwe hetanî sura el-Kehfê nivîsiye. Di vir de nuqtêya herî girîn ev e ku muqadîmeya herdu tefsîran ji yek e.⁷⁶

1. 2. 2. 7. Kîtabun fî usûlî'l-hedîs

Ev berhem di derheqê ûsula hedîsê de ye. Navê vê berhemê yê eslî “*Usulu'l-hedîs 'lezher mîn muxteser ve şerhîhî li Îbnî Hacer*” e.⁷⁷ Ji navê pirtûkê jî tê fêmkirin ku ev berhem wek berhema Îbn Hacer ya bi navê “*Nuhbetu'l-fîker fî mustelahi ehli'l-esere*”⁷⁸ hatiye nivîsîn.

1. 2. 2. 8. Zubdetu mâ fî Fetâwa'l-hedîs

Navê vê berhemê yê tam “*Zubdetu mâ fî Fetâwe'l-hedis fî'l-ecwibe we'l-i'tinâ bi nahwi'l-fadliwe't-tafdil we umûrin leyse li ahadin 'anha xinâ*” ye. Di hinek xebatên ku li ser nivîskar hatine kirin de navê vê berhemê derbas dibe.⁷⁹ Lê di encama ku lêgerîn û lêkolîna me ya li ser vê berhemê de em negihîştin wê. Mirov ji navê berhemê û ji metoda tefsîra Mele Xelîl hereket bike, mirov dikare bibêje ku ev berhem muxtesara berhema Îbn Hacer el-Heytemî (k.d. 974/1567) ya binavê “*el-Fetawa'l-hedîsiyye*” ye.⁸⁰

1. 2. 2. 9. Tebeqâtu'r-rîcâl

Xebatên ku vên dawiyê li ser Mele Xelîl hatine kirin de navê vê berhemê derbas dibe. Lê ev berhem li pirtûkxaneyên fermî û şexsî de mewcûd nîne.⁸¹

1. 2. 2. 10. Mînhâcu'l-wusûl îlâ îlmî'l-usûl

Di xebatên ku li ser Mele Xelîl hatine kirin de ev berhem bi navê “*Kitâb fî usûli fîqhi'ş-Şafi'î*” derbas dibe.⁸² Lê li gorî gotina muelîf navê berhemê “*Minhâcu'l-wusûl îlâ îlmî'l-usûl*” e. Ev berhema Mele Xelîl di derheqê usûla îlmê fîqhê de ye. Ev berhem ji hêla sîstematîk û naveroka xwe ve dişibe berhema Ibnu's-Subkî (k.d. 771/1369) ya bi navê “*Cem'u'l-cewâmî*”. Ev berhema “*Cem'u'l-cewâmî*” li medreseyan beriya îcazetgirtina xwendekaran tê xwendinê. Ev berhem di derheqê usûla fîqha mezheba

⁷⁶ Öncü, b.n., r. 26,27; Pakiş, b.n., r. 22.

⁷⁷ Öncü, b.n., r. 26,27.

⁷⁸ Öncü, b.n., r. 26,28.

⁷⁹ Pakiş, b.n., r. 36; Adnan Memduhoğlu, “Molla Halil es-Siirdî ve Usûlü'l-Fıkh Adlı Elyazma Eseri”, *Uluslararası Siirt Sempozyumu*, Birleşik Matbaa, İzmir 2007, r. 307.

⁸⁰ Öncü, b.n., r. 28.

⁸¹ Öncü, b.n., r. 26,28.

⁸² Pakiş, b.n., r. 24.

şafî'î de ye. Berhem ji piştî besmelê bi mûqadimeyekê dest pê dike û ji mijarên herwekî, usûla fîqhê, kîtap, sunnet, îcma, qiyâs, îçtîhat, teqlît û ji usûla fetvayê pêk tê.⁸³

1. 2. 2. 11. Rîsâlê sexîre fi'l-me'fuwwât

Ev berhema nivîskar bi navê “usulû'l-fiqih” tê zanîn. Ev berhema Mele Xelîl ji xwendekarên medreseyan zêdetir xîtaba xelqê dike. Bi armanca çareserkirina pirgirêkên xelqê yên rojane hatiye nivîsîn. Mele Xelîl, di derheqê armanca nivîsandina vê berhemê de weha dibêje, di derheqê necasetê de hinek alim zêde titîz in, hinek jî nînin. Lewma min ev berhem telîf kiriye.⁸⁴ Ji ber ku ev berhema Mele Xelîl gelek muhîm e. Gelek şerh li ser hatine nivîsîn. Ji van şerhan yek ya Mela Huseyîn el-Cezerî ya bi navê “*Fethu'l-celîl bi şerhi Ma'fuwwâtî mewlana el-Molla Xelîl*” e. Ya din şerha Mela Abdullah b. Mirza en-Nursî ya bi navê “*Şerhu'l-Ma'fuwwât*” e. Ya din şerha Şêx Suleyman el-Xâlîdî es-Siirdî ya bi navê “*Hallu'l-muşkilât şerhu mesâilî'l-Ma'fuwwât*” e.⁸⁵

1. 2. 2. 12. Te'sisu qewâidî'l-eqâid ‘âlâ mâ senehe mîn ehîl’z-zâhir we’l-bâtin mîne’l-qewâid

Ev berhema Mele Xelîl di warê îlmê kelimê de xebatek gelek girîng e. Ev berhem ji nod û pênc rûpelan pêk tê. Muelîf, bi dayîna agahiyên ji derheqê ekolên kelimê ve dest bi pirtûka xwe dike. Piştî di îlmê kelimê de delîlên herwekî “delîlên hûdus” behsa hebûna Xwedê dike. Di beşa yekemin de jî behsa mijarên wekî, âyân, arâz û îlmê dike.⁸⁶ Di gel vê behsa sebeba derketina 73 firqeyan dike. Bi awayekî berfireh wan firqeyan tesnîf dike û behsa cudahiya ku di nav nêrînên wan de heye dike.⁸⁷ Di van demên dawî de herwekî berhemên Mele Xelîl yên din, li ser berhemên wî yên îlmê kelimê û yên fîkhê jî xebatên akademîk hatine kirin.⁸⁸ Li ser vê berhema Mele Xelîl, Faruk Kazan jî teza mastirê amade kiriye. *****

⁸³ Öncü, **b.n.**, r. 28, 29.

⁸⁴ Öncü, **b.n.**, r. 29.

⁸⁵ Abdulkirim Ünal, “Molla Halil es-Siirdî'nin Fıkhi Yönü”, **Uluslararası Siirt Sempozyumu**, Birleşik Matbaa, İzmir 2007, r. 367.

⁸⁶ Öncü, **b.n.**, r. 29,30.

⁸⁷ Metin Bozan, “Şeyh Cüneyd ez-Zokaydî ve 73 Fırka'ya Dair Haşiyesi”, e-Şarkiyat İlmî Araştırmalar Dergisi, Kasım 2012, Cild yok, Sayı VIII, <http://www.e-sarkiyat.com>, (Tarîxa Têgihîştinê 30 Tirmeh 2015), , r. 3,16.

⁸⁸ Ji bo fikren Mele Xelîl yên ku di derheqê “kelamê” de, bnr., İbrahim Coşkun “Molla Halil es-Siirdî'nin Kelâmî Görüşleri”, **Uluslararası Siirt Sempozyumu**, Birleşik Matbaa, İzmir 2007, r. 429, 437; Mehmet Yalar “es-Siirdî'ye Ait Nehcu'l-enâm Adlı Eserin Biçim ve İçerik Yönünden Tahlili”, **Uluslararası Siirt**

1. 2. 2. 13. Nehcu'l-enâm fî'l-eqâid

Berhemên Mele Xelîl yên ku navê wan “*Nehcu'l-enâm fî'l-aqâid*” e, du heb in. Ev berhem, Erebiya berhema Nehcu'l-Enâma ku bi Kurdî ye.⁸⁹

1. 2. 2. 14. Muxtesaru şerhî's-sudûr fî şerhî'l-mewtî ve ehwâlî'l-qubûr

Di çavkaniyan de ji vê berhema nivîskar tê behskirin.⁹⁰ Herwekî ji navê berhemê jî tê fêmkirin, mirov dikare bibêje ku ev berhema Mele Xelîl mûxtasara berhema es Suyûtî ya bi navê “*Şerhu's-sudûr fî şerhi'l-mewtî ve ehwâlî'l-qubûr*” e.⁹¹

1. 2. 2. 15. Mulahhasu'l-qewâtî' we'z-zewâcîr fî mâ tekellemû 'ala's-seğâir we'l-kebâir

Xebatên ku di derheqê nivîskar de hatine kirin de behsa berhemeke weha tê kirin.⁹² Lê nusxeyên wê peyda nîne. Bi qasî ku ji navê wê tê fêmkirin, ev berhem di derheqê gunehan de ye. Gava ku padîşahê Osmanî Esad Paşa ji bo surgûna Bedirxan Beg hatiye heremê. Di derheqê ilmê kelimê de pirsan ji Mele Xelîl dike û Mele Xelîl jî bersîva wî dide. Ev berhem, ji wan pirs û bersîvan pêk tê⁹³

1. 2. 2. 16. Mînhâcu's-sunnetî's-seniyye fî âdâbî sulûkî's-sûfiyye

Di nav berhemên Mele Xelîl yên tesewûfî de berhema herî berfirehtir e. Berhem menzûm e û nêzikî hezar beytî ye. Mele Xelîl, li vir ji bo jiyana sofîyan pêwîstiya rîayeta rêya sunetê nîşan dide. Nivîskar di vê berhema xwe de mijarên herwekî, rîayeta sunetê, jiyana zuhdê, tewekul, çikosî, kibr, hesûdî û hwd. tîne ziman. Berhem di sala 1340/1921an de ji aliyê Seyyid Muhammed el-Findikî ve hatiye îstînsâx kirin.⁹⁴

Sempozyumu, Birleşik Matbaa, İzmir 2007, r. 415,429.

***** Faruk Kazan li ser vê berhema Mele Xelîl teza mastirê amade kiriye. Ji bo agahiyên berfireh, bnr., Faruk Kazan, “*Mollâ Halîl'in Bilgi ve Varlık Anlayışı (Tesisu'l kavâid Çerçevesinde)*” (Teza Mastirê ya Neçapkirî, Enstîtûya Zanistê Civakî ya Zanîngeha Dicleyê, 2013); Ev berhema hêja ji aliye D. Vechî Sonmaz ve bi tîpên Erebi hatiye amadekirin û di wêşanên Nûbiharê de derketiye. Ji bo agahiyên ferfireh bnr. D. Vechî Sonmaz, **Te'sisu kavâidî'l-akâid 'alâ mâ senehe min ehli'z-zâhir ve'l-bâtın mine'l-qavâid**, Stenbol: Wêşanê Nûbiharê, 2013.

⁸⁹ Kazan, **b.n.**, r.22; Öncü, **b.n.**, r. 30.

⁹⁰ Öncü, **b.n.**, r. 30.

⁹¹ Öncü, **b.n.**, r. 31.

⁹² Pakiş, **b.n.**, r. 30; Coşkun, **m.n.**, r. 432; Öncü, **b.n.**, r. 31.

⁹³ Öncü, **b.n.**, r. 31.

⁹⁴ Öncü, **b.n.**, r. 31; Kazan, **b.n.**, r.22.

1. 2. 2. 17. Nebzetu mewâhîbî'l-ledunniyye fî'ş-şetahâtî we'l-wehdetî'z-zâtiyye

Navê berhemê di hinek çavkaniyan de wekî ‘*Nebzetun mîne'l-mewâhîbî'l-medeniyye*’ derbas dibe.⁹⁵ Ev berhem di destên me nîne. Bi qasî ku em ji navê berhemê fêhmî dikin berhem, di derheqê ‘‘şetehatan’’ de ye.⁹⁶

1. 2. 2. 18. Rîsâle fî menâqibî Şêx Ahmed

Mele Xelîl di warê îlmê tesewûfê de jî xwediyê payeyek bilind e. Wî îcazeta tesewûfê ji Şêx Ehmed Reşîdî sitendiye. Mele Xelîl ev berhema xwe di derheqê menqîbeyên Şêx Ehmed Reşîdî de nivîsiye. Berhem bi helbestkî ye û ji çar qesîdeyan pêk tê. Abdurrehman Adak li ser van qesîdeyan maqaleyek nivîsiye.⁹⁷

1. 2. 2. 19. Diyâu'l-qelbî'l-arûfî fî't-tewwîd we'r-resmî we fersî'l-xurûf

Herwekî ji navê berhemê jî tê fêmkirin, Mele Xelîl ev berhema xwe di derheqê tecwîd û tesxîxî-hûruf de nivîsandiye.⁹⁸ Ev berhem menzûm e û ji pênsed beytan pêk tê.⁹⁹ Ömer Atalay di berhema xwe ya bi navê ‘‘Dîroka Sêrtê’’ de dibêje ku ev berhem ji pênsed heb beytan pêk tê.¹⁰⁰

1. 2. 2. 20. Şerhu manzûmetî'ş-Şâtîbî fî't-tecwîd

Mele Xelîl, di derheqê îlmê tecwîdê de çend heb pirtûk nivîsandiye. Ev berhema muelfîf şerha berhema Muhammed b. Fîre eş-Şâtîbî (k.d. 590/1193) ya bi navê ‘‘*Hirzu'l-emânî*’’ ye.¹⁰¹ Mele Xelîl, bi besmelê û bi hemdê dest bi berhema xwe dike û bi hemdê jî xelas dike. Neviyê Mele Xelîl Şêx Fûdeyl dibêje ku min ev nusxe di sala 1396/1976an de ji nusxa kalikê xwe yê Mele Evdîlqehar hilgirtiye.¹⁰²

1. 2. 2. 21. Şerhu Qesîdetî'l-hemziyye

Em hebûna vê berhema Mele Xelîl ji xebatên ku li ser wî hatine kirin hîn dibin.¹⁰³ Ji navê wê jî tê fêmkirin ku ev berhem şerha berhema Şerefuddîn Muhammed

⁹⁵ Öncü, **b.n.**, r. 32.

⁹⁶ Öncü, **b.n.**, r. 32; Kazan, **b.n.**, r. 24.

⁹⁷ Adak, **m.n.**, 145-157.

⁹⁸ Öncü, **b.n.**, r. 33.

⁹⁹ Pakiş, **b.n.**, r. 21; Öncü, **b.n.**, r. 33; Pakiş, **b.n.**, r. 405.

¹⁰⁰ Pakiş, **b.n.**, r. 21; Öncü, **b.n.**, r. 33.

¹⁰¹ Öncü, **b.n.**, r. 33; Pakiş, **b.n.**, r. 33,34.

¹⁰² Kazan, **b.n.**, r. 25.

¹⁰³ Öncü, **b.n.**, r. 34.

el-Busirî (k.d.695/1296) ya ku di der heqê Hz. Peyxamber (s.x.l) hatiye, nivîsîn e. Her rista vê berhemê bi hemzê diqede navê wê yê tam “*Qasîdetu’l- hemziyye fî medhi’n- nebewiyye*” ye.¹⁰⁴

1. 2. 2. 22. Kîtabu ezhârî’l-ğusûn mîn mekûlât-î erbâbî’l-funûn we mâ lî’t- tâlîbîne fihî qerru’l-‘uyûn

Ev berhem di çavkaniyan de wekî berhema Mele Xelîl tê zikirkirin.¹⁰⁵ Lê di derheqê wê de tu agahî nîne. Di hinek xebatên li ser Mele Xelîl de navê vê berhemê wekî “*Kîtabu ezhârî’l-ğusûn mîn makûlâtî erbâbî’l-funûn*” derbas dibe.¹⁰⁶

1. 2. 2. 23. Mehsûlu’l-mewâhîbî’l-ehadiyye fî’l-xesâisî we’s-şemâilî’l- Ahmediyye

Ev berhema Mele Xelîl behsa şemaîla Hz. Peyxamber (s.x.l) dike. Ji heftê û çar beşan û ji sed û şêst wereqan pêk tê. Ji aliyê neviyê muelîf Mela Evdîlqehar ve di sala 1300/1883yan de hatiye îstînsax kirin. Mele Xelîl, di serê berhema xwe de behsa wacib, heram û mubahên di derheqê xusûsiyeta Hz. Peyxamber de ye dike. Di beşa yekemin de behsa şehkirina porê Peyxemberê Xweda dike.¹⁰⁷ Di beşa dawiyê de jî behsa kesayetiya peyxemberan dike.¹⁰⁸ Muelîf berhema xwe bi dua û hemdê Xwedê diqedîne.¹⁰⁹

1. 2. 2. 24. Manzûme fî mewlîdî’n-nebî

Bi qasî ku ji navê wê jî tê fêmkirin berhemek menzûm e û mijara wê jî weladeta Hz. Peyxember e. Ji heştê û pênc weraqan pêk tê. Ji hêla neviyê Mele Xelîl, Mele Evdîlqehar ve di sala 1285/1878an de hatiye îstînsax kirin.¹¹⁰

1. 2. 2. 25. Rîsâle fî ‘ilmî’l-mantiq

Mele Xelîl, ev berhema xwe di derheqê ilmê mentiqê de, di terza destpêka mentiqê de nivîsiye. Ev berhem di modela berhema Esîruddîn el-Ebherî (k.d. 663/1265) ya bi navê “*Îsaguci*” de hatiye nivîsin. Ferqa Mele Xelîl ya ji el-Ebherî, Mele Xelîl di

¹⁰⁴ Pakiş, **b.n.**, r. 33.

¹⁰⁵ Öncü, **b.n.**, r. 34.

¹⁰⁶ Pakiş, **b.n.**, r.33; Öncü, **b.n.**, r. 34.

¹⁰⁷ Öncü, **b.n.**, r. 35.

¹⁰⁸ Kazan, **b.n.**, r.27; Öncü, **b.n.**, r. 35.

¹⁰⁹ Öncü, **b.n.**, r. 35.

¹¹⁰ Öncü, **b.n.**, r. 35.

serê berhema xwe de despêkek nivîsiye, di vê destpêkê de bi gelemperî behsa şertên pênaseyê bi taybet jî behsa pênaseya mentiqê kiriye.¹¹¹ Li ser vê berhemê xebat hatine kirin.¹¹²

1. 2. 2. 26. Rîsâle fî'l-wa'd

Mele Xelîl, vê rîsala xwe jî herwekî gelek berhemên xwe yên din ji bo di medreseyan de were xwendin, nivîsiye. Navê vê berhemê yên temam wekî, “*er-Rîsâletu'l-'adûdiyye bi mâ yûdîhu mînha'l-merâm bî'l-kulliye*” ye.¹¹³ Mele Xelîl, di vê berhema xwe de pênaseya we'dê dike. Pişt re bi lefzên gelek wecîz behsa mijarên qismên îlmên we'dê dike.¹¹⁴

1. 2. 2. 27. el-Habiyye fî îlmî âdâbî'l-behsî we'l-munâzara

Di kevneşopiya perwerdehiya medreseyan de di nav îlmên wekî rêzê dihatin xwendin de îlmê munazarayê ji hebû. Li hinek medresyên Kurdîsdanê di warê munazarayê de berhemên alimên herwekî, Saçaklizâde Muhammed el-Maraşî el-Hanefî (k.d. 1145/1732) pirtûka wî ya bi navê “*Welediyye*” û şerha Abdulvehhab b. Huseyn (kd. 1190/1776) ya bi navê “*Şerhu Welediyye li Saçaklizâde*” dihatin xwendin. Li hinek medreseyan jî berhema Mele Xelîl ya bi navê “*el-Habiyye*” dihate xwendin.¹¹⁵ Ev berhema Mele Xelîl ji aliyê Zeynelabidin Âmedî ve jî hatiye çapkirin.¹¹⁶

Em bawer dikin, ku ji bilî van berhemên Mele Xelîl yên ku me li jorîn navên wan daye yên ku em navên wan nizanin jî hene. Li ser Mele Xelîl û berhemên wî di van salên dawiyên de her ku diçe xebatên zanistî hedî hedî zêde dibin. Di her lêkolîn û lêgerîna ku li ser Mele Xelîl û berhemên wî tê kirin de berhemên wî yên nû derdikevên holê. Bi qasî ku em dizanin gelek berhemên wî nehatine çapkirin û hinek jî ji wan hê jî destnivîs in. Ji ber vê yekê divê ku hîn bêhtir xebatên zanistî li ser werin kirin.

Ji bo xwendevan û lêkolîneran em listeya navên berhemên Mele Xelîl bidin dê baştir bibe.

¹¹¹ Kazan, **b.n.**, r.27; Öncü, **b.n.**, r. 35.

¹¹² Öncü, **b.n.**, r. 35,36.

¹¹³ Öncü, **b.n.**, r. 36.

¹¹⁴ Pakiş, **b.n.**, r. 32; Pakiş, **b.n.**, r. 410; Kazan, **b.n.**, r. 28

¹¹⁵ Çağmar, **b.n.**, r. 699.

¹¹⁶ Pakiş, **b.n.**, r. 33; Kazan, **b.n.**, r.28.

1. *el-Qâfiyetu 'l-kubrâ fî 'n-nahv (Di derheqê zimanê Erebi û belaxatê de ye)*
2. *el-Qamûsu 's-sânî fî 's-serfî ve n-nahvî' ve 'l-me'ânî (Di derheqê zimanê Erebi û belaxatê de ye)*
3. *el-Manzumetu 'z-zumrudiyye nazmu Telxîsi 'l-Miftâh (Di derheqê zimanê Erebi û belaxatê de ye)*
4. *Rîsâle fî 'l-mecâz we 'l-îstî'âre (Di derheqê zimanê Erebi û belaxatê de ye)*
5. *Basîretu 'l-qulûb fî kelâmî 'allâmî 'l-ğuyûb (Tefsîr e, jî sura Beqere dest pê dike bi sura Fatihayê ve bi dawî dibe.)*
6. *Basîretu 'l-qulûb fî kelâmî 'allâmî 'l-ğuyûb (Tefsîr e, hetanî sura Qehf hatiye nivîsandin.)*
7. *Kîtabun fî usulî 'l-hedîs (Di derheqê hedîsê de ye.)*
8. *Zubdetu mâ fî Fetâva 'l- hedîs (Di derheqê hedîsê de ye.)*
9. *Tabakatu 'r-rcîâl (Di derheqê hedîsê de ye.)*
10. *Mînhâcu 'l-wusûl îlâ îlmî 'l-usûl (Di derheqê fîqhê de ye.)*
11. *Rîsâle sağîre fî 'l-ma 'fuwwât (Di derheqê fîqhê de ye.)*
12. *Te'sisu qevâidi 'l-eqâid 'âlâ mâ senehe min ehli 'z-zâhir we 'l-bâtin (Mijara wê eqâid e.)*
13. *Mine 'l- 'awâid (Di derheqê kelamê de ye.)*
14. *Nehcu 'l-enâm fî 'l-eqâid (Bi Kurdî ye û di derheqê kelam û eqâidê de ye.)*
15. *Nehcu 'l-enâm fî 'l-eqâid (Bi Erebi ye û di derheqê kelam û eqâidê de ye.)*
16. *Muhtasaru şerhi 's-sudûr fî şerhi 'l-mevti we ehvâlî 'l-qubûr (Di derheqê kelamê de ye.)*
17. *Mulahhasu 'l-qewâtî' ve 'z-zewâcir fî mâ tekellemû 'ala 's-seğâir we 'l-kebâir (Di derheqê tesewûfê de ye.)*
18. *Minhâcu 's-sunnetî 's-seniyye fî âdâbî sulûkî 's-sûfiyye (Di derheqê kelamê de ye.)*
19. *Nebzetu mevâhîbî 'l-ledunniyye fî 'ş-şatahâtî we 'l-wahdetî 'z-zâtîyye (Di derheqê tesewûfê de ye.)*
20. *Rîsâle fî menâqibî Şêx Ahmed (Di derheqê tesewûfê de ye.)*
21. *Diyâu 'l- qelbî 'l-arûfî fî 't-tecwîd ve 'r-resmî ve ferşî 'l-xurûf (Di derheqê tecwîdê de ye.)*
22. *Şerhu manzûmetî 'ş-Şâtibî fî 't-tecwîd (Di derheqê tecwîdê de ye.)*

23. *Rîsâlê fî ilmi't-tecwîd (Bi Kurdî ye û di derheqê tecwîdê de ye.)*
24. *Şerhu Qasdetî'l-hemziyye*
25. *Kîtabu ezhârî'l-xusûn mîn maqûlât-i erbâbî'l-funûn ve mâ lî't-tâlibîne fîhi qarru'l-'uyûn*
26. *Mahsûlu'l-mewâhibî'l-ahadiyye fî'l-hasâisî we's-şemâilî'l-Ahmediyye*
27. *Manzûme fî mewlidi'n-nebi*
28. *Rîsâle fî ilmî'l-mantiq*
29. *Rîsâle fî'l-wa'd*
30. *el-Habiyye fî ilmî âdâbî'l-bahsî we'l-munâzara*

Ev berhemên ku me zikîr kiriye qismekî ji wan di pirtûkxaneyên fermî û şexsî de mewcûd in. Qismekî wan destxet in, qismekî wan çap bûne. Qismekî wan çap nebûne. Qismekî wan di çavkaniyan de hatine tespîtîkirin. Lê yên destxet nehatine tespîtîkirin.¹¹⁷

Ji bilî van berhemanan, berhemên wekî;

1. *Luğat ve nahiv müellifleri*
2. *Divân*
3. *Usûlu Muğni'l-lebîb*
4. *Kürtlerde talak meseleleri*
5. *Munâcât*
6. *Kendisine nasihat içeren eser*
7. *Risâle fî'l-wa'zi we'l-îrşâd*
8. *Rîsâle fî eqîdetî cevheretî'l-Îslâm*
9. *Manzûme tehdî't-tâlib îla't-tarîqî we's-sewap*
10. *Besmele-i şerîfe tefsiri*

Ev berhemên han jî di çavkaniyan de herwekî berhemên Mele Xelîl derbas dibin.¹¹⁸

¹¹⁷ Öncü, **b.n.**, r. 37.

¹¹⁸ Kazan, **b.n.**, r. 29-33; Öncü, **b.n.**, r. 37.

1. 3. KESAYETIYA WÎ YA EDEBÎ

Herwekî ku me di mijara jiyana Mele Xelîl de jî aniye zimên Mele Xelîl, di gelek medreseyan Kurdistanê de xwendiyê û ji gelek aliman ders girtiye. Îlmekî baş bidest xistiye. Gelek alim li ber deste wî mezin bûne û li dû xwe gelek berhem hiştine. Li Kurdîstanê û li Anatoliyayê sîlsileya dayîna îcazetê bi her awayî digihêje wî. Di gelek warê îlmê de pîspor bû û gelek warê îlmê de berhemên giranbiha nivîsiye. Jixwe gelek berhemên wî jî li medreseyan Kurdistan wekî pirtûkên dersê tên xwendin. Berhema wî ya Nehcu'l-Enâm di medreseyan de ji aliyê feqeyan ve tê jiberkirin û bi wezinkî tê dubarekirin. Berhemên wî bi piraniya xwe bi Erebî ne. Jê hinek jî bi Kurdî ne. Berhemên wî hinek pexşa nin, hinek jî mewzûn in. “Di edebiyata Kurdî yê ku herî zêde berhemên mewzûn nivîsiye ew bi xwe ye.”¹¹⁹ Mele Xelîl, ji hêla îlmê tesewûfê ve jî gelek giring e. Xelîfeyê Mewlana Xalidê Şehrezori (Bexdadî) bû. Ji hêla zimên ve di berhema xwe ya mijara me de herwekî Feqiyê Teyran zimanekî xwerû û zelal bi kar aniye. Ji berhemên wî tê fêmkirin ku Mele Xelîl zimanê Erebî û Farisî jî gelek baş zanibûye. Ji zimanê Tirkî jî agahdar bûye. Lewra di berhema Nehcu'l-Enâmê de hindik be jî em li unsûrên Tirkî jî rast tên.

1. 3. 1. Perwerdehiya Wî

Mele Xelîl di medreseyan Kurdistanê de bi tenê ji seydayekî ders negirtiye. Wî biçûktiya xwe de li gelek medreseyan û li bal gelek aliman ders girtiye. Seydayê wî yê yekemin bavê wî Melâ Huseyin b. Melâ Xalid el- Kolâtî bixwe ye.¹²⁰ Dû re bavê wî, wî dibe teslîmî seydayê xwe sofî Huseyîn Qarasawî dike. Temiya lawê xwe li seydayê xwe dike. Jê rica dike ku li kurê wî miqate be. Mele Xelîl li bal wî Qurana Pîroz û tecwîdê hîm dibe. Dû re bavê wî, wî dibe cem Îbrahîm Heqiyê Erziromî û ji bo lawê xwe dua jê dixweze. Îbrahîm Heqî jî jê re dua kiriye û weha gotiye; Xwedê emrekî dirêj, îlmekî zêde û emlekî salih bide te.¹²¹

Piştî ew digel bavê xwe diçe Hîzanê û bavê wî, wî datîne ba Mela Evdirehmanê Belakî li cem wî kitêba di îlmê Fiqhê mezheba şafî de ye, pirtûka şerîetê ya bi navê “*el-Enwârê*” û dîwana Hafîzê Şîrazî bi dersikî diqedîne.¹²² Piştî ew diçe

¹¹⁹ Şemrexî, **b.n.**, r. 7.

¹²⁰ Öncü, **b.n.**, r. 21; Pakiş, **b.n.**, r. 7; Kazan, **b.n.**, r. 2; Şemrexî, **b.n.**, r. 5.

¹²¹ Pakiş, **b.n.**, r. 7; Kazan, **b.n.**, r. 3; Öncü, **b.n.**, r. 21.

¹²² Kazan, **b.n.**, r. 2; Şemrexî, **b.n.**, r. 5; Öncü, **b.n.**, r. 21; Pakiş, **b.n.**, r. 7.

Bedlîsê li ba Mela Remezanê Xirîtî dersên serf û nehwê dixwîne. Ji wir jî diçe Tiloyê ba Mela Ehmedê Hafîz û darsa xwe li wir didomî ne. Ji wir jî diçe gundê Helenzêyê yê li ser navçeya Tiloyê ba Mela Mehmûd, li cem wî jî kitêba Mesabîhê dixweyne, ji wir jî diçe Westanê (Gewaşê), ji wir jî diçe Miksê ba Mela Muhemedê kurê Mela Ehmedê Kevnasî li cem wî Şerhul Muxnî û Husamqatî û dersên qiraetê dixweyne, li Hîzanê li cem Mela ‘Ebdulhadiyê Arwasî kitaba Muqedîmeyê û Mantiqê hemî dixweyne, li Xoşabê li ba Mela Huseynê Xoşabî darsa kitêba Şerhul Şemsiyeyê û haşiyeyên wê dixweyne, li Cizîra Botan ji Şêx Feruh Şerhu Eqîdetunnesefî û haşiyeyên wê dixweyne, li Xoşabê ji seydayên mîna Mela Hesenê Bizînî, Mela Evdiselam û Mela Isma’îl darsa Muxteserul Me’anî dixweyne.¹²³ Herî dawî li Kurdistana Başur çûye bajarê Îmadiyeyê û li medreseya miftiyê Îmadiyeyê ya Mela Mahmûdê Behdînî ku wekî “Medreseya Qubehanê” tê naskirin, maye. Zanayê navdar Mela Yehyayê Mizûrî (k.d.1836) jî li Medresa Qubehanê digel Mele Xelîl bûye. Mele Yehyayê ku ji kesekî ders nedistend tenê ji Mela Xelîl ders stendiye. Mela Xelîl li cem Mela Mehmûdê Behdînî kitêbên hekîmî, “Minhacu’l-usûl” xwendiyê û piştî ku sê salan li wir maye ji wî icazet stendiye.¹²⁴ Di mecmûeya ku şîrên Mela Xelîl tê da ne, notek wisa heye “fî Medresetî Qubehan, senete 1192” me’neya vê ew e ku ev xet, di Medreseya Qubehanê de di sala 1778an de hatiye nivîsandin. Naxwe li gorî vê notê temenê Mela Xelîl kê-m-zêde sih sal derdikeve. Îcar li gorî ku Mela Xelîl di dawiya perwerdehiya xwe de çûye vê medreseyê û li wir nêzîkî du-sê salan maye, mirov dikare bêje ku di navbera 28 saliya xwe de heta 31 saliya xwe li wir maye. Ji vê derdikeve holê ku Mela Xelîl herî dawî 1781an di 31 saliya xwe de icazeya ilmî sitendiye.¹²⁵ Mela Xelîlê Sêrtî, sofî Huseyîn Xurseywî, Evdirehman Ensarî, Îbrahîm Heqî Erziromî, Mela Mahmûd, Mela Evdilhadî Erwasî, Mela Huseyîn Xoşabî bi hewra ders xwedine.¹²⁶

1. 3. 2. Dersdayîna Wî

Piştî ku Mela Xelîl icazeya xwe ya melatîyê ji destê Mela Mehmûdê Behdînî wergirtiye, êdî çûyê gundê Mûsilê yê Reşîdiyê û li wir intisabê Şêx Ehmed Reşîdî yê Qadirî kiriye.¹²⁷

¹²³ Şemrexî, **b.n.**, r. 5.

¹²⁴ Adak, **b.n.**, r. 31; Şemrexî, **b.n.**, r. 5.

¹²⁵ Şemrexî, **b.n.**, r. 6.

¹²⁶ Öncü, **b.n.**, r. 21.

¹²⁷ Şemrexî, **b.n.**, r. 5; Öncü, **b.n.**, r. 22; Adak, **b.n.**, r. 32.

Piştire ew wegeriyaye Hîzanê û li wir ji pênc salan bêhtir li Medreseya Meydanê seydatî kiriye.¹²⁸ Paşê li ser daxwaza bavê xwe çûye navenda Sêrtê bi cih bûye. Li wêrê li Medresaya Fexriye bi dayina dersan, perwerdekirina feqîyan û telîfkirina berhemên ilmî temenê xwe bihorandiye.¹²⁹ Naxwe li gor van agahiyan mirov dikare bêje ku piştî 1781ê herî kêrî 5 sal li Hîzanê ders daye û di 1786î de ji wir çûye Sêrtê. Yanê herî kêrî di temenê xwe yê 36 salî de çûye Sêrtê û heta wêfata xwe (k.d.1843) 56 sal li Sêrtê jiyaye”.¹³⁰

Di vî warî de Mele Xelîl metoda Peyxemberê me meşandiye. Di serî de zarokên xwe perwerde kiriye. Di encamê de zarokên wî hema hema tev bûne alim. Yê bala me dikişîne Mela Mistefa, Mela Evdilah û Mela Mahmûd e. Mela Mistefa kurê Mele Xelîl yê herî mezin e. Mela Evdilah kalikê Mela Fethulahê ku dursa Bedîuzeman Seîdê Kurdî dayî ye. Yê wesfa “Bedîuzam” daye Saîdê Nursî jî ew bi xwe ye.¹³¹ Mela Mahmûd kurê Mele Xelîl ê herî biçûk e. Di nav wan de Mela Mistefa bûye alimekî mezin.¹³² Mela Mistefa li Cizîrê di serdema mîrê Cizîrê Mîr Bedirxan de li qesra wî bûye Şêxu’l-Îslamê wî.¹³³

Ji bilî van, feqiyên ku ji Mele Xelîl îcazet wergirtine ev in: Melâ Muhammed b. Melâ Arab es-Si’irdî, Melâ Ali el-Helenzi, Melâ Mustafa el-Helenzi, Şêx Hamid el-Tillohi, Şêx Hasan el-Tillohi, Melâ Ahmet el-Hazrini, Melâ Xalid el-Salihi, Melâ Zade el-Eruhi, Melâ Hamid el-Nivili, Melâ Bekir el-Sahri, Şêx Abdulhakim el-Arwasi, Melâ Hasan (Muftiyê Mûşê), Melâ Omer bin Melâ Abdullah¹³⁴ Li medreseyên Kurdîstanê îro jî gelek sîlsîleya zincîra îcazetê digîhêje Mele Xelîl. Ji van tê xuyan ku Mele Xelîl, seydayê bi hezaran xwendekaran e.

1. 3. 3. Bandora Wî ya Îlmî

Li medreseyan herwekî berhema Nehcu’l-Enamê gelek berhemên Mele Xelîl bi derskî tên xwendin. Mele Xelîl hem bi kesayetîya xwe hem jî bi saya berhemên xwe di warê ilme de gelek xizmet kiriye. Herwekî ku emê li jêr jî behsa wan bikin, bi saya Mele Xelîl gelek feqe û seyda gihiştine.

¹²⁸ Kazan, **b.n.**, r. 3; Şemrexî, **b.n.**, r. 5; Öncü, **b.n.**, r. 22; Pakiş, **b.n.**, r. 9.

¹²⁹ Öncü, **b.n.**, r. 22; Şemrexî, **b.n.**, r. 5.

¹³⁰ Şemrexî, **b.n.**, r. 5.

¹³¹ Kazan, **b.n.**, r. 3; Şemrexî, **b.n.**, r. 5.

¹³² Kazan, **b.n.**, r. 9; Öncü, **b.n.**, r.23.

¹³³ Kazan, **b.n.**, r. 9; Öncü, **b.n.**, r.23.

¹³⁴ Kazan, **b.n.**, r. 9; Öncü, **b.n.**, r.23.

Me di vê xebata xwe de edîbên ku li ser Mele Xelîl tesir kirine tespît kiriye. Ji wan edîban tesîra Ehmedê Xanî gelek gelek zêde û aşîkar e. Herwekî tesîra Ehmedê Xanî ya li ser Mele Xelîl, gelo tesîra Mele Xelîl jî li ser kîjan edîbî zêde çê bûye? Li gorî lêgerîn û lêkolînên me kiriye, me bi vî şiklî tu agahî bi dest nexist. Lê mirov dikare bibêje ku bi awayekî gelemperî Mele Xelîl tesîrek mezin li ser ehlê medresê kiriye.

1. 3. 4. Seyda û Feqeyên Wî

Li gorî lêgerîn û vekolînên me Mele Xelîl jî van seydayên han ders hildaye: Sofî Huseyin el-Karasevî, Mela Ebdûrehman el-Balekî, Mela Remezan el-Hazvinî, Îbrahîm Heqî Erziromî, Mela Ehmed el-Hafiz, Mela Mahmûd el-Helenzî, Mela Mûhamed b. Mela Ehmed el-Kevnâsî, Mela Evdîlhadî el-Arvasî, Mela Huseyin el-Hoşabî, Şêx Ferrûh, Mela Hesên el-Bizenî, Mela Evdiselam, Mela Îsmâîl el-Kisinî, Mela Yahya el-Mûzûrî, Mela Mahmûd el-Behdînî û Şêx Ehmed er-Reşîdî cîh digrin.¹³⁵

Kesên ku jî Mele Xelîl îcazet wergirtine hinek jî wan ev in:

Ji bilî zarokên Mela Xelîl herwekî, Mela Mûhamed b. Mela Arab es-Siirdî, Mela Eli el-Helenzî, Mela Mistefa el-Helenzî, Şêx Hamîd et-Tîlloyî, Şêx Hesên et-Tîlloyî, Mela Ehmed el-Hazrinî, Mela Xalîd es-Salîhî, Melazade el-Erûhî, Mela Hemîd en-Nivîlî, Mela Bekir es-Sehrî, Mela Hesên, Mela Omer b. Mela Evdîlah bi dehan alim jî Mele Xelîl îcazet wergirtine.¹³⁶

1. 3. 5. Terîqet û Tesewufa Wî

Dema ku Kurdan dîne Îslamê naskirin û pejirandin, êdî di her warî de ketin bin bandora dîne Îslamê. Rabûn û rûniştin, xwarin û vexwarin, danûsitendin, şîn û şahiyên xwe li gorî îrf û edetên Îslamê pêk anîn. Di heman demê de ev tesir li ser ziman, çand û huner û edebiyata Kurdî jî çêbûye. Di serdema Îslamê de, di edebiyata Kurdî ya klasîk de têgeh û unsurên Îslamî zêde tên xuyan. Nivîskar û şairên me yê wê serdemê bi pîranî di warê dînî de âlim û pîspor bûn. Lewma bandora tesewufê û terîqetên dînî li ser muelîf û berhemên wan zêde çêbûne. Herweha ev tesir li ser Mele Xelîl jî çêbûye. Ev beytên wî yê Nehcu'l-Enâmê derheqê terîqeta wî de mînak in.

¹³⁵ Kazan, **b.n.**, r.8; Öncü, **b.n.**, r.23.

¹³⁶ Öncü, **b.n.**, r.23.

Mezâhib çihâr in îmâmê di wân
Li heqqîn e her çârî bê şek bizân

(b/117)

Ku Nu‘mân û hem Ehmed û Mâlik in
Ji dînê me re Şâfi‘î ye rukin

(b/118)

Îmâmê me ye Eş‘erî tâ nehir
Bu Menşûre‘ê Mâwerâu‘n-nehir

(b/119)

Mele Xelîl ji aliyê tesewîfî ve pêgirtiyê terîqeta Qedirî ye. Dema li Îmadiyeyê bûye, muhtemelen piştî ku îcazet sitandiye çûye Reşîdiyeyê û li wir intisabî Şêx Ehmedê Reşîdî kiriye û li ser wî medhiye nivîsandine. Mela Xelîl piştî ku vegeriyaye welatê xwe û piştê li Sêrtê bi cîh bûye, îcar gelek caran ji bo ziyareta Şêx Xalidê Cizîrî (k.d.1839) li ser merkebê çûye gûndeki bi navê Basretê (li herema Botan) û di sohbeta wî de maye. Ev Şêx Xalidê ku xelîfeyê Mewlana Xalidê Şehrezorî ye, li herema Botan, Sêrt û Merdînê damezirînerê şaxekî terîqeta Neqşebendîtiya Xalidî bûye. Wate Mela Xelîl digel Qedirî jî bûye, lê piştî ku Neşebendîti li welat belav bûye, çûye bi ser şêxekî Neqşebendî jî. Mela Xelîl di warê tesewûfê de du berhemên bi navê “Min-hacu’s-sunneti’s-Seniyye fî Adabi Sulûki’s-Sûfiyye” û “Nebze-tu Mevahibi’l-Leduniyye fî Ş-Satahati ve’l-Vadeti’z-Zatiyye” nivîsandiye.¹³⁷ Mele Xelîl mensûbê Mezheba Qedirî ye. Lê digel vê di bin bandora nunerê wehdetu’l-wucûdê yê herî girîng Îbnî Erebî de maye.¹³⁸ Ji bo nivîsandina medhiya li ser Şêx Ehmedê Reşîdî ev qesîdên Mele Xelîl mînak in.

Bizan e hem qebl ke tu bi minet
Bi Şêx Ehmed Reşîdî bûye cenet

(3/2)

¹³⁷ Adak, **b.n.**, r. 327.

¹³⁸ Kazan, **b.n.**, r. 5; Öncü, **b.n.**, r. 22.

Heçî bi Şêx Ehmedî nîn e

Ewî idrak tunîn e bê sewî ne¹³⁹

(3/10)

1. 3. 1. Edîbên Ku Li Ser Mele Xelîl Tesîr Kirine

1. 3. 1. 1. Melayê Cizîrî

Melayê Cizîrî, di edebiyata Kurdî de ekola tesewîfê temsîl dike. Bi gotinek dî ew helbestvanekî mutesewîf e. Tesewîfa li cem Mela, tesewîfa felsefî ye ku di dîwana wî de reng vedaye. Bi rengê hizra wehdetu'l-wicûdê (yekîbûn) ye.¹⁴⁰ Mela bi helbestên xwe tesîrek gelek mezin li ser yê piştî xwe kiriye.¹⁴¹ Mela di aliyê fikra wehdetu'l-wicûdê de di bin bandora Xellacê Mansûr de maye.¹⁴²

Tesîra Melayê Cizîrî ya li ser Mele Xelîl, ji hêla devoka ziman û îtîqada tesewîfê de ye. Devoka zimanê vê berhema Mele Xelîl jî herwekî devoka zimanê Melayê Cizîrî, devoka Bohtî û Hekkarî ye. Tesîra wehdetu'l-wicûdê li ser Melayê Cizîrî gelek zêde ye. Nûnerê wehdetu'l-wicûdê yê wê serdemê yê herî tê zanîn Melayê Cizîrî bixwe bûye. Me li jorê di mijara tesewîfa Mele Xelîl de jî gotibû, Mele Xelîl di aliyê îtîqata tesewîfî de di nav hereketa wehdetu'l-wicûdê de cîh digre. Nexwe xuya dike ku di warê îtîqata wehdetu'l-wicûdê de tesîra Melayê Cizîrî li ser Mele Xelîl çêbûye.

Bo nimûne:

Melayê Cizîrî

Hostayê 'îşqê dîl hevot ser ta qedem hingî disot

Remzê enelheq her digot bawer bikin mensûrê dil.

Wehdetî mutleq Mela nûr e di qelban cela

Zori divê mes'elê ehlê dilan şubhe ma

¹³⁹ Şemrexî, **b.n.**, r. 61.

¹⁴⁰ Adak, **b.n.**, r. 231.

¹⁴¹ Adak, **b.n.**, r. 233.

¹⁴² M. Nesîm Duru, **Melayê Cizîrî Felsefî ve Tasavvufî görüşleri**, İstanbul: Wêşanê Nûbiharê, tn. r. 28.

Wehdetê sirf e me meşreb te çi iksire wucûd

Em lebalep çi lebalep bixwe hem cam e, lebaleb¹⁴³

Mela Xelîl

Şifâtê kemâlê hemî Reb hene

Simâtê di neqsê, ne mewcûde ne

(b/23)

Tu nâvânî bê şer‘ê lê dâme ne

Ji nehewêd û neh nâvê wî zêde ne

(b/24)

Ji ketmâ ‘edem ‘âlem ânî wucûd

Bi vî wechê ehsen wî şâhê wedûd

(b/25)

Tu me‘dûm û hâdis bizân e, e wê

Heyûla***** tunîn e ku ‘âlem ji wê

(b/26)

1. 3. 1. 2. Feqiyê Teyran

Ehmedê Xanî, di bin tesîra Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran de mezin bûye. Feqiyê Teyran di nav helbestvanên klasîk de zimanê xwerû û sade temsîl dike. Feqî di helbestên xwe de li gorî dema xwe zimanê gel, bi awayekî zelal û xwerû bikaraniye. Bêje û têgehên Erebi û Farisî di helbest û berhemên wî de hindik in. Gava hinek bêje û têgehên Erebi û Farisî xebitandine jî gelek caran hemwateyên wan ên Kurdî li pey wan bikaranine.¹⁴⁴ Lê bandora Feqî li gorî Mela û Xanî bi sînor e. Mela û Xanî ji Feqî gelekî zêdetir bandor li helbestvanên pey xwe kirinin.¹⁴⁵ Feqiyê Teyran (1560-1640), hemdemê

¹⁴³ Duru, **b.n.**, r. 28,29.

***** Wate: Bi me‘na esl û maddekî qedîm e. Li nik hekîman ku profesorên kevin dibêjin; ‘âlem ji heyula çê bûye. Li nik wan ‘âlem qedîm e. Ehlê sunnetê heyûlayê ji binî qebûl nakin. Tefsîl di şerha Xanî de heye. Çavkanî: Ahmed Hilmî El Qoxî El Diyarbekîrî, **Rehberê ‘Ewam Şerha Nehc-ul Enam**, Îstanbul: İhsan yayınları, tn. r.10.

¹⁴⁴ Adak, **b.n.**, r. 236.

¹⁴⁵ Adak, **b.n.**, r. 237.

Melayê Cizîrî ye. Bi zimanekî xwerû û bi uslûba tesewûfî û îrfanî digel helbestan di dîwana xwe de menzûmên tesewûfî yên herwekî “Şêxê Sen’an”, “Zembilfiroş”, “Şerê Dimdimê” û “Bersîsê ‘Abid” nivîsandiye. Ji destpêka edebiyata Kurdî hetanî roja îroyîn şairê herî zindî yê klasik ew e. Lewra digel qasîde û xezelên xwe û menzûmeyên tesewûfî yên dirêjê alegorik, ji ber zimanên wan ên xwerû di edebiyata devkî de bi ragihandina dengbêjan, hetanî roja me ya îroyîn hatine neqîlkin. Bi aliyê bikaranîna mijarên tesewûfî, ji edebiyata Îraniyan dişibe Ferîdûddînê ‘Etar. Tê gotin ku Feqiyê Teyran, mexlesa xwe ya bi navê Feqiyê Teyran ji hikayeta “Sîmûrg” ya di berhema “Mantiqû’t-Teyr” a Ferîdûddînê ‘Etar de derbas dibe hilgirtiye. Lewra di Kurdî de Feqiyê Teyran tê me’neya “xwendekarê çivîkan”. Digel vê ji hêla bikaranîna mijarên îmgîyên tesewûfî ve Feqiyê Teyran, di edebiyata Tirkî de dişibe Yûnus Emre.¹⁴⁶

Li gorî agahiyên jorîn yên di derheqê Feqe de, Mele Xelîl jî herwekî Feqe di bin bandora tesewûfî de maye û gelek berhêmen eqaîde nivîsiye. Yek ji wan jî berhema Nehcu’l-Enâmê ye. Zimanê Mele Xelîl jî herwekî Feqî zelal û xwerû ye. Lê bikaranîna bêje û têgehên Erebî û Farisî de wekî Feqe, li dû unsûrên Erebî û Farisî yên Kurdî bikar neaniye. Herwekî ku me li jor jî aniye zimên Xanî di bin tesîra Feqî de maye. Herwisa Mele Xelîl jî hem di hêla mentiqê de hem jî di hêla zimên de gelek gelek zêde di bin bandora Xanî de maye. Lê zimanê Mele Xelîl ji zimanê Xanî hîn bêhtir xwerû û zelaltir e. Diçe ser zimanê Feqe. Lê hindikî ji zimanê Feqe girantir e. Digel van agahiyan mirov dikare bibêje ku li gorî Ehmedê Xanî bandora Feqe ya li ser Mele Xelîlê Sêrtî bi awayekî raste rast nîne.

Bo nimûne:

Feqiyê Teyran

Perane lew dimirit

Xweş nîn e ev bijînê

Zeîf e xwe negirit

Tij e berqa evînê

¹⁴⁶ Ayhan Tek, “Mem û Zîn ve Hüsni Aşk Karşılaştırılması bağlamında Klasik Kürt ve Türk Edebiyatı Üzerine Notlar”, [http://www. Mem ü Zîn ve Hüsni Aşk Karşılaştırılması bağlamında Klasik Kürt ve Türk Edebiyatı Üzerine Notlar.com](http://www.Mem-ü-Zîn-ve-Hüsni-Aşk-Karşılaştırılması-bağlamında-Klasik-Kürt-ve-Türk-Edebiyatı-Üzerine-Notlar.com), (Tarîxa Têgihîştînê: 7 Tîrmeh 2015), r.4,5; Ayhan Tek, “Kürt ve Türk Edebiyatlarının Ortak Havuzu”, [http://www. Ayhan Tek, Kürt ve Türk Edebiyatlarının Ortak Havuzu.com](http://www.Ayhan-Tek-Kürt-ve-Türk-Edebiyatlarının-Ortak-Havuzu.com), (Tarîxa Têgihîştînê: 7 Tîrmeh 2015), r. 1-4.

Di perdê nasebirit

Perde kemala dînê.¹⁴⁷

Mela Xelîl

Tu guhdêr e nuq û beyânê feşîh

Ji bo ferz û ‘eynân e, merdê melîh

(b/1)

Ku îmân û Îslâm û şewm û şelât

Li ser mâlîdârân e hecc û zekât

(b/2)

Li ser te ji ferzân e, ey nûrê cân

Bizâne tu erkân û şerîfê di wân

(b/3)

Eşer ku li fî‘lan muretteb dibit

Bî îcâd û fî‘lâ wî peydâ dibit

(b/78)

Ecel her yek e, gerçi kuştin bitin

Qe şolek li wî nâbî wâcib bitin

(b/81)

¹⁴⁷ Feqiyê Teyran, **Jiyan, Helbest û Berhemên Wî**, (Amd., M. Xalid Sadîni), Stenbol: Wêşanê Nûbihar, 2000, r. 213.

1. 3. 1. 3. Ehmedê Xanî

Dema ku meriv li *Nehcu'l-Enamê* dinêre, serkeftina Seydayê Mela Xelîl ya di zimanê Kurdî de diyar dibe. Lê gelo icar Mele Xelîl, di edebiyata Kurdî de herî pir di bin bandora kîjan şa'irî de maye? Bi baweriya min haya Mela Xelîl ji *Eqîdeya Îmanê* ya Ehmedê Xanî hebû ye. Lewra kesê ku hinkî çav li kitêba *Nehcu'l-Enamê* û *'Eqîdeya îmanê* ya Ehmedê Xanî bigerîne, dê bibîne ku Seydayê Mele Xelîl gelekî di bin bandora wî de maye. Çunkî dema ku meriv li herdû berheman dinêre, tê dîtîn ku kêşa herdû berheman jî li ser “behra muteqarib a meqsûr” “fe’ûlun, fe’ûlun, fe’ûlun, fe’ûl” hatiye hûnandin. Hem tê dîtîn ku hinek malikên *Nehcu'l-Enamê* û *'Eqîdeya Îmanê* ya Ehmedê Xanî ji sedî sed hevûdû digrin, hinek jî jê nîvî digrin. Her wekî ku em ê li jêr mînakên ji herdû berheman jî bidin. Ev jî tê wê me'neyê ku haya Mela Xelîl ji *Eqîdeya Îmanê* ya Ehmedê Xanî hebû ye û ji fikrê wî gelekî istifade kiriye. Lê ev tiştên ku em dibêjin, di birê yekem ê *Nehcu'l-Enamê* de pêk hatiye, lê di yê duyem de tune ye. Ji ber ku di *Eqîdeya Ehmedê Xanî* de birê duyem yanî birê tesewuf û exlaqê tune.

Hevberkirina berhema Eqîdeya Îmanê û Nehcu'l-Enamê:

Ehmedê Xanî	Mela Xelîl
(Ji <i>Eqîdeya Îmanê</i>)	(Ji <i>Nehcu'l-Enamê</i>)
Di heft asimanan ew î ew perand	Ji wê ew bire sidretul muntehâ (46/1)
Bi qasî dû qewsan vi bal xwe gehand	Bi qâbê dû qewsân bi bâl wî gehâ (46/2)
Muheqeq bizan wî Xudê dîti ye	Li wê ew dibînin rebê ‘âliye (49/1)
Nihayet nizanî heqîqet çiye	Welêkin nizânin heqîqet çiye (49/2)
Meke lec di Luqman û Eskenderî	Di Luqman û Eskenderî lec meke (73/1)
Ji bo van ne me’rûfe peyxemberî	Ne peygember in ew, ’inâdê meke (73/2)
Xudê nîn e cewher, ne cism û ‘erez	Ne cism e, ne cewher ne nûr û ‘erez (13/1)
Ne kule ne be’ze bizan bê ‘erez	Ne zû lewn û miqdar û şekl û merež (13/2)

Irdet diket ew **bi xeyr û şeran**

Riza nîn e ema fi'la şeran

Ew î kê bi zulmê tekelif diket

Di mulkê xwe de ew taseruf diket

Lê wan **'Elî sahibê Zûlfqar**

Suwarê li duldulê şahê namidar

Ji 'ezl û gunehan nebî bûn berî

Ji bo qismê jin nîne peyxemberî

Heyûla çû nînin êdîm e 'edîm

Dinê kafîr, ê dibêjit qedîm

Min û cumle'ê ummeta Mustefa

Bibey cennetê, tabi'ê Mustefa¹⁴⁸

Murîd e **ji bo xeyr û şerrân**, welê (19/1)

Rizâ wî tunîne bi şolâ nelê (19/2)

Zûlm nîn e 'edl e, heçî kû biket (105/1)

Di mulkê xwe de ew taseruf diket (105/2)

Li dû wî **'Elî sahibê Zûlfeqar** (58/1)

Evânânî sih sâl xilâfet bi wâr (58/2)

Ne ehlin gunehkâr û 'ebdâr û jin (69/1)

Ji peygemberê re, welê qismê jin (69/2)

Tu me'dûm û hâdis bizân e, e wê (26/1)

Heyûlâ tûnîn e, ku 'âlem ji wê (26/2)

'Efukey ilâhî bi şîdîq û şefâ (273/1)

Bibey cennetê tâbi'ê Muştefâ¹⁴⁹ (273/2)

¹⁴⁸ Ehmedê Xanî, **Eqidaya Îmanê**, (Amd. Huseyin Şemrexî), Stenbol: Wêşanê Nûbiharê, 2012, r. 69-87.

¹⁴⁹ Mele Xelîlê Sêrtî, **Nehcu'l-Enam**, (Amd. Huseyin Şemrexî), Stenbol: Wêşanê Nûbiharê, 2012, r. 7.
(Ev hevberkirina berhema Eqîdeya Îmanê û Nehcu'l-Enamê min ji vê xebata Huseyîn Şemrexî ya li ser berhema Nehc'ul-Enamê hatiye kirin, girtiye)

BEŞA DUYEMÎN
VEKOLÎNA NEHCU'L-ENÂMÊ Û ZİMANÊ MELE XELÎL
JI ALİYÊ ŞIKLÎ VE

2. 1. VEKOLÎNA NEHCU'L-ENÂMÊ JI ALİYÊ ŞIKLÎ VE

Ev berhema menzûm bi teşeya mesnewiyê hatiye nivîsandin.”¹⁵⁰ Kêşa erûza wê li ser behra muteqarib a meqsûr “fe’ûlun, fe’ûlun, fe’ûlun, fe’ûl” hatiye hûnandin.

2. 1. 1. Şikl û Cureyên Nezmê

2. 1. 1. 1. Mesnewî

Mesnewî, di zimanê Erebi de ji koka tîpên “s, n, y” tê. Wek biwêja (îdyom) edebiyatê cara yekemin di edebiyata Îraniyan de hatiye bikaranîn. Nimûneyên vê cureyê nezmê yên pêşî di edebiyata Erebi de hatine dîtin. Mesnewî di nav xwe de ji beytên bi qafiye pêk tê. Ji hêla hejmara beytan ve bi sînor nîne. Ji bo vê şair, heta ku dikare mijara xwe berfirehtir dike. Lewra mesnewî vê derfetê dide wî. Ji lew mesewî bûye curekî nezmê yê herî ku tê bikaranîn. Ji ber ku hejmara beytan gelek zede ye bi pirranî qalibên erûzê yên kurt tê bikaranîn. Mesnewî bi pirranî di mijarek diyar de û herwekî pirtûkek cuda tîpê nivîandin. Plansaziya nivîsandina mesnewiyan bi gelemperî yek in.¹⁵¹ Wateya mesnewiyê ya eslî cot yanî dudu ye. wezna wan yek e, lê her beyit ji beytên din azad e.¹⁵²

2. 1. 1. 2. Mesnewî Di Edebiyata Kurdî De

Dema ku em di edebiyata Kurdî de li mesnewiyan mêze dikin, mesnewiya bi tahkiye (vegotina bi hîkaye) ya yekemin, berhema Mem û Zîn e ku Ehmedê Xanî di sala 1694an de nivîsandiye. Digel vê Ehmedê Xanî yanzdeh sal di pêşiya wê de, di sala 1683an de cara yekemin pirtûka xwe ya Nûbihara Biçûkan nivîsandiye. Ev berhem, bi Kurdî-Erebî ferhengê menzûm e û di teşeya mesnewiyê de hatiye nivîsandin. Lê ev ferheng, ji ber ku mesnewiyek ne bi tahkiye ye, divê ku di edebiyata Kurdî de nimûneya mesnewiya Kurdî ya yekem Mem û Zîn were qebûlkin. Ehmedê Xanî, ji bo

¹⁵⁰ Adak, **b.n.**, r. 329; Ji bo agahiyên berfirah, bnr. Saîd Nursî, **Pîşegiya Peyvên Biçûk (Küçük Sözler, bi tîpên Erebi)**, (Amd. Abdulkadir Badıllı), İstanbul: Wêşanê Envar Neşriyat, 1992, r. 8.

¹⁵¹ Elif AYAN, “*Salîm Efendî’nin Hûsrev û Şîrîn Mesnevîsi ve Türk Edebiyatında Hûsrev û Şîrîn Mesnevîleri*”, (Teza Doktora ya Neçapkirî, Enstîtuya Civaka Zanistî ya Zanîngeha Hacetepe, 2010), r. 4-45.

¹⁵² M. A. Yekta Saraç, **Klasik Edebiyat Bilgisi Biçim-Ölçü-Kafiye**, İstanbul: 3F Yayınevi, 2007, r. 79.

nivîsandina mesnewiya xwe ya Mem û Zînê ji mînakên ku di Qûran û Tewratê de derbas dibin ji hikayeta Yûsûf û Zuleyxa yan jî ji efsaneyên Fars û Ereban ji Leyla û Mecnûn, Husrew û Şîrîn û Vamîk û Azra mînak hilnedaye. Bi tevahî ji destanek Kurdan ji destana Memê Alan sûd wergirtiye. Digel vê di piştî Mesnewiya Mem û Zînê de, di edebiyata Kurdî de mesnewiyên herî tîr zanîn, Mesnewiya Yûsûf û Zuleyxa ye ku di sala 1754an de ji aliye Selîmê Silêman (Hîzanî) ve hatiye nivîsandin û ya din jî mesnewiya Leyla û Mecnûn e ku di sala 1870an de ji aliye Siwadî ve hatiye nivîsandin. Eger çavkaniyên di desten me de nişan didin rast be û di pêşiya Mem û Zîna Ehmedê Xanî de mesnewî nehatibin nivîsîn, ev dê were wateya ku şairên Kurda li nivîsandina cûreyê mesnewiyê bi germahî lê mêze nekirine. Gava ku mirov vêya bi edebiyata Tirk û Farsan re muqayese dike mirov dibîne ku sedema wê jî ev e ku “sîstemeke patronajê” tunebûye ku şair, qesîde û mesnewiyên xwe pêşkêşî wê bike. Ji bo vê dîtina kûrahiya di navbera şair û siltanan de divê ku mirov li teza “Halil İncik” ya bi navê “*şair û patron*” meze bike. İncik, li gorî vê teza xwe îddîa dike ku “her berhemên ku hatin nivîsîn mûheqq bi desteka qesran ve hatine holê.” Mesnewiyên edebiyata Kurdî jî pêwîst e ku mirov di çarçova vê teza patronajê de bixwîne.¹⁵³

2. 1. 2. Kêşa Nehcu’l-Enamê

Kêşa Nehcu’l-Enamê, “**fe’ûlun, fe’ûlun, fe’ûlun, fe’ûl**”e. Ji behra muteqarib a meqsûr e û qalibekî nesalim e. Li gorî kiteyên girtî û vekirî me qalibê ‘erûzê tetbîq kir. Li ser hin malikên jêrîn ev tetbîqkirin wisa ye:

Zîhaf: Wateya eslî ya zîhafê, dûrxistina ji eslê xwe ye. Lê di erûzê de zîhaf, kurtkirin an jî kurtxwendina kîteyan e ku di rastiyê de dirêj in.¹⁵⁴ Di berhema Nehcu’l-Enamê de mînakên zîhafê gelek zêde ne. Me zîhaf bi “**ž**” yê nîşan da.

Ku îmân û Îslâm û şewm û şelât (2/1)

· — — / ž — — / ž — — / · —

fe’ûlun, fe’ûlun, fe’ûlun, fe’ûl

¹⁵³ Ayhan Tek, “Mem û Zîn ve Hüsni Aşk Karşılaştırılması Bağlamında Klasik Kürt ve Türk Edebiyatı Üzerine Notlar”, [http://www. Mem û Zîn ve Hüsni Aşk Karşılaştırılması bağlamında Klasik Kürt ve Türk Edebiyatı Üzerine Notlar.com](http://www.Mem-û-Zîn-ve-Hüsni-Aşk-Karşılaştırılması-bağlamında-Klasik-Kürt-ve-Türk-Edebiyatı-Üzerine-Notlar.com), (Tarîxa Têgihîştinê: 7 Tîrmeh 2015), r.4,5.

Ji bo agahiyên berfireh bnr., Halil İncik, “Klasik Edebiyat Menşei, İrani Gelenek, Saray İşret Meclisleri ve Musahib Şairler”, **Türk Edebiyatı Tarihi**, Ankara: Kültür ve Turizm Bakanlığı Yayınları, 2007, r. 233-299.

¹⁵⁴ Saraç, **b.n.**, r. 215.

Li ser te ji ferzân e, ey nûrê cân (3/1)

· – –/· – –/· – –/ž –

fe'ûlun, fe'ûlun, fe'ûlun, fe'ûl

Heçî hukmê şer'î tu muhtâc dibî (4/1)

· – –/ž – –/· – –/· –

fe'ûlun, fe'ûlun, fe'ûlun, fe'ûl

Ji bo zânînâ wî, tu munqâdi bî (4/2)

· – –/ž – –/· – –/· –

fe'ûlun, fe'ûlun, fe'ûlun, fe'ûl

Tu îmânê bâweriyâ dil bizân (5/1)

· – –/ž – –/· – –/· –

fe'ûlun, fe'ûlun, fe'ûlun, fe'ûl

Musilmânî bê herduwân nâbitin (6/2)

· – –/ž – –/· – –/· –

fe'ûlun, fe'ûlun, fe'ûlun, fe'ûl

Îmale: Dirêjxwendina dengdêrekî kurt a di hundirê peyvekî de ye. Bi gotineke din, di erûzê de kîteyêke vekirî ku wekî kîteyêke girtî bê hesibandin wê çaxê îmale derdikeve holê.¹⁵⁵ Di berhema Nehcu'l-Enam de ji ber ku erûz bi awayekî serkeftî hatiye bikaranîn, mînakên îmaleyê jî kêr in. Me îmale bi “Î” yê nişan da.

Bizâne tu erkân û şertê di wân (3/2)

· – Î /· – –/ž – –/· –

fe'ûlun, fe'ûlun, fe'ûlun, fe'ûl

Wucûdâ Wî ‘eyn e ji bo zâtê wî (11/1)

· – –/ž – Î /· – –/ž –

fe'ûlun, fe'ûlun, fe'ûlun, fe'ûl

¹⁵⁵ Saraç, **b.n.**, r. 210.

Ne ewwel ne âxir ne zîdde e wî (11/2)

· - - / · - Î / · - - / · -

fe'ûlun, fe'ûlun, fe'ûlun, fe'ûl

Ne cîsme, ne cewher ne nûr û 'erež (13/1)

· - - / · - Î / · - - / · -

fe'ûlun, fe'ûlun, fe'ûlun, fe'ûl

Şîfâtê di seb'e ezel wî hene (17/1)

· - - / · - Î / · - - / · - Î

fe'ûlun, fe'ûlun, fe'ûlun, fe'ûl

Heyât e digel 'îlm û sem' û beşer (18/1)

· - Î / · - - / ž - - / · -

fe'ûlun, fe'ûlun, fe'ûlun, fe'ûl

Wesl: Wateya bêjeya weslê “ulama” yan bihevpevekîrîn e. Di erûzê de dema ku bêjeyek bi tîpeke bêdeng dawî bibe û bêjeya dû wê re bi tîpeke dengdar destpê bike li wir herdu bêje bihevre tîpên xwendin.¹⁵⁶ Me wesl bi “” nîşan da.

Teleffuz eger qâdir , pê bikey (7/2)

· - - / · - - / ž - - / · -

fe'ûlun, fe'ûlun, fe'ûlun, fe'ûl

Eger dewlemendek qewî şâkir  (175/1)

· - - / · - - / / · - - / ž -

fe'ûlun, fe'ûlun, fe'ûlun, fe'ûl

Çi key tu ji feqrâ digel şâbir  (175/2)

· - Î / · - - / · - - / ž -

fe'ûlun, fe'ûlun, fe'ûlun, fe'ûl

¹⁵⁶ Saraç, **b.n.**, r. 208.

Bike rû, e vî qâlibê gewher î (250/1)

· î - / · - - / ž -

Bide wî Xudâyê ku ew çêkir î (250/2)

· î - / · - - / ž -

2. 1. 3. Şemaya Qafiyeyên Nehcu'l-Enamê

Şemaya qafiyeyan wekî hemû mesnewiyan, her xane/malik di nav xwe de bi qafiye ye û qafiye bi beyt bi beyt diguhere. Di edebiyata rojhilat de şaheserên wekî Mesnewiya Mewlana û Şahname Fîrdewsî, di edebiyata Tirkî de Kûtadgû Bilîga Yûsuf Has Hacîp, Husn û Eşqa Şêx Galîb, Leyla û Mecnûna Fûzûlî û Mewlûda Suleyman Çelebî û di edebiyata Kurdî de jî Mem û Zîna Xanî, Leyla û Mecnûna Sewadî, Yusuf û Zuleyxa ya Selîmê Silêmanî (Hîzanî) û Mewlûda Bateyî hene. Ev berhem wekî berhema Nehcu'l-Enamê bi terza mesnewiyê hatine, hûnandin û terza qafiyeya wan jî “aa, bb, cc, dd, ee” ye.¹⁵⁷

a_____ feşîh

a_____ melîh

b_____ şelât

b_____ zekât

c_____ cân

c_____ wân

d_____ dibî

d_____ dibî

e_____ nâbitin

e_____ nâbitin

2. 1. 4. Redîfên Nehcu'l-Enamê

Redîf, di helbestan de wekheviya qertafên hevpeywir û hevpar e. Beriya qafiyeyê mirov li redîfê digere. Ger ku redîf hebe mirov wê dinivîsîne û derbasî

¹⁵⁷ Yalar, **b.n.**, r. 410.

qafiyeyê dibe. Ger ku tune be mirov li wekheviya dengên digere û wan li gorî navê qafiyeyan bi nav dike.¹⁵⁸

Bizan (b/5), nabitin (b/6), bikey (b/7,9), dikey (b/7,8, 212), wî (b/11, 84, 156, 216,2 46), hebin (b/22), wê (b/26, 75), in (b/31-53), bûn (b/34), çû (b/39), Nûh (b/52), dî (b/67), dibî (b/68), jin (b/69), meke (b/73, 125, 177, 218, 237, 244), dibit (b/78,168), bikit (b/79), bitin (b/81), bikey (b/83, 215), ket (b/88,252), bibit (b/89), heqin (b/94), bibin (b/96), bin (b/97), biket (b/101,102), vexwûn (b/103), diket (b/108,211), nehîr (b/119), kirin (b/129), mebe (b/148), bike (b/149, 153, 170, 190, 198, 219, 223, 230, 241, 246, 254, 258), eza (b/181), dixwe (b/208), nekey (b/209), nexwey (b/214), te (b/220), Mexwe (b/221), xwarin (b/226), bixwûn (b/231), mexwû (b/232), vexwe (b/240), be (b/253), qenc (b/255), tu (b/257), key (b/268,270).

Heçî hukmê şer‘î tu muhtâc **dibî**

Ji bo zânînê wî, tu munqâ **dibî**

(b/4)

Tu îmânê baweriyê dîl **bizân**

Muqî‘bûn e Îslâm, bi zâhir **bizân**

(b/5)

Welêkin qe yek bê yekî **nâbitin**

Musilmânî bê herduwân **nâbitin**

(b/6)

Tu me‘nâyê şehdê ku bawer **bikey**

Telefuz eger qâdirî, pê **bikey**

(b/7)

Ji kufre tu bê şek xwe xâric **dikey**

Welê eşlê dînî tu hâşil **dikey**

¹⁵⁸ Ziver Îlhan, “*Mewlûda Mela Huseynê Bateyî*”, (Teza Mastirê ya Neçapkirî, Enstîtuya Zimanê Zindî ya Zanîngeha Artûklû ya Mêrdînê, 2013), r. 20.

(b/8)

2. 1. 5. Qafiyeyên Nehcu'l-Enamê

2. 1. 5. 1. Qafiyeya Tam

Qafiyeya tam, di helbestan de ji paşîya risteyê ber bi serê risteyê ve, ji xeynî redîfê, wekheviya du dangan e.¹⁵⁹ Di vê berhemê de hejmara qafiyeya tam gelek zêde ne.

Tu gûhdêr e nuq̃ û beyânâ feşîh
Ji bo ferâ û 'eynân e, merdê melîh

(b/1)

Ku îmân û islâm û şewm û şelât
Li ser mâlîdârân e hecc û zekât

(b/2)

Li ser te ji ferzân e, ey nûrê cân
Bizâne tû erkân û şertê di wân

(b/3)

Ne mişl û zehîr û wezîr û mekân
Ne mânî' mu'în û cîhât û zemân

(b/12)

Ne ewlâd û zewcet ne bâb û ne dâ
Ne hemkûf û mewt û zewâlâ Xwudâ

(b/14)

¹⁵⁹ İlhan, **b.n.**, r. 20.

2. 1. 5. 2. Qafiyeya Dewlemend

Qafiyeya dewlemend, di helbestan de ji paşiya risteyê ber bi serê risteyê ve, ji xeynî redîfê, wekheviya sê dangan û bêtir e.¹⁶⁰ Di vê berhemê de hejmara qafiyeya dewlemend gelek zêde ne.

Wekî ku digel wê ‘emel jî bi**key**
Tu îman û îslâmê kâmil di**key**

(b/9)

Heyât e digel ‘îlm û sem‘ û be**şer**
Îrâdet digel qudretâ xeyr û **şer**

(b/18)

Bi Qurânê geyrî wê mensûx **bûn**
Ewê hukm û xwendin mubeddel ne**bûn**

(b/21)

Melâik ji bo wî hene bê ‘**eded**
Mudâmî ‘îbâdet diken bê **meded**

(b/27)

Hinek jê xewâşin welê her **yekî**
Vebuhtî kirî wî ji bo **şolekî**

(b/28)

‘Enâşir çihâr in, ji wân in **melek**
Wekî îns û cin, nûr e qismê **gelek**

(b/29)

Xudê ew kire xâtîmê enbiy**ân**
Welêkin ewe serwerê etqiy**ân**

¹⁶⁰ Îlhan, **b.n.**, .r. 21.

(b/35)

2. 1. 5. 3. Qafiyeya Nîv

Qafiyeya nîv, di helbestan de ji paşîya risteyê ber bi serê risteyê ve ji xeynî redîfê, wekheviya dengê bitenê ye.¹⁶¹ Di vê berhemê de hejmara qafiyeya nîv gelek kêr in.

Ji emrazê dil rûni ferz e dewâ

Ku hîrş û hesed, kibr û ‘ucb û riyâ

(b/128)

Bi te‘zîm û heybet, huzûr û heyâ

Tedebbur bike xwendin û hem du‘â

(b/248)

2. 1. 6. Hunerên Edebî

2. 1. 6. 1. Teşbîh

Hunera şibandinê ye. Ji bo ku peyv bêtir bihêz bibe, mirov peyva bêhêz dişibîne ya bihêz. Mînak:

Tu hilmê bike bê hed û bê qiyâs

Wekî munkerek tu nebînî ji nâs

(b/189)

Ji fêkî tu birhê bide ê şîrîn

Ji bo te dewâ’ in **wekî hingiv in**

(b/242)

¹⁶¹ Îlhan, **b.n.**, r. 22.

2. 1. 6. 2. Teşbîhî Belîx

Cureyeke hunera şibandinê ye. Di vê şibandinê de tenê ya ku dişibe û ya ku tê şibandin tê bikaranîn. Ji ber ku Mele Xelîl, evîna dilê xwe bi raste rast aniye ziman, di vê berhema xwe de zêde cîh nedaye hunerên şibandinê an teşbîhê. Ji bo vê yekê hejmara hunera teşbîha belîx gelek kêr in.

Ku îz‘ânî key, wê demê zerreyek

Ji **behrâ ‘edem** nâyê bê bâriyek

(b/116)

Di ‘ernê tu birâ xwe bîne le‘în

Sû‘âlê meke ji xeyrî **Şâhê Emîn**

(b/146)

2. 1. 6. 3. Teşxîs

Xûsûsiyetên ku aidê însanan e, carcaran li mexlûqatên din tîrî bîrînin. Mexlûqatên ji bilî insan, bi xûsûsiyetên mirovan tîrî şibandin. Ji vê şibandinê re teşxîs tê gotin. Carinan ev şibandin bi herwekî îstîfeyê veşartî jî tê bikaranîn.

Digel **hindî eşyâ fenâ dê bibin**

Ji bil zâtê Reb, pâşê ‘ewde bibin

(b/96)

Ji **emrazê dil** rani ferz e dewâ

Ku hîrş û hesed, kibr û ‘ucb û riyâ

(b/128)

Ji bo çî tu vî **le‘b û lehwê dikey?**

Heçî ku bi nef‘e çîrâ dê nekey?

(b/200)

E wî **çâvi dâye ku pê bifkirî**

Divê ‘âlemê ‘ibretê jê bigirî

(b/201)

Herâm her wekî hill e, rizq e ji wî

Eger çi mu‘eqqeb diket te bi wî

(b/84)

2. 1. 6. 4. Îstîare

Ev huner, hunereke şibandinê ye; lê di vê şibandinê de ya ku dişibe û ya ku tê şibandin wek yek bi tenê tê bikaranîn. Ji vê hunerê çend mînak di vê berhemê de hene:

Ji Rebbê xwe gufrânê telbe bike

Bi tewbê tu pâqij dibî her bike

(b/170)

Heçî lâ’iqê Rebê wân e, bike

Ku **şehde nedin ew**, ‘itâbê bike

(b/198)

2. 1. 6. 5. Tenasûb

Di yekeya helbestekê de eger peyvên ku di navbera wan de têkilî hene, bi hev re bêne bikaranîn, navê wê hunerê tenasûb e. Di vê berhemê de ev huner pir hatiye bikaranîn:

Ku îmân û Îslâm û sewm û şelât (2/1)

Ne ewlâd û zewcet ne bâb û ne dâ (14/1)

Heyât e digel ‘ilm û sem’ û beşer (18/1)

‘Enâşir çihâr in, ji wân in melek (29/1)

Wekî îns û cîn, nûr e qismê gelek (29/2)

Îbrâhîm û Mûsâ û ‘Îsa û Nûh (52/1)

Hisâb û şirât û mîzân û neşir (93/2)

2. 1. 6. 6. Telmîh

Telmîh, hunereke edebî ye şaîr di helbesta xwe de tişt û kesên navdar û dîrokî tîne bîra mirov.

Ji Ke‘bâ Munewwer Xudê leylekê (44/1).

Bire Mescîdu‘l-Eqşâ ew lehzekê (44/2)

Ji bo bûyera Îsrayê û Mî‘racê telmih heye. Lewra ev risteyên han bûyera Îsra û Mî‘racê tîne bîra mirov.

Zuhûrbûnâ Mehdî xurûcâ Decâl (87/1)

Dê nâzil bî, ‘Îsâ ji bo zîddelâl (87/2)

Zuhûra Mehdî û xurûca decal ‘elametên qiyametê ne. ji bo qiyametê telmih e.

We Ye‘cûc û Me‘cûc ku pirr heybet in (90/1)

Digel Dabbetulerdî, roj derketin (90/2)

Derketina Ye‘cûc û Me‘cûc û Dabbetulerdî elametên qiyametê ne. ji bo qiyametê telmih e.

Ji mexrib ve, ew ku ji wê derkevit (91/1)

Derê tewbe‘ê dê li me dâkevit (91/2)

Ji mexrib ve derketina tavê, ‘elameta qiyametê ye. ji bo qiyametê telmih e.

2. 1. 6. 7. Tekrîr

Hunera dubarekirinê ye. Eger ku di yekeya helbestekê de peyvek an peyvî du sê caran bêne dubarekirin, li wir hunera tekrîrê heye.

Îbrâhîm û Mûsâ û ‘Îsa û **Nûh**

Bi tertîbê efîdeltir in pêşê **Nûh**

(b/52)

Keşîru‘l-heyâ be qelîlul **ezâ**

Keşîru‘ş-şelâh û hemîlul **ezâ**

(b/18)

2. 1. 6. 8. Întaq

Întaq, dayînaqisedana xeyrînsanan e. Eger ku ji bilî mirovan hebûnek
bi axîfe li wir întaq heye.

‘Îlâcê evân e xeber qeṭ nedân

Mudâmî **zîkir bi qelb** û lisân

(b/139)

Ew e nef’ê ezmânê te ey zekî

Ku cârek **bixwûnî bi wî ‘ilmekî**

(b/206)

2. 1. 6. 9. Nîda

Hunera edebî ya denglêkirin an jî gazîkirinê ye. Bi piranî bi peyvên weke “gelî,
hey, lo, lê, ey, ya, eya” tê bikaranîn:

Li ser te ji ferzân e, **ey** nûrê cân (3/1)

Hurûf û luget ḥadîs in, **ey** ḥekîm (20/2)

Tunînin, **eyâ** mu’mînê cân fedâ (85/2)

Li wî bûne mu’mîn, **eyâ** mustemî‘! (113/2)

Digel te gelek têtin **ey** multecî (157/1)

Ew e nef’ê ezmânê te **ey** zekî (206/1)

Bi ṭîrs û bi hêvî **eyâ** zû’r-reṣâd (247/1)

2. 1. 6. 10. Tezat

Di vê hunerê de du peyvên dijî hev bihev tene bikaranîn.

Ne ewwel ne âxir ne zîdde e wî (11/1)

Îrâdet digel qudretê xeyr û şer (18/2)

Ji ketmê ‘edem ‘âlem ânî wucûd (25/1)

Ne kurt û dirêj û ne zexm û ze'îf (40/2)

2. 1. 6. 11. Îstîfham

Hunera pirsê ye. Gelek caran ev pirs ne li hêviya bersivê ye.

Li kesbê herâmê **çirâ** derdidey? (197/1)

Ji bo çî tû vî le' b û lehwê dikey? (200/1)

Heçî kû bi nef'e **çirâ** dê nekey? (200/2)

2. 1. 6. 12. Alîterasyon

Ev huner bi dubarekirina dengên bêdeng çêdibe.

Di ber zâdê, pîşê tû destân bişo

Wekî **ku** bi **kevçik** bixwî qeş meşo

(b/224)

Bi nânî tu destê xwe pîqij **meke**

Bi **kêrê** û destek tenê **ker** meke

(b/237)

2. 1. 6. 13. Asonans

Bi dubarekirina dengên dengdêr hunera asonansê çêdibe.

Ewe şa'etê wî herâmê **nexwey**

Ji **neh** pîriyân zêdetir tu **nexwey**

(b/214)

Ew e nef'ê fercê cimâ ' pê **bikey**

Weled jê bibin, **lezzetê** jê **bikey**

(b/215)

Ji bo te **Xudê** çêkirin ev **nimêj**

Ew in ê nehêlin bibî tu **qirêj**

(b/245)

2. 2. ZIMANÊ WÎ

Ji bo ku em gencîniya zimanê Mele Xelîl ya di vê berhema wî ya *Nehcu'l-Enamê* de fêhm bikin divê ku em di serî de li zimanê vê berhema wî meze bikin.

“Berhema *Nehcu'l-Enam* bi Kurmancîyeka vekirî û helbestkî hatiye nivîsandin. Hemû bi kêş û qafîye ne, rêz bi yazdeh kiteyan dikişin û her du rêz jî, bi yek qafîyeyê ne. Herweha qalibê kite û qafîyeyên wê jî, mînanê yên Mewlûda Melê Batê ye.”¹⁶² *Nehcu'l-Enam* li Kurdistanê baş hatiye naskirin û zarokên kurd vê eserê dixwînin û jiber dîkin û li her cihê jê jêderkan digrin.¹⁶³ Bi babet û naveroka xwe ve, talîm û terbiye û şîret in. Bi şîirtî û bi zarê kurmancî hatiye nivîsîn. Bi fesahet û rûmeta xwe ya xezeltiyê ve, dilê her xwendevanî xweş û geş dike.¹⁶⁴ Zimanê Mele Xelîl yê di berhema xwe ya *Nehcu'l-Enamê* de bikaraniye li gorî zimanê klasîkên Kurdî yên din gelek hêsan û zelal e. Zimanekî fêmkirî ye. Li gorî zimanê Melayê Cizîrî û Ehmedê Xanî gelek hêsanîr e. Herwekî ku zimanê Feqiyê Teyran gelek hêsan û zelal e.

Bo nimûne:

Tu gûhdêr e nutq û beyana fesîh

Ji boferz û ‘eynan e, merdê melîh

(b/1)

Ku îman û îslam û sewm û selat

Li ser malidaran e hec û zekat

(b/2)

Li ser te jî ferzan e ey nûrîcan

Bizane tu erkan û şertê di wan

(b/3)

¹⁶² Zeynelabidin Zinar (Kaya), “**Nimûne Ji Gencîneya Çanda Qedexekirî**”, Çapa Pêşî, Stockholm / Swêden 1991, http://www.Nimûne_Ji_Gencîneya_Çanda_Qedexekirî.com, (Tarîxa Têgihîştinê: 7 Tîrmeh 2015)

¹⁶³ Zeynelabidin Kaya (Werger), **Nehc-ul Enam, Mele Xelîlê Sêrtî**, Stockholm: Wêşanxana Kurdistan, 1988, http://www.Nimûne_Ji_Gencîneya_Çanda_Qedexekirî.com, (Tarîxa Têgihîştinê: 7 Tîrmeh 2015), r.6.

¹⁶⁴ Kaya, **b.n.**, r.6.

Ji herba sehaban meke qal û qîl

Bihiştîn e ew, qatîl û hem qetîl

(b/64)

Li ser zadê rûne bi terz û edeb

Piyê rastê rake û razîne çep

(b/225)

Ne razê ne palde dema xwarinê

Ne bê hiş be ba fexr û pir xwarinê

(b/226)

Ehmedê Xanî, herwekî ku di berhema xwe ya Mem û Zîn'ê de diyar kiriye, berhema xwe bi sê devokên (Bohtî, Mehmedî û Silîvî) ji hev cûda yên kurmanciya jorîn ve nivîsiye û devokên ku bi karaniye di helbestên xwe de diyar kirine.

Bohtî û Mihemmedî û Silîvî

Hin le'l û hinek ji zêr û zîvî¹⁶⁵

Kadri Yıldırım jî di vê mijarê de weha dibêje: “ Di nivîsandina berhema Mem û Zînê de tercîha Ehmedê Xanî ya pirdevokiyê, bi mebesta nêzîkirina hev a van devokên navborî bixwe ye. Ev jî, şêwazeke zanistî ye.”¹⁶⁶

Lê Mele Xîlîl, devoka zimanê ku di berhema xwe ya Nehcu'l-Enamê de bi karaniye herwekî Ehmedê Xanî diyar nekiriye. Ji ber vê yekê ji bo ku em devoka zimanê Mela Xelîl bizanibin û derxînin holê, divê ku em li ser zimanê berhema wî ya Nehcu'l-Enamê rawest in.

¹⁶⁵ Ehmedê Xanî, **Mem û Zîn**, (Amd. M. E. Bozarslan), Stenbol: Gün Yayınları, 1968, r. 460.

¹⁶⁶ Ehmedê Xanî, **Mem û Zîn Çeviri ve Kavramsal Tahlili**, (Amd. Kadri Yıldırım), Stenbol: Wêşanxaneya Avesta, 2010, r. 64.

2. 2. 1. Taybetiyên Devoka Botî û Hekkarî

Di serdemên klasîk de, herî zêde devoka Botî, devoka Hekkarî û Behdînî rengên xwe dane helbestê. Em dikarin bêjin ku ev devokên han di edebiyata klasîk de bûne zimanê standart.¹⁶⁷ Di edebiyata klasîk ya Kurdî de berhemên herî baş bi devoka Botî û Behdînî hatine nivîsandin. Mînak; Melayê Cizîrî dîwana xwe bi devoka Botan ya ser bi devoka Behdînî nivîsandiye. Ehmedê Xanî jî her çiqas Serhedî ye jî, devoka berhemên wî bi ser devoka Botan ve diçe. Meriv vê bandorê divê weke bandora Melayê Cizîrî bibîne.¹⁶⁸ Lê tiştekî wuha rast e û nayê veşartin; di nava zaravayêd Kurdî de, naha beşa zaravê Botanî pêşvatir e.¹⁶⁹ Nivîskarê berhema *Nehcu'l-Enamê* Mele Xelîl (k.d.1843), nivê jiyana emrê xwe li herema Hîzana Bedlîsê derbas kiriye. Ev herem her çiqas heremek Serhedî be jî ji ber ku Hîzan di sînore herema Serhedî, Botî û Hekkarî de ye, ji aliyê devoka zimên ve ji devoka Serhedê zêdetir diçe ser bi devoka Botî û Hekkarî. Jixwe nivîskar nivê dawîya jiyana emrê xwe yê mezin jî li herema Botî yanê li Sêrtê derbas kiriye. Gava ku mirov li herema nivîskar mêze dike, mirov dibîne ku ev herem cîh û warê edebiyatya Kurdî ya klasîk e. Lewra li vê heremê Feqiyê Teyran (k.d.1650), nivîskarê mewlûda Kurdî Mela Huseynê Bateyî (k.d.1491) û Ehmedî Xanî (k.d.1706) jî ji vir derketine. Jixwe me li jor jî diyar kiriye ku ev herem ji hêla zimên ve di bin bandora Melayê Cizîrî (k.d.1481) de maye.

Taybetmendiya devoka Botî û Hekkarî ya herî tê zanin ew e ku tîpa “t” tê dawîya lêkeran. Herwekî; bibit, dibit, nabit, diket, naket, divêt, bivêt, navêt.

Bo nimûne:

Welêkin qe yek bê yekî **nâbitin**

Musilmânî bê herduwân **nâbitin**

(b/6)

Eşer kû li fi‘lan muretteb **dibit**

Bi îcâd û fi‘lâ wî peydâ **dibit**

(b/78)

¹⁶⁷ Önder Beyter, “*Dîwana Mela Ehmedê Heyderî*”, (Teza Mastirê ya Neçapkirî, Enstîtûya Zimanên Zindî ya Zanîngeha Artûklû ya Mêrdînê, 2012), r. 44.

¹⁶⁸ Bamed Serdar, *Dîwana Şêx Şemsedînê Exlatî*, Stenbol: Wêşanê Nûbiharê, 2015, r. 52.

¹⁶⁹ Ebdullah M. Varlı, *Dîwan û Jîrewarî ya Xanî*, Ankara: Wêşanên Sîpan, t.n., r.17.

Ecel her yek e, gerçi kuştin **bitin**

Qe şolek li wî nâbî wâcib **bitin**

(b/81)

Ji pîş hefti sâlân neqil dê **bibit**

Di qebrâ Nebiyyê me medfûn **bibit**

(b/89)

Xudê dê ewan fâniyan ‘ewde **ket**

Bi ‘erââ ôisâbâ xwe hâzir **biket**

(b/98)

Hisâbâ gunehân ji xelqê **biket**

Xerâbân û qencân pê ferq **biket**

(b/101)

Evân dê bi feqlâ xwe derbâz **biket**

Ewân dê di nârî de wâqî‘ **biket**

(b/102)

Zulm nîn e ‘edl e, heçî ku **biket**

Di mulkê xwe de ew teserruf **diket**

(b/105)

Mu‘ezzeb diket yânê âzâ **diket**

Ji wî rânî xelq jê şefâ‘et **diket**

(b/108)

Heçî ku li ser wê ‘eqîdê **nebit**

Ji ehlê fesâdê û bid‘et **dibit**

(b/121)

Qe nef'ek li te bê Xudâ **nâbitin**

Ji bil hebte'et riyâ **nâkitin**

(b/143)

Tu tezyînê bâvê bilâ te **bivêt**

Bi rehgartinâ te, xudânî **nevêt**

(b/145)

Li ser qencyê mu'tme'in jî **dibit**

Û râzî û merzî û kâmil **dibit**

(b/168)

Zikê te te'âmê dixwe hel **diket**

Ji 'uzwânî xwûn û menî pir **diket**

(b/211)

Taybetmendiyeke devoka Botî û Hekarî ya din, Xwedê/Xweda herwekî ku Xudê/Xuda tê bilêvkin.

Bo nimûne:

Xudê (10/2, 44/1, 47/2, 98/1, 141/1, 165/1, 169/2, 173/2, 177/1, 196/1, 197/2, 217/1, 230/1, 245/1, 251/1, 264/2), **Xuda** (14/2, 33/1, 76/1, 85/1, 106/2, 109/2, 115/1, 143/1, 145/2, 178/1, 180/2, 250/2).

Tu me'bûdê bilheq tu ne ji bil **Xudê** (10/2).

Ne hemkûf û mewt û zewâlâ **Xudâ** (14/2).

Mu'hemmed Resûl e, **Xudâ** ew hinâr (33/1).

Ji Ke'bâ Munewwer **Xudê** leylekê (44/1).

Taybetmendiyeke din, taybetmendiya peyva “**dî**” ye. Li gorî devoka Bohtî û Hekarî, di dewsa peyva “**din**” de ya “**dî**” tê bikaranîn.

Bo nimûne:

Di Qurânê bîst in digel heştê **dî**

Kutub sed temâm in digel çarê **dî**

(b/67)

Taybetmendiyek din, taybetmendiya peyva “şol”ê ye. Ev bêje di wateya “hal, hereket, reweş, fî’l û emel” de ye, di devoka Bohtî û Hekkarî de gelek tê bikaranîn.

Bo nimûne:

Hinek jê xewâşin welê her yekî

Vebuhtî kirî wî ji bo **şolekî**

(b/28)

Murîd e ji bo xeyr û şerrân, welê

Rizâ Wî tunîne bi **şolâ** nelê

(b/19)

Ji pâşî ku zânî te ev wâcibât

Tu gûhdêr e **şolê** di mustehsenât

(b/152)

Taybetmendiyek devoka Bohtî û Hekkarî ya din, taybetmendiya peyva “nik” û “digel” ê ye.

Bo nimûne:

We ye’cûc û Me’cûc kû pirr heybet in

Digel Dabbetulerdî, roj derketin

(b/90)

Di Qurânê bîst in **digel** heştê dî

Kutub sed temâm in **digel** çarê dî

(b/67)

Bi destê, herâmê kitâbet meke

Bi **nik** zâlimî ve qe meşyê meke

(b/218)

Taybetmendiyeke devoka Bohtî û Hekkarî ya din, taybetmendiya qertafên herwekî ku, “key, dey, ey” tên dawiya lêkeran. Lêkerên herwekî “bikey” (b/7, b/9, b/83, b/114, b/142, b/158, b/159, b/162, b/215, b/236, b/252), dikey (b/8, b/142, b/159, b/162, b/178, b/200, b/212), tewbekey (b/172,), nekey (b/172, b/178, b/200, b/209, b/236), terkdey (b/179), derbidey (b/179), derdidey (b/198), didey (b/198), nexwey (b/215)

Bo nimûne:

Tu me‘nâyê şehdê kû bâwer **bikey**

Telefuz eger qâdirî, pê **bikey**

(b/7)

Ji kufre tu bê şek xwe xâric **dikey**

Welê eşlê dînî tu hâşil **dikey**

(b/8)

Wekî ku digel wê ‘emel jî **bikey**

Tu îmân û Îslâmê kâmil **dikey**

(b/9)

Ji ‘îşyânê ferz e tu zû **tewbe key**

Bi terkê, gunâhê di xwe pir **nekey**

(b/172)

Li kesyâ herâmê çirâ **derdidey**?

Wedî’â Xudê ne tu zâyî‘ **didey**

(b/198)

Ew e tî'etê wî herâmê **nexwey**

Ji neh pêriyân zêdetir tu **nexwey**

(b/215)

2. 2. 2. Peyvên Kurdî yên Resen

Emilandina peyvên resen ji bo hêz û quweta berhemê gelek muhîm in. Lewra vegotina zimanê berhemê zelal û delal dike û nahile di zimên û me'nayê de alozî derkeve. Di berhemê de çiqas peyvên resen zêde bin, bi wê qasî hostatî û mehareta nivîskar ya di warê zimên de nişan dide. Di vê çarçoveyê de dema ku em bala xwe didin Nehcu'l-Enama Mele Xelîl, em dibînin ku nivîskar di berhema xwe de gelek zêde peyvên resen ên Kurdî bikaranîne.

Bo nimûne;

Gûhdêr, bawer, şol, sipartin, Xuda, pêşiwar, kurt, dirêj, zexm, reş, spî, sorekî, esmerî, rih, birh, roj, şev, pêş, paş, wekî, geha, dî, nedî, nik, bêhtir, qenc, cûwan, war, mizgînî, wehareng, bihişt, “hinar”¹⁷⁰, dakevin, agir, rehgartin, dujîn, ken, xet, av, Mijûlî, “destegîr”¹⁷¹, naskirin, dil, can, lezkirin, xerabî, bê hêvi, “peşîman”,¹⁷² dewlemend, qewî, bexîl, xwendin, nexesma, xwarin, vexwarin, digel, piy, rast, çep, rake, razîne, paldayîn, dem, hiş, pir, hinek, sar, kelakel, jorê, firax, ser, tucar, nan, dest, paqij, kêr, dest, “ker”¹⁷³, hûrbûyî, mêhvanî, şîrîn, hingiv, nimêj, rû, dilşadî, gotin, zarûwan.¹⁷⁴

Bo nimûne:

Tu me'nâyê şehdê **ku bawer bikey** (7/1)

Nusûsê ku dâllin li **şolâ** mehâl (15/1)

Mue'ewwel-ke **mespêre** ehlê delâl (15/2)

Muhammed Resûl e, **Xudâ ew hinâr** (33/1)

Ji bo îns û cinn û melek **pêşiwar** (33/2)

Ne kurt û dirêj û ne zexm û ze'îf (40/2)

¹⁷⁰ Hilbijartin

¹⁷¹ Mehkûmî, hepiskirin.

¹⁷² Poşmanî

¹⁷³ Bi mana kerîkirinê ye. Mînak; nan kerîke, yanê nan qet bike.

¹⁷⁴ Zarok.

Ne reş bû, spî sorekî esmerî	(41/1)
Mudewwer wech û rihên enwerî	(41/2)
Ewî çav û birhê mukehêhel hebûn	(42/1)
Bi roj û bi şev hem li pêş û li pêş	(43/1)
Bi qabê dû qewsân bi bâl Wî gehâ	(46/2)
Bi rûh û cesed ve birin ew suwâr	(47/1)
Bi çavê serê xwe Xudê dî dû câr	(47/2)
Di dunyâyê kes dî, ji bil wî nedî	(48/1)
Di ‘uqbâyê mu’min dibêjin me dî	(48/2)
Tefâzûl ji bo wân ji nik xwe mebîn	(50/2)
Di pêve xewâşê melek, bêhtir in	(53/2)
Ji ‘âmê melek qencê me ey cûwân	(54/1)
Evânânî sih sâl xilâfet bi wâr	(58/2)
Sebeb wê ku mizgîniyâ cennetê	(61/1)
Wehâ reng e ezvac û ‘itrâ Resûl	(63/1)
Derê tewbe’ê dê li me dâkevit	(91/2)
Muheqqeq nihin ew ji bo âgirî	(107/2)
Nezânînâ xeş’ê di fehwâ kelâm	(138/2)
Mijûlî ji ‘eybâ xwe pirtir mebe	(148/2)
Imâm û xizm, sâlih û destegîr	(151/2)
Bi dil cân xelâfê di wê nâs bike	(153/2)
Ku qencî kete qelbê te lez bike	(163/1)
Eger ew ji rehîmê wî bê hêviye	(169/1)
Ewe tewbeyâ te, peşîmânî bî	(172/1)
Eger dewlemendek qewî şâkirî	(175/1)

Heçî ku dixwûnî ji bo Wî bixwûn	(194/1)
Di ber zâdê, pâşê tu destân bişo	(224/1)
Wekî ku bi kevçik bixwî qeş meşo	(224/2)
Li ser zâdê rûne bi şerz û edeb	(225/1)
Piyê râstê râke û râzîne çep	(225/2)
Ne râzê, ne pâlde demâ xwârinê	(226/1)
Ne bêhiş be, bâ fexr û pir xwârinê	(226/2)
Hinek xuwê di ber zâdê, pâşê bixwe	(227/1)
Ku goştgirtinâ te ji herâmê bitin	(228/1)
Ji ewwel ve sâr ke, kelâkel mexwû	(232/1)
Ji nâv hindî û jorê firâgê mexwe	(232/2)
Serê xwe mebe ser firâgê tucâr	(233/1)
Bi nânî tu destê xwe pâqij meke	(237/1)
Bi kêrê û destek tenê ker meke	(237/2)
Hilîne heçî hûrbûyî ber piyân	(238/1)
Ji mêhvâniyê re edeb pirtir in	(239/1)
Di sê câr bihên de, bi mêhtin vexwe	(240/2)
Ji fêkî tu birhê bide ê şîrîn	(242/1)
Ji bo te dewâ' in wekî hingiv in	(242/2)
Ji bo te Xudê çêkirin ev nimêj	(245/1)
Wekî kû rehâbûyî dilşâdi be	(253/1)
Dû sê lefz gotin ji bo zârûwân	(262/1)

2. 2. 3. Biwêjên ku di Berhema Nehcu'l-Eanamê de Hatine Bikaranîn

Ji bo ku mirov di helbestê de biwêj û gotinên pêşiyên bikarbîne, divê mirov baş hakimê wî zimanî be. Divê mirov bi awayekî baş peyv û biwêjan bikarbîne û cûdatiyên piçûk ên di navbera wateya ferhengî û biwêjî ya bêjeyan de ye bizanibe.¹⁷⁵ Mele Xelîl jî, ji bo ku vegotinê bihêztir bike, di vê berhema xwe de zêde ji biwêjan (îdyoman) sûd wergirtiye.

Biwêjên (îdyomên) ku di Nehcu'l-Enamê de hatinîn bi karanîn ev in:

Nuq̤ û beyânâ feşîh	1/1	Merdê melîh	1/2
Nûrê cân	3/1	Muţî'bûn	5/2
Bâweriyâ dil	5/1	Xwe xâric dikey	8/1
Ĥâşil dikey	8/2	Guh bidê	10/1
Kâmil dikey	9/2	Zewâlâ Xwudâ	14/2
Ji nefsa te nêzîktirînnê te ye	16/1	Xebîrê bi ef'âl û qewlê te ye	16/2
Qudretâ xeyr û şer	18/2	Ketma 'edem	25/1
Serwerê etqiyân	35/2	Tuxmê 'Ereb	37/1
Qîmetek mu'tedil	40/1	Rihên enwerî	41/2
Birhê mukehşhel	42/1	Îmâmê ewê 'âlemê	45/2
Çavê serê xwe	47/2	Şâhibê Zûlfeqâr	58/1
Xilâfet bi wâr	58/2	Meke qâl û qîl	64/1
Def'â belâyê	71/2	Diken melhemê	72/2
Ixtiyârî bi dest e	76/2	Ji meşlehet	80/2
Ṭâ'et bikey	83/1	Tenâsux ji rûhî hûlûlâ Xwedâ	85/1
'Elâmet ji bo sâe'tê	86/1	Derê tewbe'ê	91/2
Cismê fenâ	97/1	Dirêjket Şirâṭe li ser âgirê	99/1
Ji hewâzê vexwûn	93/1	Ĥemîmê vexwûn	93/2

¹⁷⁵ Beyter, **b.n.**, r. 46.

Mulkê xwe de ew teserruf diket	105/2	Ji ‘erdê hetâ Sidretu’l-Muntehâ	115/2
Ji behrâ‘edem	116/2	Pê qâilin	120/1
Ji ehlê fesâdê û bid‘et	121/2	Ehlê qiblê	122/1
Kâfirê dîn beğâl	122/2	De‘wâ Xudâyê meke	125/1
Emrâzê dil	128/1	Bexîlî kirin	130/2
Herîfî kirin	137/2	Zîkir bi qelb û lisan	139/2
Tekebbur meke	141/1	Şebrê bike	144/2
Şâhê Emîn	146/2	Mirovî ne meħrem	148/1
Mijûlî ji ‘eybâ xwe	148/2	Mucerrred bike qelbê xwe ji mâsiwân	154/1
Ġâfil meke	155/1	Ihsân û luţfê bibînî	156/2
Ġâfil bikey	161/2	Lewmê li te ew diket	167/2
Muţme’in jî dibit	168/1	Kâmil dibit	168/2
Reħmâ wî bê hêviye	169/1	Muħibbê Xudânê xwe	180/2
‘Ilm e, bixwûne	191/1	‘Îlâcâ dil	192/1
Dârê dunyâ	193/2	‘Îtâbê bike	198/2
‘Âlemê ‘ibretê jê bigirî	201/2	Nuţqâ selis	204/2
ţâhir bike	219/1	Bê hiş be	226/2
Goştgirtinâ te j’herâmê bitin	228/2	Tâlibê tiştê xweştir	229/2
Nâvê Xudê bîne	230/1	Dest pê bike	241/1
Dewâ’ in wekî hingiv in	242/2	Żebţ bike	246/1
Bi qelbek guşâd	247/2	Ġâfil bikey	252/1
Qehrê bikey	252/2	Bi dil gûh bide	259/1
Xelîlî qe ev çerz bi zâ‘et nebû	261/1	Welê ew bi fermânâ exxê xwe bû	261/2
Pê muntefi’ bin ‘ewâm	263/2	Bi luţfâ xwe key	265/1
Muyesser bikey	265/2	Nefsâ me yâ bed ‘emel	266/1
Bi şidq û şefâ	273/1		

2. 2. 4. Unsûrên Erebi, Farisî û Tirkî

Edebiyata Kurdî ya klasik di bin bandora zimanên Erebi û Farisî de maye. Carcaran zimanê Tirkî jî dikeve nav. Herweha zimanê vê berhema nivîskar ya *Nehcu'l-Eanamê* jî di bin bandora van zimanan de maye. Lê rêjeya wan ne yek in. Bandora Erebi gelek zêde ye. Ya Farisî hindik e, ya Tirk jî hema tune.

2. 2. 5. Unsûrên Erebi

Di vê berhemê de piştî zimanê Kurdî, zimanê ku ji aliyê rêjeyê ve herî zêde hatiye bikaranîn Erebi ye. Erebi him ji aliyê bêjeyan û him jî ji aliyê hevokan ve di vê berhemê de gelek cih girtiye. Mele Xelîl, him ji ayetan û him jî, ji hedîsan îqtîbas kiriye.

2. 2. 6. Peyvên Erebi

Di berhema *Nehcu'l-Eanamê* de gelek peyvên Erebi hatine bikaranîn:

Nuq, beyân, feşîh (1/1), ferz, 'eyn, melîh (1/2), îmân, Îslâm, şewm, şelât hecc, zekât (2/1), ferz, nûr (3/1), erkân, şerî (3/2), hukm, şer'î, muhtâc, munqâd (4/1), muftî' zâhir (5/2), welêkin, musilmân (6/2), me'nâ, şehd (7/1), teleffuz, qâdir (7/2), kufr, şek, xâric (8/1), eşl, dîn, hâşil (8/2), me'bûd, bilheq (10/2), wucûd, 'eyn, zât (12/1), ewwel, âxir, zidd (12/1), mişl, zehîr, wezîr, mekân (13/1), mânî', mu'în, cihât, zemân (13/2), cîsm, cewher, nûr, 'erež (14/1), zû lewn, miqdâr, şekl, merež (14/2), ewlâd, zewcet (15/1) mewt, zewâl (15/2), nusûs, dâll, mehâl (16/1), mue'ewwel, ehl, delâl (16/2), nefis (17/1), xebîr, ef'âl, qewl (17/2), şifât, seb'e, ezel (18/1), 'eyn, geyr (18/2), heyât, 'ilm, sem', beşer (19/1), îrâdet, qudret, xeyr, şer (19/2), murîd (20/1), rizâ (20/2), kelâm, besît, qedîm (21/1), hurûf, luğet, hâdiş, hekîm (21/2), Qurân, geyr, mensûx (22/1), hukm, mubeddel (22/2), qiyâmet (23/1), 'uqbâ (23/2), simât, neqs, mewcûd (24/2), şer' (25/1), mehâl (26/1), mue'ewwel, ehl (26/2), nefis (27/1), ef'âl, qewl (27/2), cin (31/1), şeytân, nâr, newâ (31/2), cennet (33/1), ehl, xizmet (33/2), resûl (34/1), melek (34/2), dîn, mensûx (35/1), fezil (35/2), xâtîm, enbiyâ (36/1), serwer, etqiyâ (36/2), 'Ebdullâh, Âmîne (37/1), Medîne, Meke, mewlid, medfin (37/2), nubuwwet (38/2), resul (39/1), qebûl (40/1), qîmet, mu'tedil, leţîf (41/1), ze'îf (41/2), mudewwer, wech, enwer (42/2), mukehhel (43/1), şeyb (43/2), hâşâ, inkâr (44/2), Ke'b, munewwer, leyl (45/1), Mescîd, lehzek (45/2), enbiyâ (46/1), 'âlem (46/2), Sidretu'l-Muntehâ (47/1), qâb, qews (47/2), rûh, cesed, (48/1), dunyâ (49/1), mu'min (49/2), 'âlî (50/1), heqîqet (50/2), îmân (51/1), tefâzul (51/2), neşş (52/1) 'Îsa, Nûh (54/1), tertîb (54/2), xewâş (55/2), 'âm (56/1), hori

(56/2), Fâtîme (57/1), ‘Â’îşe, bâqî (57/2), Ebûbekr, ummet (58/1), kufr, sâ‘et (58/2), ‘Emer (59/1), Fârûq, ‘Uşmân (59/2), ‘Elî, şâhib, Zûlfeqâr (60/1), xilâfet (60/2), Se‘d, Zubeyr, Se‘îd (61/1), ‘Ebdurrehman, şehîd (62/1), Təlhet, ‘Ubeyd (63/1), ‘Eşru‘l-Mubeşşer (63/2), Sebeb (64/1), hezret (64/2), Bedr, Uğud, bey‘et (65/1), muheqqeq (65/2), ezvac, ‘itrâ (66/1), eşhâb, erc, duxûl (66/2), herb, qâl, qîl (67/1), qâtil, qetîl (67/2), enwâ‘, kufr, şerr (68/2), Qurân, kutub (69/1), xâric (69/2), ‘ebdâr (70/1), qism (70/2), kerâmet (71/1), heqq, zidd (71/2), du‘â, eser (72/1), def‘, belâ (72/2), Xizr, Ilyâs (73/1), lec (74/1), ‘inâd, Xâliq, cumle, fi‘l (76/1), ixtiyâr (76/2), mubdi, kâsib (77/1), cezâ, tâlib (77/2), muretteb (78/1), icâd (78/2), ‘illet (80/1), xâlî, meşlehet (81/1), ecel (81/2), wâcib (82/1), şefqet (83/1), sebeb, tâ‘et (83/2), ricâ, qebûl (84/2), herâm, hîl, rizq (85/1), mu‘eqqeb (85/2), tenâsux, rûh, hülûl (86/1), mu‘mîn, fedâ (86/2), Mehdî, Decâl (87/1), nâzil (87/2), nebi (88/1), neqil (89/1), qebr (89/2), Ye‘cûc, Me‘cûc, heybet (90/1), Dabbetulerd (90/2), mexrib (91/1), tewbe‘ (91/2), fitne, te‘wîz (92/2), ‘ezâb, su‘âl, qebr, heşir (93/1), hisâb, mîzân, neşir (93/2), hevz, nâr, heq (94/1), sihir (94/2), esman (95/1), eşyâ, fenâ (96/1), ‘ewde (96/2), eczâ‘ (97/1), ‘eş‘eş, meşşûr (97/2), wedi‘ (99/2), guneh, xelq, xerâb, ferq (101/1), derb (101/2), wâqî‘ (102/1), hemîm (103/1), kâfir (104/1), mulk (105/1), muheqqeq (107/1), mu‘ezzzeb (107/2), şefâ‘et (108/2), şehd, me‘ne, bittemâm (109/2), lefz, meşhur, beyne‘l-‘ewâm (110/1), teşdîq (111/2), qed, âtânâ, werâ (112/1), muctemi‘ (112/2), eyâ, mustemi‘ (113/1), şey‘, înkâr (113/2), dîn, cefâ‘ (114/1), xelq (114), ‘erd (115/1), iz‘ân, zerre (115/2), behr, ‘edem, bâri, (116/1), mezâhib, îmâm (116/2), Nu‘mân, Eħmed, Mâlik (117/2), Şâfi‘i, rukin (118/1), Eş‘erî (118/2), eqîde, (119/1), heq, bâtil (120/1), mezheb, ‘er (130/1), şehwet, sû‘i zen (131/1), le‘în (132/2), muretteb, e‘zâ (133/1), lisân (133/2), kelâm, beğâl (134/1), xuşûmet, mirâ‘, cidâl (134/2), şin‘et, xeber, fehş (135/1), le‘net (135/2), yemîn (136/1), ğinâ, şî‘r, we‘dâ, emîn (136/2), ğeybet, medh, zem (137/1), cewâb, ‘ewâm (138/1), xeğ‘, feğwâ (138/2), ‘îlâc (139/1), zikir, qelb (139/2), ħirş, qenâ‘et (140/1), meğsûd (140/2).

Bo nimûne:

Tu guhdêr e **nuğq** û **beyânâ feşîh**

Ji bo **ferz** û ‘eynân e, merdê **melîh**

(b/1)

Ku **îmân** û **Îslâm** û **şewm** û **şelât**

Li ser mâlidârân e **hecc** û **zekât**

(b/2)

Li ser te ji ferzân e, ey **nûrê** cân

Bizâne tu **erkân** û **şertê** di wân

(b/3)

Heçî **hukmê** **şer‘î** tu **muhtâc** dibî

Ji bo zânînâ wî, tu **munqâdi** bî

(b/4)

Tu **îmânê** bâweriyâ dil bizân

Mu‘î bûn e **Îslâm**, bi **zâhir** bizân

(b/5)

Welêkin qe yek bê yekî nâbitin

Musilmânî bê herduwân nâbitin

(b/6)

Tu **me‘nâyê** **şehdê** ku bâwer bikey

Telefuz eger **qâdirî**, pê bikey

(b/7)

Ji **kufre** tu bê **şek** xwe **xâric** dikey

Welê **eşlê** **dînî** tu **hâşil** dikey

(b/8)

Wekî ku digel wê **‘emel** jî bikey

Tu **îmân** û **Îslâmê** **kâmil** dikey

(b/9)

Me‘anî ji bo wê ev in gûh bidê

Tu **me‘bûdê bilheq** tu ne ji bil Xudê

(b/10)

Wucûdê Wî ‘eyne ji bo **zâtê Wî**

Ne **ewwel** ne **âxir** ne **zidde** e Wî

(b/11)

Ne **mişl** û **zehîr** û **wezîr** û **mekân**

Ne **mânî‘** **mu‘în** û **cîhât** û **zemân**

(b/12)

Ne **cîsme**, ne **cewher** ne **nûr** û **‘erež**

Ne **zû lewn** û **miqdâr** û **şekl** û **merež**

(b/13)

Ne **ewlâd** û **zewcet** ne **bâb** û ne **dâ**

Ne **hemkûf** û **mewt** û **zewâlâ** Xwudâ

(b/14)

Nusûsê ku **dâllin** li şolâ **meḥâl**

Mue’ewwel-ke, **mespêre ehlê ḍelâl**

(b/15)

Ji **nefsâ** te **nêzîktirînnê** te ye

Xebîrê bi **ef‘âl** û **qewlê** te ye

(b/16)

Şifâtê di **seb‘e ezel** wî hene

Ne **‘eyn** ne **ğeyr** in, ne **wek êd** me ne

(b/17)

Heyât e digel ‘**îlm** û **sem**‘ û **beşer**

Îrâdet digel **qudretâ xeyr** û **şer**

(b/18)

Murîd e ji bo **xeyr** û **şerrân**, welê

Rizâ wî tunîne bi şolâ nelê

(b/19)

Ewê di **kelâmê besîfê qedîm**

Hurûf û **luget hâdiş** in, ey **hekîm**

(b/20)

Bi **Qurânê geyrî** wê **mensûx** bûn

Ewê **hukm** û xwendin **mubeddel** nebûn

(b/21)

Hetâ ve **qiyâmet** dê herdû hebin

Di ‘**uqbâyê** xwendâyê wê her hebin

(b/22)

Şifâtê kemâlê hemî **Reb** hene

Simâtê di **neqsê**, ne mewcûde ne

(b/23)

Ji **ketmâ** ‘**edem** ‘**âlem** ânî **wucûd**

Bi vî **wechê ehsen** wî **şâhê wedûd**

(b/26)

Tu **me‘dûm** û **hâdis** bizân e, e wê

Heyûlâ tunîn e, ku ‘**âlem** ji wê

(b/27)

Melâik ji bo Wî hene bê ‘**eded**

Mudâmî ‘**îbâdet** diken bê **meded**

(b/28)

2. 2. 7. Terkîbên Kurdî Bi Peyvên Erebi

Beyânâ feşîh (1/1): Me’naya vekirî û zelal.

Hukmê şer‘î (4/1): Hukûm û emrên li gorî şer‘etê.

Xebîrê bi ef‘âl (16/2): Yê ku xebera wî ji kirinan an fi‘lan heye (Xwedê).

Qudretâ xeyr û şer (18/2): Quweta ku xêr û şer di dest de ye.

Kelâmê besîfê qedîm (20/1): Kelamê ku bi şexsê xwe ma’nakî tenê ye, di ezel

de

Şifâtê kemâlê (23/1): Sifat an wesfên herî kemilî.

Ketmâ ‘edem (25/1): Xefîbûn tunîne, ku ‘edema mexfî ye.

Wechê ehsen (25/2): Wech û rûyê herî xweş

Şahê wedûd (25/2): Şahê ku herî tê hezkirin (Xwedê).

Neslâ Qureyş (37/1): Ji nesla an netewa Qureyşan (Hz. Muhemmed).

Tuxmê ‘Ereb (37/1): Yê ji nijada Ereban (Hz. Muhemmed).

‘Elî şâhibê Zûlfeqâr (58/1): Xwediyê şûrê Zûlfiqar (Hz. ‘Elî).

‘Eşru’l-Mubeşşer (60/2): Deh kesên ku behîştî ye.

Zuhûrbûnâ Mehdî (87/1): Derketina Mehdî.

Xurûcâ Decâl (87/1): Derketina Deccal.

Sidretu’l-Muntehâ (115/2): Cîhê ku herî dawî an nêzî Xwdê.

Kâfirê dîn beţâl (124/2): Kafirê bê dîn.

Kelâmê beţâl (134/1): Gotinên vala, beradayî an yên bi gunch.

Mudâmî zikir (139/2): Her daîm kirina zikre ye.

Şahê Emîn (146/2): Şahê ku pê bawerî tê kirin (Hz. Muhemmed).

Nefsâ emmâre (164/1): Nefsa ku têştên ne baş dixwaze.

Keşîru'l-heyâ (181/1): Pirhebûna edebê.

Qelîlu'l-ezâ (181/1): Eziyeta kêr

Nuqqa selis (204/2): Xeberdana rewan an herîkbar.

Eyâ zû'r-reşad (247/2): Ey kesê ku bi aqil û hêş

Qalibê gewherî (250/1): Qalibê cewherê.

'Elâ mâ hedâk (264/2): Ew tiştê ku te gihîştîye hîdayetê.

Le'înê munâfiq (268/2): Munafiqê hatiye qewirandin. (pelîd, şeytan)

Yevmî'l-qiyâme (270/1): Roja qiyametê

Yumnâ Muḥemmed (270/2): Aliyê Hz. Muhemmed ê rastê.

Tâbi'ê Muştefâ (273/2): Peyrewên Hz. Muhemmed.

2. 2. 8. Hevok û Terkîbên Kurdî Bi Peyvên Erebi

Zuhûrbûnâ Mehdî xurûcâ Decâl (87/1): Derketina Mehdî û Deccal.

Keşîru'l-heyâ be qelîlul ezâ (181/2): Pir bi şerm be, kêr bi eziyet be.

Keşîru's-şelâḥ û hemîlu'l-ezâ (182/1): Pir bi feyde be, li hemberî eziyetê helîm be.

Qelîlu'l-fesâd û keşîru'l 'emel (182/2): Kêr xirabyê bike, pir 'emelê salih bike.

Şedûqu'l-lisân û qelîlu'l-zelel (183/1): Rast bibêje, kêr xetan bike.

Qelîlu'l kelâm be qelîlu'l-fuzûl (183/2): Kêr kise bike, pêyvên lazim bibêje

Weqûrrun, şebûrun we berru'l-u'sûl (184/1): Giran be, bi sebir be, qencîkar be, ji 'eslan re, yanê wekî da û bab û qal û pîran re.

Ne le'ân û sebbab û nemmâm heqûd (185/2): Le'netkar, xeberok, nifirok, xebergerîn, fesad û kîndar nebe.

Ne miğtâb bexîl û 'ecûl û hesûd (186/1): Xîgbetker, bexîl, ecîl û hesûd mebe.

Muḥibbun li Rebbih û mubğiz lehu (186/2): Bibe hezkîrok ji bo Rebbê xwe yanê ji bo Wî ji kesî hezbike. Ji bo Wî ji kesî buxaz bike.

Leḥfu'l-kelâmi li men teḥtehu (187/1): Ji bo ku yê di bin destên te de ne, bila xebêrdanên te ji bo wan nerm û bi nezaket be.

Bi inşâfi be muḥsin-us seyyiât (188/1): Qenckiriyê xerabiyê be, dema te xerabî kir li pêy wê qenciyê bike.

2. 2. 9. Hevok û Terkîbên Erebi

Bi mâ qed âtânâ Resûlu'l-werâ (112/2): Tiştên ku Pêxemberê mexlûqatê aniye ji me re tu tesdîq bike.

Reḍiyyun şekurûn ḥelîmmun refîq (184/2): Aştî be, ne xeyzûk be, şukurdar be, di hember qenciyan de.

Heşâşun beşâşun 'efuwwun şefîq (185/1): Bi kêf û nermî, xwe wechê vegeŕî

Qelîlu'l-xilâfi wezu mu'êirât (187/2): Bila mûxalefeta te ji heqqê û rastiyê re hindik û bê zirar be. Ey xwediyê sûc û xeta! dema ku te xete kir 'înadê meke.

Ferîdun bi 'eybih 'enil 'âlemîn (188/1): Bi tenê be bi 'eybê xwe bi temamê 'alemê, yanê her 'eybê xwe bibîne, li 'eybên kesî nenê re.

Rehîmun şefîqun 'elez-ẓâlimîn (188/2): Rehm û şefqetê li zaliman bike.

2. 2. 10. Telmîh û Îşaretên ji Ayetan

Tu me'bûdê bilheq tu ne j'bil Xudê (10/2). Qur'an: Al-i 'Îmran, 3/62,64; A'raf, 7/59-65,73,85; Bakara, 2/83; Hûd, 11/2,26,50; Mu'mînûn, 23/23,32; Sad, 38/65.

Ne mişl û zehîr û wezîr û mekân (12/1). Qur'an: Şûra, 42/11.

Ne mânî' mu'în û cîhât û zemân (12/2). Qur'an: Îxlas, 112/2.

Ne ewlâd û zewcet ne bâb û ne dâ (14/1). Qur'an: Îxlas, 112/2-4.

Ne hemkûf û mewt û zewâlâ Xudâ (14/2). Qur'an: Fûrqan, 25/58.

Ji nefsâ te nêzîktirînnê te ye (16/1). Qur'an: Qaf, 50/16.

Xebîrê bi ef'âl û qewlê te ye (16/2). Qur'an: Al-i 'Îmran, 3/153, 180; Baqara, 2/234, 271; Maîde; 5/48; Tewbe, 9/26 û hwd.

Heyât e digel ‘ilm û sem‘û beşer (18/1). Qur‘an: Baqara, 2/29, 96, 110, 224, 233; Fûrqan, 25/58.

Bi Qurânê geyrî wê mensûx bûn (21/1). Qur‘an: Baqara, 2/106.

Ji ketmâ ‘edem ‘âlem ânî wucûd (25/1). Qur‘an: Yasîn, 36/82.

Muhammed Resûl e, Xudâ ew hinâr (33/1). Qur‘an: Qur‘an: Al-i ‘Îmran, 3/144; Ahzab, 33/40; Fetîh, 48/29.

Ji bo îns û cinn û melek pêşiwâr (33/2). Qur‘an: Sebe, 34/28.

Ji Ke‘bâ Munewwer Xudê leylekê (44/1). Qur‘an: Ahzab, 33/40.

Bire Mescîdu’l-Eqşâ ew lehzekê (44/2). Qur‘an: Îsra, 17/1.

‘Îlâcâ evân e xeber qeş nedân (139/1). Qur‘an: Ra’d, 13/28.

Mudâmî êikir bi qelb û lisân (139/2). Qur‘an: Ra’d, 13/28.

Bi tîrs û bi hêvî (eyâzu’r-reşad) (247/2). Qur‘an: Mu‘mînûn, 23/2.¹⁷⁶

2. 2. 11. Telmîh û Îşaretên ji Hedîsan

Li wî qîmetek mu‘tedil bû leîf (40/1). Tirmîzî, Şemaîl, 2, 7-8.

Ne kurt û dirêj û ne zexm û ze‘îf (40/2). Tirmîzî, Şemaîl, 2, 7-8.

Ne reş bû, spî sorekî esmerî (41/1). Tirmîzî, Şemaîl, 1, 18-19.

Mudewwer wech û rihên enwerî (41/2). Tirmîzî, Şemaîl, 1, 18-19.

E wî çav û birhê mukehhel hebûn (42/1). Tirmîzî, Şemaîl, 1, 18-23.

Ji deh fâne şeybâ wî, ne zêde bûn (42/2). Tirmîzî, Şemaîl, 1, 18-23.

Bi roj û bi şev hem li pêş û li pâş (43/1). Tirmîzî, Şemaîl, 1, 22-23.

Wekî yek didî, hêşê inkâr û hêş (43/2). Tirmîzî, Şemaîl, 1, 22-23.

Hemî enbiyâ lê cevân vê deme (45/1). Îbn-i Sa’d, I, 214.

Li wê bû îmâmê ewê ‘âlemê (45/2). Îbn-i Sa’d, I, 214.

Ji wê ew bire sidretul muntehâ (46/1). Buxârî, Bed’u’l-Xalq, 6.

¹⁷⁶ <http://www.kurandaara.com.com>, (Tarîxa Têgihîştînê: 7 Tîrmeh 2015)

Bi qâbê dû qewsân bi bâl wî gehâ (46/2). Buxârî, Bed'u'l-Xalq, 6

Bi rûh û cesed ve birin ew suwâr (47/1). Taberî, XXVII, 63; Muslîm, Îman, 292; Buxârî, Tefsîr 17/3, Eşrîbe 1, 12; Nesâî, Eşrîbe 41.

Bi çâvê serê xwe Xudê dî dû câr (47/2). Taberî, XXVII, 63; Muslim, Îman, 292; Buxârî, Tefsîr 17/3, Eşrîbe 1, 12; Nesâî, Eşrîbe 41.

Ji 'âmê melek qencê me ey cûwân (54/1). Tirmîzî, Feyzu'l-Qadir: 5/328.

Jinê dinyewî çêtirin ji horiyân (54/2). Tirmîzî, Feyzu'l-Qadir: 5/328.

Ji hindî jinan Fâtîme, pêve dâ (55/1). Ahmed b. Hanbel, el-Musned, 6/68

Li dû 'Â'îşê ne heçî mâ bâqî (55/2). Ahmed b. Hanbel, el-Musned, 6/68

Ebûbekr e efâeltirê ummetê (56/1). Ebu Dawud, Sunet 9, (4648, 4649, 4650).

Di kufrê neborândî yek sâ'etê (56/2). Ebu Dawud, Sunet 9, (4648, 4649, 4650).]

Di pê ve 'Emerê ku nâv dâniye (57/1). Ebu Dawud, Sunet 9, (4648, 4649, 4650).

Bi Fârûqi,'Uşm ân li pâşê wî ye (57/2). Ebu Dawud, Sunet 9, (4648, 4649, 4650).

Li dû wî 'Elî şâhibê Zûlfeqâr (58/1). Ebu Dawud, Sunet 9, (4648, 4649, 4650).

Evânâni sih sâl xilâfet bi wâr (58/2). Ebu Dawud, Sunet 9, (4648, 4649, 4650).

Hemî dâ û bâbê di peygemberân (62/1). Sunen-i Ebu Dawud,15/518.

Berîne ji enwâ 'ê kufr û şerrân (62/2). Sunen-i Ebu Dawud,15/518.

Di Qurânê bîst in digel heştê dî (67/1). Ahmed b. Hanbel, el-Musned 5/265.

Kutub sed temâm in digel çarê dî (67/2). Ahmed b. Hanbel, el-Musned 5/265.

Du'âyân bê şek eser bâ hene (71/1). Îbn-i Mace, Dua, 14; Musned, 1/62.

Ji def'â belâyê re hingâ me ne (71/2). Îbn-i Mace, Dua, 14; Musned, 1/62.

Xweş in Xizr û Ilyâs her vê deme (72/1). Îbn Kesîr, en-Nihaye, 1/328-şamîl

Nebîne li derdân dîken melhemê (72/2). Îbn Kesîr, en-Nihaye, 1/328-şamîl

Zuhûrbûnâ Mehdî xurûcâ Decâl (87/1). Ebu Dâwud: 4284.

We ye'cûc û Me'cûc ku pirr heybet in (90/1). Muslim, Fîten, 1,2.

Digel Dabbetulerdî, roj derketin (90/2). Muslim, Fîten, 118.

'Ezâb û su'âlâ di qebrê, heşir (90/1). Nesâî, Cenaiz: 114; Buxârî, Cenaiz: 86.

Hisâb û şîrât û mîzân û neşir (90/1). Nesâî, Cenaiz: 114; Buxârî, Cenaiz: 86.

Mîrovê gunâhê mezin her kirî (107/1). Muslim, Îman 306, (185).

Mu'ezzeb diket yânê âzâ diket (108/1). Buxârî, Îman, 15.

Ji wî rânî xelq jê şefâ'et diket (108/2). Buxârî, Îman, 15.

Ji rê ve Muḥemmed şefâ'etçî ye (109/1). Buxari, Da'awat 1, Tevhid 31.

Di pê ve heçî ku Xudân qenci ye (109/2). Buxari, Da'awat 1, Tevhid 31.

Ku nefsa emâre muḥî'î neket (164/1). Taberanî, El-Mu'cemul Kebîr, 10384, 10/179-180.

Bi mewṭê bitirsîne wê, tâ biket (164/2). Taberanî, El-Mu'cemul Kebîr, 10384, 10/179-180.

Tu hingê Xudâyê xwe hez jê dikey (178/1). Hakîm, Mustedrek, IV, 344.

Ku dunyâyê bâvêjî hez jê nekey (178/2). Hakîm, Mustedrek, IV, 344.

Xudê ev ʔeamê dixweş dâne te (220/1). Tirmîzî, Et'ime 41, (1849); İbnu Mace, Et'ime 11, (3274).

Digel âv û fêkî libâsê li te (220/2). Tirmîzî, Et'ime 41, (1849); İbnu Mace, Et'ime 11, (3274).

Tu bê şukrê mânendê heywân mexwe (221/1). Muslîm, Eşrîbe 103, (2018); Ebu Dawud, Et'ime 16, (3765).

Qe bê mulḥezâ Wî tu tiştî mexwe (221/2). Muslîm, Eşrîbe 103, (2018); Ebu Dawud, Et'ime 16, (3765).

Ji bo xwe hevâlân tu peydâ bike (223/1). Ebu Dawud, Tibb 24, (3925); Tirmizi, Et'ime 19, (1818); İbnu Mace, Tibb 44, (3542)

Ji bo xwârinê pêşê dest pê bike (223/2). Ebu Dawud, Tibb 24, (3925); Tirmîzî, Et'ime 19, (1818); Îbnu Mace, Tibb 44, (3542)

Di ber zâdê, pêşê tu destân bişo (224/1). Ebu Dawud, Et'ime, 12, (3761); Tirmîzî Et'ime 39, (1847) .

Wekî ku bi kevçik bixwî qeş meşo (224/2). Ebu Dawud, Et'ime, 12, (3761); Tirmîzî, Et'ime 39, (1847).

Li ser zâdê rûne bi şerz û edeb (225/1). Tirmîzî, Edeb 19

Piyê râstê râke û râzîne çep (225/2). Tirmîzî, Edeb 19

Ne râzê, ne pâlde demâ xwârinê (226/1). Buxari, Et'ime 13; Tirmîzî, Et'ime 28, (1831); Ebu Dawud, Et'ime 17, (3769); Îbnu Mace, Et'ime 6, (3262).

Ne bêhiş be, bî fexr û pir xwârinê (226/2). Tirmîzî, Zuhd 47, 2381; Îbnu Mace, Et'ime 50, 3349.

Hinek xuwê di ber zâdê, pêşê bixwe (227/1). Ebu Dawud, Et'ime 44, (3834)

Herâmê û tiştê bi şubhe mexwe (227/2). Ebu Dawud, Et'ime 44, (3834)

Tu nâvê Xudê bîne, dest pê bike (230/1). Ebu Dawud, Et'ime 16, (3768).

Wekî ku rehâbûyî hemdê bike (230/2). Ebu Dawud, Et'ime 16, (3768).

Ji ewwel ve sâr ke, kelâkel mexwû (232/1). Îbnu Mace, Sunen, Et'ime, 18.

Ji nâv hindî û jorê firâgê mexwe (232/2). Îbnu Mace, Sunen, Et'ime, 18.

Heçî ku li ber te heyî wê bixwe (233/1). Buxari, Et'ime 2, 3; Muslîm, Eşrîbe, 108, (2022)

Li ber hemnişînê xwe zâdê mexwe (233/2). Buxari, Et'ime 2, 3; Muslîm, Eşrîbe, 108, (2022)

Tu rûne birâ! pêşê âvê vexwe (240/1). Muslim, Eşrîbe 149, (2044); Ebu Dawud, Et'ime, 17, (3771)

Di sê cîr bihên de, bi mêhtin vexwe (240/2). Muslim, Eşrîbe 149, (2044); Ebu Dawud, Et'ime, 17, (3771)

Bi nâvê Wî her câr dest pê bike (241/1). Ebu Dawud, Et'ime 16, (3767); Tirmîzî, Et'ime 47, (1859)

Li nik âxirê wânî hemdê bike (241/2). Muslim, Eşribe 149, (2044); Ebu Dawud, Et'ime, 17, (3771)

Libâsê ji bo fexr û kibrê mepoş (243/1). Ebû Dâwûd, Libâs, 13; Buxârî, Libâs, 64; Muslim, Libâs, 27-28; Tirmîzî, Edeb 48.

Mucerrred ji bo ʔa'etê wî bipoş (243/2). Ebû Dâwûd, Libâs, 13; Buxârî, Libâs, 64; Muslim, Libâs, 27-28; Tirmîzî, Edeb 48.

Herâmê we dîbâc û qez ber meke (244/1). Îbn-i Mâce, Libâs, 19.

Bi wân tâ'etê xwe tu berze meke (244/2). Îbn-i Mâce, Libâs, 19.

2. 2. 12. Unsûrên Ku Di Farisî û Kurdî De Hevpar in

Hem (14/2), cevan (45/1), suwar (47/1), cûwan(54/1), hemî (62/1), herçî (68/1), dem(72/1), derd (72/2), peyda (78/2), xalî (80/2), gerçî (81/1), egerçî (84/2), can (85/2), heçî (103/1), bê guman (103/1), dergah (196/2), mêhvanî (239/1), nimêj (254/2), hişyar (268/1),

Bo nimûne:

Ne **hem**kûf û mewt û zewâlâ Xwudâ (14/2).

Hemî enbiyâ lê **cevan** vê **demê** (45/1).

Bi rûh û cesed ve birin ew **suwâr**

Bi çavê serê xwe Xudê dî du câr

(47/1,2).

Ewî cumle fî'li di bê 'illet in

Welêkin ne **xalî** ji meşlehet in

(80/1,2).

Ecel her yek e, **gerçî** kuştin bitin

(81/1).

Herâm her wekî hîll e, rizq e ji Wî

Egerçi mu‘eqqeb diket te bi Wî

(84/1,2),

Tenâsux ji rûhî, hûlûlâ Xwedâ

Tunînî, eyâ mu‘mînê **cân** fedâ

(85/1.2).

2. 2. 13. Unsûrên Farisî

Di vê berhemê de unsûrên Farisî zêde nehatine bikaranîn. Yên ku hatine bikaranîn jî ji hêla wateyên xwe ve gelek nêzî Kurdî ne yan jî hevpar in.

Merd (mirov) (1/2), tane (dane) (42/2), bihişt (Cennet) (64/2), bînâ (yê ku dibîne) (79/2), şehîn (tiştên ku aîdê şah e.) (99/2), manend (mîna, herwekî) (221/1), hemnişîn (yê ku li kêleka an li bal te runiştîye) (234/2), guşad (vekirî) (247/1), sezawar (musteheq) (252/2), rehabûyî (rehetkirin, azadbûyîn) (257/1), xerbaziyan (xer: ker, bazî: lîstik, Wate: Lîstika keran.) (262/2), siyah (reş) (269/1), bende (kole) (271/2), mepoş (rastiya wê; Poşîden e. Lixwekirina cil û bergan) (243/1), bipoş (243/1).

Bo nimûne:

Tu guhdêr e nuqç û beyânâ feşîh

Ji bo ferz û ‘eynân e, **merdê** melîh

(b/1)

E wî çav û birhê mukehhel hebûn

Ji deh **ţâne** şeybâ wî, ne zêde bûn

(b/42)

Ji herbâ şehâbân meke qâl û qîl

Bihiştî ne ew, qâtîl û hem qetîl

(b/64)

Dirêjket Şîrâtê li ser âgirê

Wedi'ket **şehînê** li dû vê pirê

(b/99)

Dişêtin we bê fi'lê peydâ biket

Ku bêçav û korân **bînâ** biket

(b/79)

Tu bê şukrê **mânendê** heywânî mexwe

Qe bê mulhezâ wî tu tiştî mexwe

(b/221)

Heçî ku li ber te heyî wê bixwe

Li ber **hemnişînê** xwe zâdê mexwe

(b/234)

Bişirse, nekû qelbî gâfil bikey

Bixwe xwe **sezâwârê** qehrê bikey

(b/257)

Wekî ku ji ferzek **rehâbûyî** tu

Ji ferzâ dû wê re muheyyâ be tu

(b/257)

Gelek hêvîkârê liqâyâ te'în

Me bê behr û muflis nekey **bende'**în

(b/271)

2. 2. 14. Unsûrên Tirkî

Di vê berhemê de unsûrên Tirkî gelek kêş in. Herwekî ku melhem (Erbiya wê merhem e. Ev bêje wekî melhemê ketiye zimanê Tirkî) (72/2), şefeat**çî** (109/1), şefeat; bi Erebî ye. Qertafa “çî” bi Tirkî ye) (109/1).

Bo nimûne:

Xweş in Xîzr û Ilyâs her vê demê

Nebîne li derdân dîken **melhemê**

(b/72)

Ji rê ve Muḥemmed şefâ‘etçî ye

Di pê ve heçî ku Xudân qenci ye

(b/109)

BEŞA SÊYEM

VEKOLÎN Ê TEHLÎLA BERHEMA NEHCU'L-ENAMÊ JÎ ALİYÊ NAVEROKÊ VE Ê METNA WÊ YA BÎ KRÎTÎK

3. 1. VEKOLÎN Ê TEHLÎLA BERHEMA NEHC-ULENAMÊ JÎ ALİYÊ NAVEROKÊ VE

Navê vê berhemê di çavkaniyan de wekî “Nehcu’l-enâm fi’l-eqâid”¹⁷⁷ derbas dibe. *Nehcu’l-Enam* berhemeke girîng a edebiyata dînî ye. Ev berhema dîdaktîk a dînî û exlaqî di medreseyên Kurdistan de ji bo perwedeya xwendekarên medreseyan hatiye bikaranîn. Ev berhema menzûm bi teşeya mesnewiyê hatiye nivîsandin.¹⁷⁸ Mijara vê berhemê bi gelemperî eqaîd e. Berhem bi xetên Erebi hatiye nivîsandin. Lê zimanê wê bi Kurdiya Kurmancî ye. Lê M. Edip Çağmar di xebata xwe ya bi navê “*Molla Halil es-Siirdî’nin Rîsâle fi’l-ilmî-tecvid*” de tiştê balkêş tîne zimên û dibêje ku “Mela Xelîl wexta ku berhema xwe ya *Nehcu’l-Enamê* nivîsandiye di pêşiyê de bi Erebi nivîsiye û dûvre tercemeyê Kurdî kiriye.”¹⁷⁹ Me’neya navê berhemê “rêya baweriyê ye”¹⁸⁰ an jî bi me’naya “baweriya gel” e.¹⁸¹ Ev berhem di medreseyên Kurdistanê de berhemek sereke ye. Li medreseyan bi derskî tê xwendin. Berhem bi nezmî hatiye nivîsandin. Ji ber vê yekê li medresan xwendekar vê berhemê bi rehetî jiber dikan û wekî helbestkî bi meqam dixwînin.

3. 1. 1. Armanca Nivîsandina Nehcu’l-Enamê

Armanca nivîsandina berhema Nehc-ul Enamê Mela Xelîl di van beytê xwe yên Nehc-ul Enamê yên jêrîn de tîne ziman.

Kelâmek selîs e, bi cih zebt bike

Ewe, ê ji wertê te xâric dike

(b/260)

¹⁷⁷ Öncü, b.n., r. 31.

¹⁷⁸ Adak, b.n., r. 329; Ji bo agahiyên berfirah, bnr., Saîd Nursî, *Pêyvên Biçûk (bi tîpên ‘Erebî, Küçük Sözlər)*, (Amd. Abdulkadir Badıllı), İstanbul, Envar Neşriyat, 1992, r. 8.

¹⁷⁹ Kazan b.n., r. 20; M. Edip Çağmar, “Molla Halil el-Siirdî’nin ‘Rîsaletun Fi’l-Îmî ‘T-Tecvid’ Adlı Eseri”, *e-Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi*, Kasım 2009, Cild Tune, Sayı 2, <http://www.e-sarkiyat.com> (Tarîxa Têgihîştînê:30Tîrmeh2015), r. 154-16.

¹⁸⁰ Öncü, b.n., r. 30.

¹⁸¹ M. Edip Çağmar, “Siirdî’ye Ait Nehcu’l-Enam Adlı Eserin Biçim ve İçerik Yönünden Tahlili”, *Uluslararası Siirt Sempozyumu*, Birleşik matbaa, İzmir 2007. r. 405.

Xelîlî qe ev çerz bi zâ‘et nebû
Welê ew bi fermânâ exxê xwe bû

(b/261)

Dû sê lefz gotin ji bo zârûwân
Ku xwe pêvedin ew ji xerbâziyân

(b/262)

Ewî nâvî lê dâni “Nehcu’l-Enâm”
Welêkin ku pê muntefî’ bin ‘ewâm

(b/263)

Armanca nivîsandina berhema Nehcu’l-Enâmê Ehmed Hilmî el-Qoxî el-Diyarbakîrî di berhema xwe ya bi navê Rehberê Ewam Şerha Nehcu’l-Enâm de weha şîrove dike; (Biza’et) pertal, Seydayê nazim dibêje; pertalê min bi vî terzî tunebûn, yanî qabiliyeta min tunebû ku ez bi vî hawayî Nehcu’l-Enâmê te’lîf bikim we lêkin ez bi emr û fermana birayê xwe bûm yanê ku birayê min emra min kir bi te’lîfa vê kitabê bi bereketa wî Xudê teqeta qabiliyetê da min û min te’lîf kir. Birayê wî li gor ku hatiye nivîsandin di dawîya sehîfekî Nehcu’l-Enâmê de “Mela Îsmâîlê Kîsekî ye” ji Seyda xwestiye ku ferz û eyna nezim bike, ji bo te’lîma zaroka welêkin vêga kes nizane îlla hindik ji xwasan.¹⁸² Li ser van malikên han yên ku sedema nivîsandina berhema Nehcu’l-Enâmê diyar dike de Feqe Husên Saxniç di berhema xwe ya bi navê “Dîroka Edebiyatya Kurdî” de weha behsa wî kesê (exxê) ku xwestiye Seyda Mele Xelîl berhemek weha binivîsîne dike û dibêje; “Seyda li vir dibêje ku ti niyeta wî tunebû ku pirtûkeke bi vê awayî binivîsîne. Lê wî li ser fermana birayê xwe ev kar pêkanî. Seyda, di şîroveya Nehu’l-Enâmê (Mînhu) de, dabaşa vî birayî dike û weha dibêje: Navê wî Îsmâîlê Hîzanî (Mele Îsmâîlê Hîzanî) bû û wekî birayê dê û bav hezkiriyê min bû. Kesekî zana, teqwa, camêr, merdemêr, xwenas û pîsporbû.¹⁸³

¹⁸² Ehmed Hilmî el-Qoxî el-Diyarbakîrî, **Rehberê ‘Ewam Şerha Nehc-ul Enam**, İstanbul: İhsan yayınları,tn., r. 87.

¹⁸³ Feqe Husên Saxniç, **Dîroka Edebiyatya Kurdî**, Stenbol: Wêşanê Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, 2002, r. 412.

Armanca nivîsandina vê berhemê perwerdehiya ehlê medreseyê ye. Berhemên Mele Xelîl hinek ji wan gelek kûr û îlmî ne. Yanê ji bo xewasan hatine nivîsandin. Hinek ji wan jî hîn hêsan in. Yanê ji bo ehlê ewam hatine nivîsandin. Berhema *Nehcu'l-Enamê* jî herwekî ku Mele Xelîl li malikên xwe yên jorîn de jî aniye ziman armanca nivîsandina berhema *Nehcu'l-Enamê* ji bo zarok û ehle ewamê ye. Berhema *Nehcu'l-Enamê* bi zimanekî gelek hêsan, hêrîkbar û fêmkirî hatiye nivîsandin. Her çiqas ji bo zarok û ehle ewamê hatibe nivîsandin jî, ji hêla me'nayê ve gelek kur û îlmî ye.

3. 1. 2. Zimanê Nehcu'l-Enamê

Sedema herîkbarî û rewaniya zimanê vê berhemê yek jê ew e ku ji bo qafiye hevûdu bigrin di nav bêjeyan de teqdîm û texîr nehatiye kirin. Digel vê yekê ji bo destxistina nezm û qafiyeyê “haşiv” yanê qusûra bikaranîna bêjeyên ji bilî îhtiyacê nehatine bikaranîn (yanê ji bo nezm û qafiyeyê me'ne nehatiye fedakirin). Ji vê hêlê ve mirov rastî vê qûsûra “haşîvê” nayê. Ev jî hostatiya nivîskar ya di warê ziman û qafiyeyê de dide nişan.¹⁸⁴

Zimanê berhemê her çiqas di bin bandora zimanê Erebî de be jî, li gorî şert û mercên wê serdemê zimanekî gelek rewan, herîkbar û xwerû ye. Vê yekê Mele Xelîl di beytên xwe yên jêrîn de weha tîne zimên;

Tu guhdêrê **nuţq û beyânâ feşîh**

Ji bo ferz û ‘eynân e, merdê melîh

(b/1)

Kelâmek selîs e, bi cih zebt bike

Ewe, ê ji werţê te xâric dike

(b/260)

Ji ber ku zimanê berhemê gelek zelal û xwerû ye, bi rehetî tê fêmkirin û ev jî di me'nayê de aloziyê dernaxe pêşîya mirov. Ji bo vê yekê, beytên adaba xwarinê yên jêrîn mînak in.

Ji bo xwe hevâlân tû peydâ bike

Ji bo xwârinê pâşê dest pê bike

¹⁸⁴ Yalar, **m.n.**, r.410.

(b/223)

Di ber zâdê, pâşê tû destân bişo
Wekî kû bi kevçik bixwî qeş meşo

(b/224)

Li ser **zâdê** rûne bi **terz** û **edeb**
Piyê râstê râke û râzîne çep

(b/225)

Ne râzê, ne pâlde demâ xwârinê
Ne bêhiş be, bâ **fexr** û pir xwârinê

(b/226)

Ji **ewwel** ve sâr ke, kelâkel mexwe
Ji nâv hindî û jorê firâgê mexwe

(b/232)

Di van pênc beytên Nehcu'l-Eanmê yên jorîn de bi tenê bêjeyên wekî zâd, fexr, qeş, tarz, edeb û ewwel Erebi ne, yên din tevahî bi zimanê Kurdî ne. Herwekî ku tê dîtîn zimanê berhemê gelek xwerû û zelal e. Lê ji bo tevahiya berhemê mirov nikare vî tiştî bibêje. Lewra cih cih ji hêla ziman û wateyê ve hevokên giran jî hene.

3. 1. 3. Xebatên Li Ser Berhema Nehcu'l-Enamê Hatinin Kirin

Xebatên ku li ser *Nehcu'l-Enamê* hatine kirin, “cara pêşî di tarîxa Safer 1337/Ekîm 1918ê de ji aliyê Mustefa Helîm (şakirdê xettadê Matba'a-î Evqaf-î Îslamiye ve Askeriye Mîr Heqqî) bi navê “kîtabu'l-Eqaîd bi'l-Lugati'l-Kurdiyye” hatiye çapkirin. Piştî li Şamê du caran (salên 1938 û 1947) ji aliyê Mela Remezanê Cêlekî Bûtî ve bi herfên Erebi hatiye çapkirin. Berhem, li Stokolmê (1988) û li Stenbolê (Osman Akdağ û Kerem Soylu latînîze kirine. (Wêşanên Enstîtûya Kurdî, Îstanbul 2002) bi herfên Latînî hatiye çapkirin. Herî dawî ji aliyê Huseyin Şemrexî ve bi herfên Erebi û bi hevberkirina heşt destxetan hatiye amadekirin. (Nûbihar, Stenbol 2012). Ji ber ku *Nehcu'l-Enam* di

nav gel û aliman de zêde belav bûye, li ser wê hinek şerh jî hatine çêkirin.”¹⁸⁵ Tê gotin ku Mela Ahmet el-Heyderî, bavê Muhammed Emin el-Heyderî yê ku nivîskarê mewlûda Kurmancî jî li ser vê berhemê şerhek nivîsiye. Lê mixabin ev şerh di destê me de nîne. Molla Hasan el-Karçikânî jî şerhek binavê *Tavdîhu’l-merâm şerhu Nehci’l-enâm* nivîsiye.¹⁸⁶

Rehberê Ewam Şerha Nehcu’l-Enam: Ev şerh ji aliyê Ehmed Hîlmîyê Qoxî ve bi Kurdiya Kurmancî hatiye çêkirin û di sala 1983yan de hatiye çapkirin.

Şerha Nehcu’l-Enam: Ev şerh jî ji aliyê Mele Zeynulabîdîn Amidî ve bi Erebi hatiye çapkirin.

Nehcu’l-Enam du caran bi bal Tirkî ve hatiye tercemekirin:

Hellu’l-Meram Tercemetu Nehcu’l-Enam: Seyîd Tahîr Geylanî (serkatibê Şer’iyeê û îmamê mizgefta mezin a Bedlîsê) di navbera salên 1946-1950î de Nehcu’l-Enam bi Tirkî nezm kiriye. Di sala 1992ê de li Bursa Furkan Ofset’ê bi navê “Manzum Şafîî Îlmîhalî” (4 berhemên manzume tede hene) hatiye çapkirin

Evlîyalar Diyarî Siirtin Büyük Âlimi Üstad Mela Halîl’in Nehcu’l-Enam’inin Türkçesi: Serkan Tekin, Stenbol, sal?¹⁸⁷

Mela Mûsa el-Celâlî el-Beyâzîdî jî şerhek bi navê ***“Feyzu’l-qadîr el-‘Allâm şerhu Nehci’l-Enâm”*** çêkiriye. Mela Mûsa ev şerha *Nehcu’l-Enamê* bi Erebi çê kiriye. Ev berhem, di wêşanên Sembolê de di disala 2010an de derketiye. Ev şerh jî 228 rûpelan pêk tê.¹⁸⁸

¹⁸⁵ Adak, **b.n.**, r. 329.

¹⁸⁶ Öncü, **b.n.**, r. 31.

¹⁸⁷ Adak, **b.n.**, r. 329,330.

¹⁸⁸ Nusrettin Bolelli, “Kürt Bilginlerin Yazdıkları Bazı Eserlerin Tanıtımı”, **Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi**, Ocak/January 2015, Cild Tunc, Sayı 1. <http://www.Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi.com>, (Tarîxa Têgihîştinê: 04 Tebax 2015), r. 53.

3. 2. TEHLÎLA NAVEROKA BERHEMA NEHCU'L-ENAMÊ

Berhema *Nehcu'l-Enamê* berhemek girîng a edebiyata dînî ye. Ev berhema dîdaktîk a dînî û exlaqî di medreseyên Kurdan de jî bo perwedeya xwendekarên medreseyan hatiye bikaranîn. Ev berhema menzûm a ku bi teşeya mesnewiyê hatiye nivîsandin.¹⁸⁹ Mirov dikare naveroka *Nehcu'l-Enâmê* di bin du beşên sereke û bist û du binbeşan de dabeş bike. Beşa yekemîn di derheqê eqîdeyê de ye û ya duyemîn derheqê exlaqê de ye û jî du sed û heftê û sê beytan pêk tê.

3. 2. 1. Beşa Yekemîn

'Eqîde ye û mijarên wê ev in:

3. 2. 1. 1. Ferzên Eynî

Behsa ferzên eynî wekî îman, Îslam, hec, zekat û kelîma şehadetê dike. Di vê beşê de behsa têgehên îman û Îslamê dike. Di vê çarçovê de di serî de digel kelîma şehadetê behsa ruknên îslamê kiriye. Ligel vê tîne ziman ku gava îman û Îslam bi hev re nebin wesfên Îslamî dê tam pêk neyê. Ji hêlekê de kelîma şehadetê jî bi vê me'neyê tîne ziman.

Bo nimûne:

Tu îmânê baweriyâ dil bizân

Muî'bûn e Îslâm, bi zâhir bizân

(b/5)

Welêkin qe yek bê yekî nâbitin

Musilmânî bê herduwân nâbitin

(b/6)

3. 2. 1. 2. Behsa Sifetên Selbî

Di vê beşê de behsa hebûna Xwedê û zatê Wî dike. Dibêje ku hebûna Wî jî zatê Wî ye. Wesf û sifetên ku di zatê Xwedê de nînin weha rêz dike.

¹⁸⁹ Adak, **b.n.**, r. 329.

1. Ewwel
2. Axir
3. Zid
4. Misl
5. Mekan
6. Zeman
7. Mânî‘
8. Mu‘în
9. Cîhet
10. Cisim
11. Nûr
12. ‘Erez
13. Reng
14. Mîktar
15. Şekil
16. Nexweşî
17. Ewlad
18. Zewc
19. Da, dê
20. Bav
21. Hemkûf
22. Mewt
23. Zewâl

Muelîf di dawiya vê beşê de dibêje ku nasên (hukim) ji hêla me’nayê ve gelek dijiwar in, divê ku werin şîrovekirin.

3. 2. 1. 3. Behsa Heft Sifatên Xuda yê Qedîm

Di vê beşê de di serî de li gorî îtîqada Mezheba Îmamê Eş’arî, behsa heft sifatên ezel ên Xwedê dike. Ev sifatên Xwedê, ne eyn in ne jî xeyr in, ne jî wekî yê me nin. Ji bo wê jî ev malik mînak in.

Şifâtê di seb’e ezel wî hene

Ne ‘eyn ne geyr in, ne wek êd me ne

(b/17)

Heyât e digel ‘îlm û sem’ û beşer

Îrâdet digel qudretâ xeyr û şer

(b/18)

Ew heft sifet jî ev in; Heyat, ilim, sem’, beser, îrade, qudret û kelam in. Nivîskar, dûre behsa afirandina ziman û herfan dike û dibêje ku ziman û herf hadis in, yanê dûre hatine afirandin. Behsa şandina Qurana pîroz û mensûxbûna pirtûkên semawî yên din dike û dibêje ku Qurana pîroz hat, hukmên pirtûkên dîn ên din ji holê rakir û hetanî roja qiyametê hukmê Qurana pîroz wê her bidome û li axîretê xwendevanên wê her hebin. Digel van divê ku mirov her navî li Xwedê neke. Lewra navên Wî ji nehwed û neh navan zêde ne û hewceyî bi navên din nîne.

Di vê beşê de ya herî balkêş û girîng Mele Xelîl fikra xwe ya wehdetu’l-wûcûdê aniye ziman. jixwe tê zanîn ku feylesofên kevin “Heyûla”yê herwekî ku dendika koka hebûnê yan a kaînatê qebûl kirine. Lê Mele Xelîl vî fikrî ji binî ve qebûl nake û afirandina kaînatê yan mewcûdatê bi raste rast dide Xwedê û weha dibêje: “Heyûlâ tunî ne, ku ‘âlem ji wê”. Ev malikên jêrîn ji bo fikra Mele Xelîl ya wehdetu’l-wûcûdê mînak in.

Ji ketmâ ‘edem ‘âlem ânî wucûd

Bi vî wechê ehşen wî şâhê wedûd

(b/25)

Tu me‘dûm û hâdis bizân e, e wê

Heyûlâ tunîn e, ku ‘âlem ji wê

(b/26)

3. 2. 1. 4. Behsa Ferîşteyan/Melaîketan

Muelîf, di vê beşê de di serî de behsa pîrbûna jimara melaîketan dike û dibêje ku hejmara wan bêhed û bêhesab in û her daîm îbadetê dîkin. Hinek ji wan xewas in û ji bo peywîrên taybet hatine wezîfekirin. Dûre behsa afirandina melaîket, însan, cin û şeytan dike. Di vê çarçovê de dibêje ku melek ji nûrê, însan ji heriyê, cin ji hewayê û şeytan (pelîd) jî ji agir hatiye afirandin. Digel vê tîne ziman ku zayenda wan yanê mêkî û nêrkî

ya wan tuneye, dikarin şekil biguherînîn û bi per û bask in. Gava ku dimirin jî wê herin bihiştê û li wê derê ji ehlê cenetê re xîzmetê bikin.

Bo nimûne:

Ne mêr in ne jin, bê xwûr û vexwûr in

Li şeklân qâdir, bi çeng û perr in

(b/31)

Fenâ dê bibin ew biçin cennetê

Ji bo ehle wê re bikin xîzmetê

(b/32)

3. 2. 1. 5. Behsa Rîsaletê

Nivîskar di vê beşê de bi gelemperî behsa rîsaleta Hz.Muhemed (s.x.l) dike. Mele Xelîl, di serî de ji bo pêxemberiya Hz. Muhemed (s.x.l) dibêje ku Xwedê ew ji bo peywira pêxemberiyê hinart (hilbijart) û ew ji bo însan, cin û melean kir rêber. Dema ku dînê wî hat em bi dînê wî bûn xwediyê fezl û kemalê û dînên din mensûx bûn. Xwedê te'ala ew kir xatemê enbiya lê ew kir serwerê hemûyan. Dûre dibêje ku diya wî Amîne ye, bavê wî jî Evdilah e. Dera ku lê hatiye dînê Meke ye, ya lê medfûne Medîne ye. Ew ji toximê Erebb û ji nesla Qureyş e. Ew di çil saliya xwe de bûye nebî sê sal şûnde jî bûye resul. Deh salên xwe yê pêxemberiyê li Mekê, deh salên din jî li Medîne derbas dike û li wir çûye dilovaniya Xwedê.

Bo mînak:

Ewî 'Ebdullâh bâb e, dâ Âmîne

Medîne û Meke mewlid û medfîn e

(b/36)

Ji neslâ Qureyş e ji tuxmê 'Ereb

Nubuwwet di sâlâ çilî dâye Reb

(b/37)

Sisê dî kû borîni ew bû resûl

Meke bo xwe deh sâlê dî kir qebûl

(b/38)

Ji Mekkê kû bâlî Medînê ve çû

Li wê deh buwârin ji dinyâyê çû

(b/39)

3. 2. 1. 6. Behsa Şemaîlê Muhemmed

Mele Xelîl di vê beşê de di serî de behsa bejn û bala pêxember dike û dibêje ku bejneke mu'tedil li ser wî hebû, ne kurt, ne dirêj, ne qelew û ne jî ze'îf bû. Dûre dibêje ku rengê wî ne reş, ne spî, sorekî esmerî bû. Rûyekî glover, rihekî nuranî, çav û burîyê kilkirî li ser hebû. Hejmara porê wî yên spî nozdeh ta bû. Bi şev û roj, paşî û pêşîya xwe herwekî hev didît û divê ku mirov înkariya van me'lumatan neke.

Bo mînak:

Ewî çav û birhê mukehhel hebûn

Ji deh tane şeybâ wî, ne zêde bûn

(b/42)

Bi roj û bi şev hem li pêş û li paş

Wekî yek didî, hâşâ inkâr û hâş

(b/43)

3. 2. 1. 7. Behsa Mi'racê

Ev behs jî herwekî behsa şemaîla pêxember kurt e. Di vê beşê de behsa bûyera Îsra û Mi'racê tê kirin. Mele Xelîl vê bûyerê weha tîne zimên, şevêkê ji Ke'ba Munewer bi lehzekê Hz. Muhemed (s.x.l) dibin Mescîdu'l-Eqsâyê. Li wir pêxember bi tevahî li derûdora wî dicivîn û ew jî wan re îmamtiyê dike. Dûre wî bi suwarî hetanî Sîdretu'l-Munteha û Qabêduqewsan dibin. Ev bûyer hem bi cism û hem bi rûh pêk hatiye û li wir ew Xwedê bi çavê sere xwe du cara dibîne.

Bo mînak:

Ji wê ew bire Sidretu'l-Muntehâ

Bi qâbê dû qewsân bi bâl wî gehâ

(b/46)

Bi rûh û cesed ve birin ew suwâr

Bi çavê serê xwe Xudê dî dû câr

(b/47)

3. 2. 1. 8. Dîtina Xudê

Ev bahis ji sê malikan pêk tê. Di vê beşê de tê gotin ku ji bilî Hz. Muhemed (s.x.l) tu kesî Xwedê nedîtî ye. Lêbelê li axîretê mu'mînê bibêjin ku me dît. Lê ew dê mahiyet û heqîqeta Wî fêm nekin. Di dawiyê de jî dibêje ku divê mirov îmanê bi pêxemberan bîne û cûdahiyê nexwe navbera wan.

Di dunyâyê kes dî, ji bil wî nedî

Di 'uqbâyê mu'mîn dibêjin me dî

(b/48)

Li wê ew dibînin Rebê 'âliye

Welêkin nizânin heqîqet çiye

(b/49)

Bihindî resulân îmanê bîn

Tefâzul ji bo wân ji nik xwe mebîn

(b/50)

3. 2. 1. 9. Behsa Qenctiriyê/Efzeliyetê

Di vê beşê de Mele Xelîl dibêje ku divê mirov îmanê bi tevahiya pêxemberan bîne û cudahiyê nexwe navbera wan. Lê ji aliyê fazîletê ve di navbera wan de ferq heye.

Ji hêla fazîletê ve ji piştî Hz. Pêxember bi rêzê Hz. Îbrahîm, Hz. Mûsa, Hz.Îsa û Hz. Nûh tê. Ji aliyê qenctiriyê ve nebî li dû resûlan tên. Li dû wan jî xewasên melekan e. Digel vê melaîket ji ewamê însanan û jinên dunyewî jî ji horiyan çêtir in. Jina herî qenc Hz. Fatima û dûre Hz. Aîşe ye. Qenctiriyên umetê bi rêzê di serî de çar heb xelîfeyên mezin, bi rêzê Hz. Ebûbekir, Hz. Omer farûq, Hz. ‘Usman û xwediyê şûrê Zulfîqar Hz. Elî ye, dûre şeş heb sehabeyên ku mizgîniya cenetê jê re hatine wek “Se‘d, Zubeyr, Se‘îd Ebdurrehman, Telha û Ubeyd” tên. Ev mizgîniya cenetê Hz. Pêxember dide wan. Digel van sehabeyên ku beşdarî herba Bedir, Ûhûd û Hûdeybiyeyê bûne û ferdên malbata Hz. Pêxember jî dê biçin cenetê. Divê ku mirov ji şerê sehaban jî qal û qîl neke, lewra hem qatîl û hem jî qetîl ehlên bihiştê ne. Di herî dawiyê de jî dibeje ku hemî dê û bawê pêxemberan ji enwâ‘ê kufr û şeran berî ne.

Bo mînak:

Ji herba şehâbân meke qâl û qîl

Bihiştin e ew, qatîl û hem qetîl

(b/64)

Hemî da û bawê di peygemberan

Berîne ji enwâ ‘ê kufr û şerran

(b/65)

3. 2. 1. 10. Jimara Pêxemberan

Di vê beşê de tê gotin ku hejmara nebiyan sed û bîst û çar ya resûlan sê sed û sêzdeh in. Ligel van di Quranê de behsa bîst û heşt pêxemberan tê kirin û ji aliyê Xwedê ve çar kitabên semawî û sed rûpel wehy hatine şandin. Tiştên ku ji pêxemberan xaric dibin pîs nînin, bîlakis ew ji derdan re derman in. Qismê pêxemberan ne ji gunehkaran, ne ji jinan û ne jî ji mirovên bi bedena xwe bi qusûr, pêk tên. Lêbelê li vê dinyayê jin dibe ku welî û xwedî keramet bin. Divê mirov li hemberî van me’lûmatan dernekeve.

Bo mînak:

Ne ehlin gunehkâr û ‘ebdâr û jin

Ji peygemberê re, welê qismê jin

(b/69)

Dibin ku welî bin, kerâmât ji vîn
Di dunyâ'ê heqq in me be ziddi wân

(b/70)

3. 2. 1. 11. Tesîra Dua

Di van sê malikan de behsa tesîra dua tê kirin. Tê gotin ku tesîra dua bêguman e. Ji bo em xwe ji belayan biparêzîn gelek bi feyde ne. Xizir, Îlyas jî nebî ne, her demê dijîn û ji derdan re jî dibin melhem. Di dawiyê de jî tê gotin ku li ser mesela Loqman û Îskender lec mekin, lewra ew ne pêxember in.

Bo mînak:

Du'âyân bê şek eser bâ hene
Ji def'â belâyê re hingâ me ne

(b/71)

Xweş in Xîzr û Ilyâs her vê demê
Nebîne li derdân diken melhemê

(b/72)

Di Luqman û Eskenderî lec meke
Ne peyğember in ew, 'inâdê meke

(b/73)

3. 2. 1. 12. Mebhesû Nesbil Îmam

Ev behs ji du malikan pêk tê. Di vê beşê de tê gotin ku li ser îmam (serokê dewletê) ferz e ku mezlûman û dîn, hifz û himaye bike. Gava ku îmam (serokê dewletê) wûsa be, xelq jî wî xerabiyê jî bibîne divê ku dîsa jî li hemberê wî serî ranekin, ger rakîn heram e.

Ji ferzâ ne neşbâ îmmâmî, ku dîn
Hîfz ket ji mezlûmî re bit mu'în

(b/74)

Herâm e li xelqê xurûcâ li wî
Eger çi ku cewrê bibînî ji wî

(b/75)

3. 2. 1. 13. Behsa Îxtiyara Cuzî

Ev behs behsek kelamî ye û ji mijarên bi nîqaş pêk tên. Di vê beşê de tê gotin ku afirînerê fiilan Xweda ye, lê yên ku tercih dike însan e. Xwedê fiilan ji tunebûnê diheyîne. Însan jî wê fiilê dixwaze, dike û cezayê wê jî dikşîne. Eserên ku li fiilan teretûb dibin, bi îcâda Wî peyda dibe. Eger Xwedê bixwaze dikare eserên bê fiil jî biafirîne. Heta yên bêçav û kor jî bîna (bi çav, dîtin) bike. Xwedê kirdeyê fiilan ne û kirinên Wî bê îlet in, lê ew ji meslehetê yanê ji feydayê jî berî û xalî nîn in. Mirin her ecel e û yek e, heta ew kuştin be jî. Tu karek li Xwedê wacib nîne. Eger Xwedê şefqetê li me neke em bi îbadetên xwe nikarin biçin cenetê. Lê li ser me ferz e ku mirov her daîm îbadetê bike û rica qebûlê her daîm ji Wî bike. Her çiqas bibe sebeba ezabê jî xwarina heramê jî herwekî helalê, riziq e. Di dawiyê de jî tê gotin ku tenasûxa (reenqarnasyon) ji rûhê û hulûla Xwedê (Hevyekbûna Xwedê ya bi mewcûdatê ve) ne rast e.

Bo mînak:

Herâm her wekî hîll e, rizq e ji Wî
Eger çi mu'eqqeb diket te bi Wî

(b/84)

Tenâsux ji rûhî, hulûlâ Xwedâ
Tunînî, eyâ mu'mînê cân fedâ

(b/85)

3. 2. 1. 14. Behsa ‘Elametên Qiyametê

Di vê beşê de Mele Xelîl di serî de dibêje ku elametên sa’eta qiyametê gelek in, û baweriya bi wan ferz e. Piştî yeko yeko behsa wan elametan dike û weha wan rêz dike.

1. Behsa dîtina Mehdî
2. Derketina Decal
3. Nuzûla Hz. Îsa (Gava ku Îsa nuzûl dibe, wê bi qasî heft salan bi şer’a Nebiyê me ‘emel bike, şûnde wê wefat bike û di qebra Pêxemberê me de were definkirin)
4. Ye’cûc û Me’cûc
5. Dabetulerd
6. Ji mexrîb ve derketina tavê û girtina deriye tobeyê.

Digel van agahiyan Mele Xelîl tewsiya ji berkirina hedîsên Decal dike û dibêje ku ji bo mirov xwe ji fitna Decal muhazeze bike, divê mirov xwe bispêre Xwedê.

Bo mînak:

‘Elâmet ji bo sâe’tê re pirr in

Bi kullî ji ferzân e, bawer kirin

(b/86)

Zuhûrbûnê Mehdî xurûcê Decâl

Dê nâzil bî, ‘Îsa ji bo zîddelâl

(b/87)

3. 2. 1. 15. Behsa Suala Qebrê û Qiyametê

Di vê beşê de behsa, “sûala qebrê û ezaba wê, heşir, hesab, sirat, mîzan, di piştî hesabê de belavbûna mexlûqet, cenet, hewza kevserê, cehennem, nezer û sihirê” tê kirin û weha didome, niha cenet li ezman li qatê heftan, cehennem jî di bine erdê de ye. Ji bilî zatê Reb, mewcûdat hemû dê tune bibin û paşê dîsa wê ji bo hesabê werin afirandin. Pira Siratê wê li ser agir were dirêjkirin. Wê ji herkesî suwal û cuwala emelê wî bê kirin. Kitêba hinan wê bidin destê rastê ya hinan jî bidin destê çepê. Bi vî awayî qenc û xerab wê ji hev werin cudakirin. Yê baş wê herin cenetê yê nebaş wê herin cehenemê.

Heçî ku cenetîne wê ji hewzê Kewserê vexwin yên ehlê cehenemê jî wê ji hemîmê vexwin. Dûre yên gunehkar wê ji cehenemê derkevin, lê tucaran qafir jê dernakevin. Ev kirin zulûm nîne, edalet e. Xwedê di mulkê xwe de xwediye taserûfê ye. Mirovên ku gunehên mezin kirine, çûyîna wan ya cehenemê muheqeq (kesîn) nîne. Ew di agir de dişewitin, lê bi vî awayî ew temiz dibin. Di serî de Hz. Pêxember û digel wî heçî ku xwediye qenciye ne ewê ji însanan re şefaetê bikin.

Dûre digel van agahiyan nivîskar dibêje ku bifikire ka Xwedê ji erdê hetanî Sidretu'l-Muntehâ mehlûqat çawa afirandiye û ji behra edem (tunebûnê) ew derxistine.

Bo mînak:

Dirêj ket Şîrâtê li ser âgirê

Weqî'ket şehîne li dû vê pirê

(b/99)

Bifikire di xelqê Xudâyî wehâ

Ji 'erdê hetâ Sidretu'l-Muntehâ

(b/115)

Ku iz'ânî key, wê demê zerreyek

Ji behrâ 'edem nâyê bê bariyek

(b/116)

3. 2. 1. 16. Behsa Îmaman

Mele Xelîl di vê beşê dibêje ku çar heb mezhebên heq hene. Her wisa jî çar îmamên wan jî heq in. Ew her çar îmam jî ev in; Nu'mân bîn Sabî, Ehmed bîn Hembel, Îmamê Mâlik û Îmamê Şafî'î ye. Di vir de Mele Xelîl hem navê îmamê mezheba xwe û hem jî navê îmamê eqaîdeya xwe dide û dibêje ku "Ji dînê me re Şafî'î ye rûkin (118/2), îmamê me ye Eş'erî tî Nehîr (119/1)" me'neya bejeya "Nehîr" ya di vir de derbas dibe Ehmed Hîlmî el-Qoxî el-Diyarbakirî di berhema xweya bi navê Rehberê 'Ewam Şerha Nehcu'l-Enamê de weha bi mane dike; "Peyva "ta Nehîr" yanê hetanî çem yanê hetanî çemê Ceyhûnê. Ev çemê Ceyhûnê çemekî bajarê Belxê ye. Ev çem jî rojhilatê hudûdê Efxanîstanê dirête di Tirkîstanê de dibihur e û dikeve Behra

Aralê ku di nav Rûs de ye.”¹⁹⁰ Li gorî Mele Xelîl, eqîda ku ew her du îmam yanê Eş’arî û îmamê Mensûr pê qaîl in heq in, yê din ên heftê û du firqa batil in. Herçî ku li ser wê eqîda wan nebin Mele Xelîl wan ehlê fesad û bîd’etê dibîne. Her wisa dibêje ku lêbelê gava ku tu bi serîhî kufrê ji ehlê qibleyê nebînî, tu ehlê qibleyê kafir mezan. Ji kufrê razî nebe û tu giraniyê bide hêla hezkiriyên dînê îslamê. Pêwîst e ku mirov enwaê sihrê helal nebîne. Lê divê mirov ji kesî re mebêje “kafirê dîn betal”. Divê mirov tu tucaran dewa Xwedahiyê neke û xwe ji evditiya Xwedê jî dûr nexê. Divê ku mirov li şexsan le’netê meke, gava ku dike li ehlê ezabê umûmen bike.

Bo mînak:

Mezâhib çihâr in îmamê di wân
Li heqqîn e her çarî bê şek bizân

(b/117)

Ku Nu‘mân û hem Ehmed û Mâlik in
Ji dînê me re Şâfî‘î ye rukin

(b/118)

Îmamê me ye Eş‘erî tâ Nehir
Bû Menşûre‘ê Mâwerâu‘n-nehir

(b/119)

Mue‘yyen li kes le’netê tu meke
Li ehlê ‘ezabê ‘umûmen bike

(b/127)

3. 2. 2. Beşa Duyemîn

Behsa tesewûf û exlaqê ye û mijarên wê jî ev in:

3. 2. 2. 1. Nexweşiyên Dil

Di vê beşê de nivîskar behsa nexweşên dil dike û dibêje ku ev nexewşiyên dil ji dilê mirovan re deriyê gunehan vedike û wan nexweşiyên li gorî xwe weha rêz dike.

¹⁹⁰ Ehmed Hilmî el-Qoxî el-Diyarbakîrî (Amd.), **Rehberê ‘Ewam Şerha Nehc-ul Enam**, İstanbul: İhsan yayınları,tn., r. 35.

1. Hirs
2. Hesed
3. Kîbîr
4. ‘Ucb
5. Riya
6. Hezkirina pîrbûna malê dinyayê
7. Hezkirina luksê
8. Te’asûba mezheban
9. Hirs
10. Bexîlîkirin
11. Çikosî
12. Hezkirina pîrxewarinê
13. Şehwet
14. Sû’îzen

Digel van nivîskar nexweşiyên ziman jî weha rêz dike.

1. Kelamê zêde
2. Kelamê betal
3. Nîqaşên vala û beredayî
4. Xeberdana fehş (xeyrî ehlaqî)
5. Xeberdan ango dujîn
6. Le‘netkirin
7. Bi xelqê kenîn
8. Sirê xelqê gotin
9. Derew der yemîn (bi derewî sond xwarin)
10. Neseandinandina li ser gotina xwe
11. We‘dê derew
12. Dû ‘ezmânî (du zimanî)
13. Xeybet
14. Medh
15. Zem
16. Tehkîr
17. Zêde pîrs pîrsîn

18. Cewâbâ ‘ewâm (bi herkesi re mujûlî)

Bo mînak:

Ji emrazê dil rani ferz e dewâ

Ku hîrş û hesed, kibr û ‘ucb û riyâ

(b/128)

Gelekbûnâ mâl e û pir lezkirin

Li şolân û tezyîni hez jê kirin

(b/129)

Bi rehîrtinâ mezhebân û ‘er in

Temâyî ji xelkê, bexîlî kirin

(b/130)

3. 2. 2. 2. Dermanên Wan Nexweşiyên Dil

Ev beş behsa dermanên nexweşiyên dil yên ku li jor di beşa nexweşiyên dil de derbas dibin, dike. Ji bo dermankirin û çareserîya wan nexweşîyan di serî de nivîskar pêşniyariya zikra Xwedê ya bi qelb û ziman dike. Ji bo vê yekê nivîskar wekî mînak weha dibêje;

Îlâcê evân e, xeber qeş nedân

Mudâmî zikir bi qelb û lisân

(b/139)

Ji bo nexweşîya hîrsê jî qene’atê wek derman pêşniyar dike. Ji bo tekebura nefsa însan jî dibêje ku Xwedê te ji avek mehînî (pîs) çêkiriye. Heqê te tune ye ku tu li hemberê Xwedê tekeburê bike, li hemberê Xwedê heqê te tewazû ye. Divê ku mirov fexr û ‘ucbê jî meke. Lewra gava ku Xwedê nebûya ne hedê mirov e ku mirov tu tiştê bike û her tiştên te yên bi feyde bi deste Wî ne. Malê ku ji ihtîyacê zêdetir divê ku mirov teleb neke. Zêdetir cehda sebrê bike. Divê pêwîst e ku mirov mal û milkê xwe di xeyr û zekatê de serf bike. Ji alimên mezin pirsan bike. Lewra ew dermanên pêdiviyên me yên ilmê ne. Di vê alemê de tefekur bike û heq û neheqiyê ji hev derxe û qelbê xwe jî ji masîwa bişo. Divê ku mirov xwe ji zikr û fikra Xwedê xafil neke û her daîm rica xewfê ji Wî bike. Ji bo ku mirov lutf û îhsana Xwdê bibînî divê ku mirov riayeta emr û nehyên Wî bike. Ger tu gavekê ber bi Wî biavêje ew dê gelek bi ber te bê. Eger ku tu taetê jê re

dikî, car jî jê bitirs e. Herçi qencyên ku tu dikî, tu ji bo xwe hasil dikî. Gava ku qencî kete qelbê te, tu wê gavê lez bike, xerabî jî ji şeytaniyê ye, wê neke. Ji bo nefsa emare jî mutî' bibe, bi mewtê (bi mirinê) wê bitirsîne, ta ku îteata Xwedê bike. Divê ku mirov îbretê ji qewmê ku berî me helak bûne bigre. Lewra wan ji mal û warên xwe tu nef'ek nedîtin. Ji bo Xwedê mirov efû bike û gunehên mirov zêde li ser hev kom nebin, divê mirov her daîm tewbê bike. Lewra mirov ji gunehan bi tewbê paqij dibe. Divê ew tobe jî tobeyeke xalis (tobeya nesûh) be. Divê ku mirov heqqan “çî yê Xwedê çî yê evdan dibe” bîne cîh. Divê mirov ji kirinên Xwedê ne îtirazê bike û ne jî bi qenc û xirab behsa wan bike. Eger ku mirov ji Xwedayê xwe hez bike, divê ku mirov dinyayê ji qelbê xwe bavêje, ger nevêje nexwe hezkirina Xwedê tune. Di dawiyê de nivîskar dibêje ku divê mirov “xwediyê hîlmê” be yanê xwediyê sebr û aramiyek mezin be. Eger ku te Xwedê naskir, tu vî canê xwe bide rêya Wî.

Bo mînak:

Tu dermânê hîrşê qenâ'et bizân

Ji mehsûdi re bibêje medh û du'ân

(b/140)

Ji âvek mehîni, tekebbur meke

Tewâzu' ji xelqê Xudê re bike

(b/141)

Tu mâlî ji xwe zêde telbe meke

Di şolani cehdê li şebrê bike

(b/144)

3. 2. 2. 3. Perweriya Di Rêya Xuda De

Di vê behsa kurt de nivîskar dibêje di serî de pêwîst e ku mirov ilmên wacib bixwî ne. Nivîskar li gorî xwe ilmên ku xwendina wan wacib dibîni weha rêz dike;

1. Hedîs
2. Tefsîr

3. Fiqih
4. Îlmên îlaca dîl (îlmên tesewûfê)
5. Serf û nehew
6. Qireat

Divê ku ilim ji bo mertebe û rutbeyên dinyayê neyête xwendin û ders dayîn; divê ji bo riza Xwedê were xwendin û dersdayîn.

Bo mînak:

Heçî ku dixwûnî ji bo Wî bixwûn

Ji tadrîs û rutbâ dinê re mexwûn

(b/194)

Tu dersê didey hem ji bo Wî bide

Ji bo xidmet û tem'û fexrê mede

(b/195)

3. 2. 2. 4. Wezîfeya Her Heft 'Ezayan

Her heft ezayên ku mijarên vê beşê ne ev in; Çav, guh, zimân, zik, ferc, dest û ling e. Di serî de nivîskar dibêje ku sedema dayîna van her heft 'ezayan sedkirina ji agirê cehenemê ye. Ev her heft 'eza dayîna Xwedê ne û divê mirov wan di rêya heramê de zayî neke. Divê ku heçî tiştên ku laîqê Rebê wan in, mirov bi wan bide kirin, ger wisa nebe ew dê roja qiyametê li dijî mirov şehadetê bikin. Xwedê herçî nîmet daye însan ji bo evditiya xwe daye. Ji bo vê yekê divê ku mirov van her heft 'ezayan di "le'b û lehwê" de zayî nekin. Gereg ev her heft 'ezayan ne ji bo xwestikên nefsê, ji bo tiştên bi feyde û riza Xwedê werin bikaranîn. Digel van agahiyan nivîskar van her heft ezayan û peywîra wan weha bi rêz dike:

- 1 Çav: Ji bo tefekur û îbretgirtina ji alemê ye. Ji bo nezera heramê nîne.
- 2 Guh: Ji bo guhdariya Quran, hedîs, we'z û nutqa selîs (gotina xweşik û rewan) e. Ne ji bo qisedanên nebaş û dengê necis e.
- 3 Ziman: Ji bo xwendina ilmê Quranê, we'z, hedîs, emr û nehyan, zikir û şukrê ye. Ne ji bo derewan, fehş û zemê ne.

- 4 Zik (mîde): Bi zik lezeta xwarin û vexwarinê tê zanîn. Divê xwarin û vexwarin ji bo quweta ta'etê be. Ne ji bo quweta nefsê be.
- 5 Endamên Fercê: Ji bo vê yekê nivîskar weha dibêje; Ewe nef'a fercê cimâ' pê bikey, weled jê bibin, lezzetê jê bikey (b/215), zinâyê meke, her ew e şukrê wî, welê çav û dil dê hîfîz ken, e wî (b/216). Fêkiyê vî hestî; zarok in. Şukra wî nekirina zînayê ye. Ji bo vê yekê alîkarî û peywîrên çav û qelb hene.
- 6 Dest û Pî: Dayina sedema dest û piyan qezençkirina riza Xwedê ye. Divê mirov bi destê xwe deftera emelê xwe bi gunehan reş neke. Nivîskar peywira piyan weha tîne zimên; "Bi nik zâlimî ve qe meşyê meke" (b/218).
- 7 Dil: Dil hakimê van her heft 'uzwan e û divê ji têtên nebaş were paqîş kirin û me'nen were tedawîkirin.

3. 2. 2. 4. Adabê Xwarinê

Di vê beşê de nivîskar di serî de dibêje ku ji bo nî'metên Xwedê dane me lazime mirov şukir bike û herwekî heyvanan mexwe, di dema xwarinê de jî divê mirov Xwdê bîne bîra xwe. Nivîskar vî tiştî weha tîne zimên;

Xudê ev teşmê di xweş dâne te

Digel âv û fêkî libâsê li te

(b/220)

Tu bê şukrê mânendê heywânê mexwe.

Qe bê mulhezâ Wî tu tiştî mexwe

(b/221)

Nivîskar weha didomîne, divê ku mirov xwarinê ji bo lezet û kêf û şehwetê nexwe, divê mirov ji bo quweta ta'etê bixwe. Gava ku mirov hêj li ser sifrê rûnenîştîye divê ku mirov ji bo xwarinê hevalan (mêvanan) peyda bike. Di ber û paşîya xwarina zadê de pêwîste mirov destê xwe bişo. Gava ku mirov bi kevçî zadê bixwe jî qet meşo. Gava ku mirov li ser zadê rudinê divê ku mirov bi terzek edeb rûne, rake piyê rast,

razîne yê çep û di dema xwarinê de jî divê mirov ne razê, ne palde, ne bê hişbe, ne bi fexr be û ne jî pir bixwe. Nivîskar vê yekê weha tîne zimên.

Li ser zâdê rûne bi terz û edeb,

Piyê râstê rake û râzîne çep

(b/225)

Ne râzê, ne pâlde dema xwârinê,

Ne bêhiş be, bî fexr û pir xwârinê

(b/226)

Di pêşiya dest pêkirina xwarinê de divê mirov hinek xwê bixwe û ji têştên herâm û bi şubhe jî nexwe. Eger ku goştgirtina mirov ji heramê be wê demê dê duayên mirov jî qebûl nebin. Tiştên ku hate ber mirov divê mirov pê razî be û talibe tiştên xweştir jî mebe. Lazime mirov bi navê Xwedê dest bi xwerinê bike û wexta têr bû jî hemdê Xwedê bike. Piştî xwarinê jî sûreyên herwekî Elhemdu û Îlâf û Ixlasê û duayên merwî bixwîne. Nivîskar van tiştan jî weha tîne zimên

Tu navê Xudê bine, dest pê bike

Wekî ku rehâbûyî hemdê bike

(b/230)

Tu Elhemdu û Îlâf û Ixlasê bixwûn,

Du'âyê di merwî jî bê hed bixwûn

(b/231)

Xwarinê divê mirov kelakel mexwe; pêşiyê sar ke, paşê bixwe; ji nav û jora firaxê mexwe. Divê ku mirov li ser sifrê bê terz rûnene tu car serê xwe mebe ser firaxê. Divê heçî ku li ber mirove bixwe, zadê li ber hemnişînê xwe mexwe. Di dema xwarinê de divê mirov loqmên xwe biçûk çêke, loqmên xwe qenc hel bike û bi aliyê loqma

hevalê xwe ve nezer meke. Hetanî ku loqma ewil helneke divê mirov ya din amade neke. Divê mirov bi nan destê xwe paqîş neke, bi kêrê û bi destekî tenê jî nan kerî neke. Nanê hûrbûyî jî lazime mirov ji erdê hilîne, lewra ew mehra horiyân e. Nivîskar viya jî weha tîne zimên

Hilîne heçî hûrbûyî ber piyân,

Ew e mehr e bê şek ji bo hûriyân

(b/238)

Nivîskar dibêje ku ji bo mêhvaniyê jî edeb lazime. Gava ku mirov avê vedixwe pêwîste ku mirov di serî de navê Xwedê werîne, dûre rûne, di sê bêhnên de vexwe û di paşiyê de jî hemda Xwedê bike. Ji xwarina fêkiyan jî birhê (zor, rexbet) bide yê şîrîn, lewra şîfa di wan de heye. Nivîskar di vê behsê de weha dibêje;

Tu rûne birâ! pîşê avê vexwe,

Di sê cîr bihên de, bi mêhtin vexwe

(b/240)

Bi nîvê Wî her cîr dest pê bike,

Li nik âxirê wîni hemdê bike

(b/241)

Ji fêkî tu birhê bide yê şîrîn

Ji bo te dewa' in wekî hingiv in

(b/242)

3. 2. 2. 5. Pûşîna Cil û Kincan

Ev beş ji du heb malikan pêk tê. Nivîskar di vê beşa kurt de dibêje ku li xwekirina cil û kincan divê ji bo ta'eta Xedê be, ji bo fexr û kibrê nebe. Cil û bergên heram û hevresîm jî li xwe neke. Da ku îbadetê mirov îptal mebe.

Bo mînak:

Libâsê ji bo fexr û kibrê mepoş

Mucerrred ji bo tî'etê Wî bipoş

(b/243)

Herâmê we dîbâc û qez ber meke

Bi wân tî'etê xwe tu berze meke

(b/244)

3. 2. 2. 6. Adabên Nimêjê

Di vê beşa dawiyê de nivîskar tîne zimên ku Xwedê nimêj ferz kiriye û bi saya nimêjê jî mirov paqij dibe. Gava wexta nimêjê hat divê mirov di wextê de, bi adab û erkan nimêja xwe bike. Lazime ku mirov nimêjê bi qelbekî guşad (vekirî), bi tirs û hêvî bike. Divê mirov nimêjê bi te'zîm, heybet, huzûr û heyâ bike. Ji ber ku Xwedê derfeta axaftina bi xwere daye mirov, pêwîste ku mirov gelekî spasdarê Wî be. Gava ku mirov nimêjê dike, divê mirov di haletê wisa de bike ku "herwekî Xwedê mirov dibîne, li milê rastê cenet û li milê çepê jî agirê cehenemê heye". Divê mirov ji Xwedê bitirse û qelbê mirov jê xafil nebe. Ji bo qehra Wî jî xwe amade bike, di rehetiyê de jî dilşad û şukirdar be. Pêwîst e ku mirov nimêja xwe her dem bi cematî bike û du'ayên merwî jî her bike. Lewra nimêja bi ceme'atê xêra wê bist û pênc qat zede ye, lê li gorî riwayeteke sehîh ev xêr bîst û heft e. Gava ku mirov ferzek kir divê mirov xwe ji bo ferza din amade bike. Ji sibê hetanî tavê zikir bike, ji bo hec û 'umreyekê jî cehd bike. Digel van nivîskar mexlesa xwe û sedema nivîsandina vê berhemê jî di vê beşê de tîne ziman û weha dibêje;

Kelâmek selîs e, bi cih zebtî bike

Ewe, ê ji werfê te xâric dike

(b/260)

Xelîlî qe ev tîrz bi zî'et nebû

Welê ew bi fermânâ exxê xwe bû

(b/261)

Dû sê lefz gotin ji bo zârûwân,
Ku xwe pêvedin ew ji xerbâziyân

(b/262)

Ewî nâvi lê dînî (Nehcu'l-Enâm),
Welêkin ku pê muntefî' bin 'ewâm

(b/263)

Dûre nivîskar weha didomîne û dibêje ku “Ya Reb me roja qiyametê de dilşad bike. Em hêvîkarê gihîştîna Xwedê ne, ya Reb tu me bendeyên xwe bê behr û muflîs neke. Di dawiyê de jî weha dibêje, “Me ‘efû bike bi sidq û sefa, bi tabî’ê Muhemed Mustefa jî bibe cenetê.”

Bo mînak:

Îlâhî digel me bi luţfâ xwe key
Heçî kû şewâb e, muyesser bikey

(b/265)

Me nespêrî nefsa me yâ bed’emel
Ew e, â me wâqî‘ diket der xelet

(b/266)

‘Efukey îlâhî bi şîdq û şefâ
Bibey cennetê tâbi‘ê Muştefâ

(b/273)

3. 3. METNA NEHCU'L-ENAMÊ YA BI KRÎTÎK

BÎSMÎLLÂHÎRREHMÂNÎRREHÎM

FERZÊN 'EYNÎ

1. Tu gûhdêre nuţq û beyânâ feşîh¹⁹¹
Ji bo ferz û 'eynân e, merdê melîh
2. Ku îman û Îslâm û şewm û şelât
Li ser mâlîdârân e hecc û zekât
3. Li ser te ji ferzân e ey nûrê cân¹⁹²
Bizâne tu erkân û şertê di wân
4. Heçî hukmê şer'î tu muhtâc dibî
Ji bo zânînâ wî, tu munqâdi bî
5. Tu îmanê bâweriyâ dil bizân
Muţî' bûne Îslâm bi zâhir bizân
6. Welêkin qe yek bê yekî nâbitin
Musilmânî bê her du wân nâbitin
7. Tu me'nâyî şehdê ku bâwer bikey
Teleffuz eger qâdir î pê bikey
8. Ji kufrê tu bê şek xwe xâric dikey
Welê eşlê dînî tu hâşil dikey
9. Wekî ku digel wê 'emel jî bikey
Tu îman û Îslâmê kâmil dikey
10. Me'anî ji bo wê ev in gûh bidê
Tu me'bûdê bilheq tu ne j' bil Xudê

¹⁹¹ (Tu gûhdêre...). Ey mêrê xwûn şêrîn! Tu guhbidêre gotin rewanbêjiya vê kitêba (Nehcu'l-Enamê) ku di heqê ferz û 'eynân de ye. Ferz û 'eyn, ew 'îbadete ku li ser civakê wacib e. Ji ber hindê dema ku kesek jî wê 'îbadetê bike, ferziyet ji ser herkesî radibe. Îcar seydayê Mele Xelîl, di vê berhema xwe de, bi kurtî behsa rojî, nimêj, hec û zekâtê kiriye. Lê yê îman û Îslâmê bi berfirehî behs kiriye, her wekî ku hûnê jî bibînin.

¹⁹² (Li ser te ji ferzan e...). Yanê ey nûra can! Çawa ku îman, îslam, rojî, nimêj, hec û zekat li ser te ferz û 'eyn e, her weha rukn û şertên di wan de jî li ser te ferz û 'eyn e.

BEḤṢĀ ṢIFĀTĒN SELBĪ

11. Wucûdâ Wî ‘eyne ji bo zâtê Wî
Ne Ewwel ne Âxir ne zîdde e Wî
12. Ne mişl û zehîr û wezîr û mekân
Ne mânî‘ mu‘în û cihât û zemân¹⁹³
13. Ne cîsm e ne cewher ne nûr û ‘erež
Ne zû-lewn û miqdâr û şekl û merež
14. Ne ewlâd û zewcet ne bâb û ne dâ
Ne hemkûf û mewt û zewâlâ Xwudâ
15. Nusûsê ku dâll in li şolâ meḥâl
Mu’ewwel ke mespêre ehlê ḡelâl¹⁹⁴
16. Ji nefsâ te nêzîktirînê te ye
Xebîrê bi ef’âl û qewlê te ye¹⁹⁵

BEḤṢĀ HEFT ṢIFETĒN XUDĀ YĒN QEDÎM

17. Ṣifâtê di seb‘ e ezel Wî hene¹⁹⁶
Ne ‘eyn in ne ġeyr in, ne wek êd me ne
18. Ḥeyât e digel ‘ilm û sem‘ û beşer
Irâdet digel qudretâ xeyr û şer
19. Murîd e ji bo xeyr û şerrân, welê
Rizâ Wî tunîne bi şolâ nelê
20. Ewê di kelâmê besîṭê qedîm
Ḥurûf û luġet ḥâdiş in, ey ḥekîm
21. Bi Qurânê ġeyrî wê mensûxi bûn
Ewê ḥukm û xwendin mubeddel nebûn
22. Ḥetâ ve qiyâmet dê her dû hebin
Di ‘uqbâyê xwendâyê wê her hebin

¹⁹³ Misl: Manend. Zehîr: Arîkar. Wezîr: Arîkarê padişah. Mekan: cih. Manî’: Asteng. Mu’în: Arîkar. Cîhet, cîhat: Alî, hêl, teref.

¹⁹⁴ Nes û delîlên ku şolek nebabetî Xwedê nîşan bide, bi wekû çav û dest û tiliyan ji Xwedê re çêke, e wan ayet û hedîsan tewîl bike û teslîmî kesên ku meriv ji rê derdixe neke.

¹⁹⁵ Xweda, bihêz û zanîna xwe, ji rûh û rewanê te, nêzîktirê te ye û zanayê bi kar û kirînên te ye.

¹⁹⁶ Yanê heft sifetên Xweda yê ezeli hene ku nû peyda nebûne û tu carî jê cuda nabin. Ew sifetên han ne zatî xwedê bixwûne û ne jî ne tiştinê bi serê xwe ne.

23. Şifâtê kemâlê hemî Reb hene
 Simâtê di neqsê ne mewcûde ne¹⁹⁷
24. Tu nâvânî bê şer‘ê lê dâme ne
 Ji nehwêd û neh nâvê Wî zêde ne
25. Ji ketmâ ‘edem ‘âlem ânî wucûd
 Bi vî wechê ehsen Wî şâhê wedûd
26. Tu me‘dûm û hâdis bizâne ewê
 Heyûlâ tunîne ku ‘âlem ji wê

BEḤŞÂ FERİŞTEYÂN/MELÂ’IKETÂN

27. Melâik ji bo Wî hene bê ‘eded
 Mudâmî ‘îbâdet diken bê meded
28. Hinek jê xewâş in welê her yekî
 Vebuhtî kirî Wî ji bo şolekî
29. ‘Enâşir çihâr in ji wân in melek
 Wekî ins û cin nûr e qismê gelek
30. Di wân û di me ax û cinân hewâ
 Di şeytânî nâr e ewê bê newâ
31. Ne mêr in ne jin bê xwer û vexwûr in
 Li şeklân qâdir bi çeng û perr in
32. Fenâ dê bibin ew biçin cennetê
 Ji bo ehlê wê re bikin xizmetê

BEḤŞÂ RISÂLETÊ

33. Muḥemmed Resûl e Xudâ ew hinâr
 Ji bo ins û cinn û melek pêşiwâr
34. Bi dînê wî dînê dî mensûxi bûn
 Kemâl û fezil bo me pê zêde bûn
35. Xudê ew kire xâtemê enbiyân
 Welêkin ewe serwerê etqiyân
36. Ewî ‘Ebdullâh bâb e dâ Âmîne
 Medîne û Meke mewlid û medfin e

¹⁹⁷ (Simâtê di neqsê...). ‘Elametê ku delaletê ser kêmasî û nuksanê dike, ji Xweda re tune ye.

37. Ji neslâ Qureyş e ji tuxmê ‘Ereb
Nubuwwet di sâlâ çilî dâye Reb
38. Sisê dî ku borîni ew bû resûl
Meke bo xwe deh sâlê dî kir qebûl
39. Ji Mekkê ku bâlî Medînê ve çû
Li wê deh buwâr in ji dinyâyê çû

BEḤŞÂ ŞEMÂILÊ MUḤEMMED

40. Li wî qâmetek mu‘tedil bû leṭîf
Ne kurt û dirêj û ne zexm û ze‘îf
41. Ne reş bû spî sorekî esmerî
Mudewwer bû wech û rihên enwerî
42. Ewî çav û birhê mukeḥḥel hebûn
Ji deh ṭâne şeybâ wî ne zêde bûn
43. Bi roj û bi şev hem li pêş û li pêş
Wekî yek didî ḥaşâ inkâr û ḥaş

BEḤŞÂ MI‘RÂCÊ

44. Ji Ke‘bâ Munewwer Xudê leylekê
Bire Mescîd-ûl Eqşâ ew lehzekê
45. Hemî enbiyâ lê cevân wê demê
Li wê bû îmâmê ewê ‘âlemê
46. Ji wê ew bire sidretu’l-muntehâ
Bi qâbê du qewsân bi bâl Wî gehâ
